# BERXWEDAN JIYAN E

Nivîsarên parêznameyên endamên
Komîteya Navendî ya PKK'ê rêheval:
**Mezlûm Doxan, Mihemed Xeyrî Dormûş û Kemal Pîr**.

Ji dosyayên darizandina wan hetine wergirtin

**Wergera ji erebî: Beşîr Taha**

**BERXWEDAN JIYAN E**

Nivîsarên parêznameyên endamên
Komîteya Navendî ya PKK'ê rêheval:
**Mezlûm Doxan, Mihemed Xeyrî Dormûş û Kemal Pîr**.

Ji dosyayên darizandina wan hetine wergirtin


**Wergera ji Erebî:** Beşîr Taha

**Berg:** Laleş Ebdulrihman

**Rûpelsazî:** Selahedîn Yûsiv

ÇAPA YEKEMÎN 2022

WEŞANÊN NAVENDA
MEZOPOTAMYA YA WERGERÊ

WEŞANXANEYA ŞILÊR

weshanashiler@gmail.com
www.shiler.info

Çalakî û berxwedana ku me li dijî desthilata faşîst pêk anî û dengê me yê bilind di nava dadgehên wê de, bê guman dê bigihêje cemaweran.

**Mezlûm Doxan**

## Naverok


Pêşgotin ........................................................................7

Ji Belgeyên Dadgehê......................................................15

Darizandina Mezlûm Doxan ..........................................15

Kemal Pîr di Dadgeha Faşîzmê de ye ...........................101

Nameya yekem:............................................................131

Nameya duyem:............................................................135

## Pêşgotin

Desthilata leşkerî ya faşist li Tirkiyeyê, nêzî çar salan işkence û lêdan li dijî rêhevalên me Mezlûm Doxan, Mihemed Xeyrî Dormûş, Kemal Pîr, rêber û damezrînerên Partiya Karkerên Kurdistanê, pêk anîn. Yên ku li hember hovîtî û nijadperestiyê bi qehremaniyeke bêhempa li ber xwe dan.

Ev berhema ku em belav dikin, ragirtin û berxwedana wan a di girtîgeh û zindanên faşîzmê de diyar dike.

Bi wergera me ji vê berhemê bo zimanê kurdî re, em hewl didin, hinekî ji wê sparteya dîrokî (emaneta dîrokê) ya pîroz a ku van rêhevalên pakrewan spartiye me, bi cih bînin.

Bibîrxistina berdewam a van rêhevalan, bi naskirina wan pêk tê. Her weha bi rêya karkirin û pêkanîna erk û berpirsyariyên ku bi xwîna xwe ji me re nîşan dane, ango ew têkoşîna ji bo Kurdistaneke azad, serbixwe û demokrat e. Berxwedana bêhempa ya van rêhevalan di zindanên desthilata leşkerî de, ne tiştekî normal e! Ji ber ku zemîn û bingehekî xurt ji bo têkoşîna me ya niştîmanî dane avakirin. Di destpêka ciwantiya xwe de, bi hemû hêz, qehremanî û zanebûna xwe pêşengtiya vê têkoşînê kirin. Jiyana xwe di vê rêyê de, gorî kirin. Lewma kevrê bingehîn ê pêşengtiya proleterya tevgera rizgariya gelê

me, danî. Her weha, pîvanên rasteqîne yên vê tevgerê destnîşan kirin.

Ev berxwedan, di dîroka gelê me de, xudan cihekî taybet û berz e. Ji ber ku di demekê de derket ku Kurdistan di rewşeke pir zehmet re derbas dibû. Lewma bandoreke kûr li gel, dost û dijminan kir.

Pêwîst e çi kesê li ser xaka Kurdistanê dijî, van rêhevalan ji xwe re bike mînak û li ser şopa ku wan bi xwîna xwe neqişandiye, bimeşe.

Ev çar salên ku di zindanên koloniyaliyê de derbas bûn; demeke nû ji berxwedana li hember dijmin da destpêkirin. Êdî Mezlûm Doxan destpêka wê demê bû û Mihemed Xeyrî Dormûş, Kemal Pîr û rêhevalên wan, lûtkeyên wê demê bûn.

Firehbûna berxwedanê di zindanên Amedê de, di dîroka têkoşîna Kurdistanê de rêyeke nû vekir. Bi vê rêyê, çeka dawî ji dest dijmin hate girtin û têk çû.

Ev berxwedana ku bû paşmana (mîraseya) şoreşgerî û sedema bipêşxistina têkoşîna me. Rêhevalên me bi berxwedan û qehremantiya xwe ya li hember hovîtiya dagirkeran, bersiva herî zelal da zilm û zoriya dagirkeran. Dagirkerên ku dixwestin bingeha civaka kurdistanî hilweşînin. Xwîna pak a rêhevalên me, ji nû ve şaneyên vê civakê av dan û hemû hewldanên dijmin vala derxistin.

Rêhevalên me, Mezlûm Doxan, Mihemed Xeyrî Dormûş û Kemal Pîr, berxwedana gelê me kirine

çarçoveyeke siyasî û bîrdozî ya nû û ew bixwe bûne sembola vê berxwedanê. Heta asta ku çi kesê bixwaze têkoşîna rizgariya gelê me kûrtir bike, pêwîst e di asta van kesan û berxwedana wan de be û jiyana gelê me bibe berxwedaneke berdewam. Ji ber ku ev kesayet ji hembêza gelê xwe derketin û di kesayeta xwe de hemû taybetiyên têkoşînê pêk anîn. Di van rojên ku gelê me amadekariyên pêngava xwe ya dîrokî dike, pêwîst e em jî wan ciyawaziyên şoreşgerî û hêja yên rêhevalên me di kesayetên xwe de hilgirin.


Di wan şert û mercên zehmet ên Zindana Amedê de, rêhevalên me karîbûn li hemberî dagirkeriya Tirk, nav û dengê PKK`ê biparêzin û darizandina xwe, veguherînin darizandineke dîrokî ji bo vê dagirkerî û mêtingeriyê. Van kesayetan di salên dawî de, tevî hemû cureyên işkence û astengiyan, nûnertiya berxwedanek şoreşgerî kir. Di vê ezmûna dîrokî de ku mirov nizane çawa pesindanê (wê bîne ziman) bike, bi ser ketin.

Mêtingerîya Tirk a faşist, da ku gelê me bêdeng bike, hemû derfet û imkanên xwe bi kar anîn. Bi taybet jî girtiyên me yên di zindanên wan de. Ji bo dengên wan ê şoreşgerî qut bike, hemû rêbazên xwe yên hovane bi kar anîn.

Berxwedana van pêşengên me, bû mîna bahozekê û li tevahiya welêt belav bû. Hişt ku gel li dora zindanan kom bibe û vê berxwedanê hembêz bike. Lewma ew sal, bûne bingeha bexwedana me ya şoreşgerî.

Van rêhevalan bi berxwedan û têkoşîna xwe diyar kirin ku kadro û pêşengên PKK`ê ji biryar û baweriyên xwe qet venagerin. Her weha veger ji armanca Kurdistaneke azad û serbixwe nîne.

Di Kurdistanê de, da ku berxwedan baş bê pênasekirin û mafê xwe ji lêkolîn û lêgerînan bigire, pêwîst e berxwedan û xweragirtina rêheval Mezlûm Doxan, Mihemed Xeyrî Dormûş û Kemal Pîr di zindana Amedê de, ji nêz ve bê bibîrxistin. Ev berxwedana ku gelê me wê ji sedên salan ve bi rê ve dibe, bi puxte, naverok û cewherê xwe bi tevayî di van rêhevalan de derket holê.



**Mezlûm Doxan- Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK)**

**Ev wêne beriya girtina wî ye**



**Mezlûm Doxan- Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK)**

**Ev wêne di zindanê de, di bin işkenceyê de hatiye girtin.**



**Mezlûm Doxan, ji aliyê çepê ve kesê duyem e. Ew bi hin rêhevalan xwe re, di dadgehê de ye.**

## *Ji Belgeyên Dadgehê*

## *Darizandina Mezlûm Doxan*

Dadwer, gazî tawanbar Mezlûm Doxan kir.

**Dadwer:** Tê gotin ku tu endam î di rêxistina Partiya Karkerên Kurdistanê de û tu di damezrandina partiyê de, beşdar bûyî? Te cihê xwe di rêveberiyê de jî girtiye û te karûbarên çapemenî û belavokan jî bi rê ve dibir. Her weha te di meha tebaxa 1978'an de, alîkariya endamê rêxistinê "Elî Dorsin ji bo ku ji nexweşxaneya Amedê bireve" kir û te nasnameyeke sexte bi navê Brahîm Şenel bi kar aniye.

**Tawanbar:** Ez kopyayekê ji belgeya dadweriyê dixwazim, da ku ez karibim bi gelemperî şîrove bikim û ji bo ku ez karibim xwe bispêrim belgeyê û baştir biaxivim.

**Dadwer:** Helbet, (kopyayek digihe ber destê tawanbar).

**Tawanbar:** Ez dixwazim îfadeya xwe ser du beşan parve bikim:

**Yek:** Ya rastî! Weke di doznameyê de hatî, ez di partiyê de endam im! Ji ber vê sedemê, ev tawanên ku li partiyê û endamên wê têne barkirin ...

**Dadwer:** Binêre, destpêkê em dixwazin tu van tiştan ji bo me zelal bikî, piştî zelalkirina van xalan, tu dikarî

bersiva tawanên ku li we bar bûne, bidî; yanî tu çi dixwazî bibêjî.

Ji bo ku em cih û erka te nas bikin, pêwîst e tu wisan bersivê bidî.

**Tawanbar:** Ji bo ku goveya min (îfadeya min) a kesayetî bi awayekî baştir zelal bibe, beriya her tiştî divê ez hin agahiyan derbarê damezrandina partiyê û armancên wê de bidim. Li ser bingeha wan agahiyan, dê îfadeya min wateya xwe ya rast bigire. Hin xalên ku di belgeyê de derbas dibin, ez ê bersiva wan nedim. Heger min goveya xwe bi grûpa Amedê re dabaya, wê demê min dikarîbû hin agahiyan derbarê hin xalan bidim. Her weha ji ber ku hin rêhevalan îfadeyên xwe beriya min dane û bi awayekî baş qala van xalan kirine, lewma ez tu pêwîstiyê pê nabînim ku ez careke din dubare bikim.

**Dadwer:** Bi kurtasî biaxive! Di çend peyvan de, komî ser hev bike.

**Tawanbar:** Belê, ez dixwazim îfadeya xwe der berê xalên ku bi min ve girêdayî ne, bidim û ...

**Dadwer:** Tu kîjan xalan dipejirînî û kîjanan napejirînî? Bi kurtasî biaxive!

**Tawanbar:** Belê, niha bi gelemperî tevgera me ji aliyê raya giştî ya Tirkiyê ve, bi navê "Apocîtiyê" tê nasîn. Her weha di çapemenî û ragihandina fermî de jî wisa ye û heta di nava gel de û ji aliyê hin komên Çepên tirkan û borciwaziya neteweyî li Kurdistanê jî wisa tê naskirin, tevî ku çewtiyeke mezin e ku navê rêxistineke siyasî bi

navê kesekî bê binavkirin. Ji ber ku rastî, ne wisa ye, ev rêxistin navekî wê heye! Ew Partiya Karkerên Kurdistanê ye. Ev nav bi berfirehî di nava borciwaziya neteweyî ya kurdî de, belav bûye. Li kêleka bikaranîna vî navî bi mebest, ev encama hişmendiya cotkarî ya kurd e. Weke çawa ku gel Partiya Gel a cemawerî bi Acawîd nas dike û Partiya `Edaletê bi navê Dîmêrêl nas dike, ev yek li ser tevgera me jî pêk hat. Navê rêber û pêşengê tevgera me, rêheval Abdullah, li tevahiya tevgerê bar bû. Borciwaziya neteweyî û ragihandina fermî ya dewletê û belavokine din, tevgerê bi navê Apocîtiyê pênase kirin. Tevî ku navê wê yê rast ne wisa ye; navê tevgerê heye û ew parityeke siyasî ye. Her weha navlêkirinên din jî mîna Artêşa Rizgariya Neteweyî (UKO) vedigere heman sedeman. Tevgerên Çep li Tirkiyayê em mîna tevgereke neteweyî nirxand, lewma têgeha netewperest bi kar anîn. Ev nav (Artêşa Rizgeriya Neteweyî) bi vî awayî di nava gel de, bi berfirehî belav bû.

Tevî ku tu têkilî di navbera tevgerê û Artêşa Rizgariya Neteweyî de tune ye, ev nav li bakurê welêt dihate bikaranîn. Ragihandina fermî ya dewletê jî beriya ku min binçav bike navê Artêşa Rizgariya Neteweyî bi kar anî. Ji ber girtinên ku li bajarê Elazaxê pêk hatin, ez wisa dibînim.

Xwestin ku tevgerê mîna artêşê yan rêbiran; ne mîna tevger an partiyekê nîşan bidin, lewma ev nav bi kar dianîn. Jixwe ev tawaneke ne di cih de ye û di rastiyê de tiştekî wisa nîn e. Beriya niha jî rêhevalên me di vê mijarê de, axivîn û ev cara duyan e ez dubar dikim. Tevî

ku pêwîst nedikir careke din dubar bikim. Lê pêwîst e ez pirsa di der barê damezrandina rêxistinê de, zelal bikim, ji ber ku ev tişkî girîng e da ku îfadeya min baş zelal bibe. Her weha ji bo zelalkirina îfadeya girtiyên din jî girîng e.

Ez dixwazim bi rengekî tekez bibêjim ku maf, mîna saziyekê ne, di qatên jor de, berjewendiyên çîna desthilatdar diparêze û li gor wan zagon û sizayan datîne. Heta ku hêzên hilbirîner nebin asteng, ev zagon di meryetê de dimîne. Lê heger hêzên hilbirîner bi wan re kete nakokiyê, wê çaxê, ew zagon radiwestin û bê wate dimînin. Ji ber vê sedemê, ez biryarên ku di der heqê min û girtiyên partiyê de tên standin, bê wate dibînim. Ez tenê zagonên dîrokî, bi wate dibînim. Bê guman, ez vê dibêjim û li hember dîrokê berpirsyar im û li ser vî bingehî, ez dê îfadeya xwe bidim.

Di doznameyê de, tê gotin ku "Abdullah Ocelan" bi endamên din ên Komeleya Xwendina Bilind a Demokratîk a Enqerayê, di nava têkiliyan de bû. Di wan peywendiyan de, dabaşa van mijaran dikir:" Kurd ji aliyê dewleta Tirkiyê ve, bindest in." (Di axaftina xwe de dozgerê giştî, têgeha ``herêma Rojhilat û Başûr Rojhilatê Enadolê`` bi kar dianî, lê em ji van herêman re dibêjin Bakur û Rojavayê Kurdistanê. Ev deverên ku heta niha dibin dagirkeriya tirkan de ne). Berdewam dike: Kurd weke nijad, faktorên wan ên neteweyî hene. Tirkiye xwedî sîstemeke mêtinger e û artêşa wê, di herêmê de, artêşeke dagirker e... hwd. Bi vî awayî dozname şikayeta xwe berdewam dike.

Di dozname de hin xalên rast hene û hin xalên şaş jî hene. Belê, artêş Kurdistanê dagir dike; ev jî tê wateya ku Kurdistan mêtingehkirî ye! Gencîneyên wê yên xwezayî têne talankirin, binyada wê ya civakî tê hilweşandin. Bi tundî çand û zimanê wê tên bişaftin û tu derfetên bipêşxistina wê jî tune ne. Der barê şêwaz û rêyên bipêşxistina hilbirîna wê de, gelek guftûgo tên kirin.

Jixwe mijara njadê bi Marksîzmê re li hev nake. Ji ber vê sedemê, kêşeya nijada kurdî û hin kêşeyên din, ne mijarên gotûbêjê bûn. Ez bawer nakim gotûbêj di der barê wan de bûbe; ev ne rast e.

Tiştekî din jî heye, ji ber ku ez di partiyê de endamek im, bê guman ne ez tenê, yên din jî ji bername û rêziknameya partiyê, haydar in. Ev tê wateya ku ez ne ewqasî nezan im ku haya min ji bername û rêziknameya partiyê tune be û tu kesî wisa jî tune ye.

Li vir rêziknameya partiyê li gel we heye, lê di rastiyê de cudahiyeke mezin di navbera tişta ku min xwendiye de û tiştê ku li ser partiyê tê gotin heye. Bi taybetî ew beşa ku ji bo wê, di derheqê me de, siza tên birîn.

Der barê armancên partiyê de, di doznameyê de weha derbas dibe:" ji armancên vê tevgerê, yan vê partiyê, ew e ku binyada civakî ya gelê kurd, ji aliyê mêtingeriya faris, tirk, ereb ve hatiye parçekirin. Li gor sîstema partiyê û bi têkoşîneke şoreşgerî, partî dixwaze Kurdistaneke serbixwe û azad li devera ku artêşa tirk dagir kiriye, ava bike. Yanî damezrandina dewleteke kurdî.

Weke ku di bernameya partiyê de diyar dibe, herêmên ku di bin nîrê dagirkeriya Tirkiyeyê de ne, dê bi rêya têkoşîna çekdarî bêne rizgarkirin; damezrandina Kurdistanekê li gor perspektîfên Marksîzma Lênînîzmê tê sazkirin.

Di vê ramanê de, rastî û şaşî tevlihev bûne. Bi rastî jî partî dibêje ku Kurdistan parçe bûye; ji aliyê mêtingeriya faris, tirk û ereban ve, dagirkirî ye. Li gor riyalîteya Kurdistanê, partiyê ji bo xwe bername danîye ku pileya wê ya bilindtirîn û nizimtirîn heye, lê di îdeolojiya partiyê de, nehatiye gotin ku bingeha civakî ya gelê kurd ji holê rabûye. Ji ber ku bi tu awayî mirov nikare biaxive li ser civakekê ku binyada wê ya civakî hilweşiya be.  Lê partî di îdeolojiya xwe de, amaje bi pêkanîna vê ramanê dike. Ev tê wateya armanca dewleta Tirk ew e ku bi tenê di vê çarçoveya «hevpeymana neteweyî» de, neteweyeke tirkî, biafirîne. Ev yek jî bi rêya meşandina siyaseta bişaftina hemû neteweyên ku di nav wê de ne, pêk tê.

Tiştekî din li vir heye, pêwîst e mirov balê bikşîne ser, dozname amajeyê bi têkoşîna şoreşgerî ya li gor rêgezên Marksîzima Lênînîzimê, dike. Rast e Marksîzima Lênînizimê raberê xeta partiyê ya îdeolojîk e; yanî partî di îdeolojiya xwe de, xwe dispêre rêgezên Marksîzma Lênînîzmê û li gor wê xeta xwe ya siyasî xêz dike. Lê divê armancên partiyê ser du beşan bên diyarkirin û ew jî di bernameyê de zelal e.

Tişta ku bala min kişand, ew e ku tişta hûn behsa wê dikin di bernameyê de tune ye. We dikarîbû di

bernameyê de bi dest bixista. Li gor ku tê bîra min, hevokek heye weha dibêje:" Armanca me ya sereke sosyalîzim û komunîzm e; yanî avakirina civakeke ne li ser bingehê çînîtiyê, armanca me ya herî gewre ye, ne ya nizimtirîn e, armanca dawî ye. Lê bernameya partiyê ya vê demê, bernameya şoreşa demokratiya borciwazî ye. Ev bernameya pileya nizimtirîn e. Ev bername ji bo avakirina welatekî demokrat û serbixwe ye. Her weha ji bo afrandina dîktatoriya gelêrî ye. Şoreş bixwe ne Marksîzima Lênînîzmê ye, lê belê şoreşeke neyeweyî, demokratîk û gelêrî ye.

Taybetiya neteweyî ya şoreşê di bernameyê de zelal e. Bi rêya dijminatiya berbendiya biyanîyan re, aliyê wê yê demokratîk jî di hilweşandina bermayên serdemên kevin, belavkirina erdan ser cotkaran, rakirina zilm û zoriya ser jinan û azadîkirina wan de, diyar dibe.

Wate; şoreş bi naveroka xwe dewlemend e. Bi kurtasî ew şoreşeke demokratîk û borciwazî ye, lê ji ber rewşa dîrokî ya çîna borciwazî li Kurdistanê, her weha rewşa Kurdistanê bixwe, ev çîna han nikare şoreşê pêk bîne. Lewma û ji ber şert û mercên taybet, dê şoreşa demokratîk û borciwaz li ser destê prolîtariya ji bo Kurdistana serbixwe û demokratîk, pêk were. Bi awayekî xwezayî wê bi serkêşiya Partiya Karkerên Kurdistanê be. Pênasekirina şoreşê weke şoreşeke Marksîzim-Lênînîzm, ne rast e. Ji ber şoreş di bingeha xwe de neteweyî, demokratîk û gelêrî ye. Gel jî tê wateya karker, cotkar, di bajaran de pîşesaz, borciwaziya biçûk,

rewşenbîr û sektorên niştîmanî yên din. Ev hêzên ajoker ên şoreşê ne.

Siyaset, derbirîna tîr a aboriyê ye. Siyaset, rêya xwe bi ideolojiyê dibîne; yan jî li gor sîstemeke ramanî, bîrewerî û îdeolojî tê hûnandin. Ji ber ku îdeolojî ji xîmekî xurt û bihêz tê (binyada bilind e) siyaset li ser nayê avakirin, îdeolojî nîşana siyasetê ye. An jî siyaseteke destnîşankirî dirêse, şîrove dike û ji cemaweran re, li gor sîstemeke diyar, vediguhêze. Ji taybetiyên şoreşê ku neteweyî, demokratîk û gelêrî be, lewma desthilata ku dê şoreşê pêk bîne, bê guman wê desthilateke neteweyî, demokratîk be û ji aliyê dîktatoriya gelêrî ve bê meşandin. Bi wateyeke din, wê dewleta gel bide avakirin. Wê ne dewleteke Marksîzm-lênînîzm be, lê netew-dewleteke demokratîk be. Ji ber vê sedemê, em dibêjin Kurdistaneke serbixwe û azad.

Her weha ji doznameyê di hin cihan de, dabaşa dewleteke kurdî Marksîzm-Lênînîzmê, tê kirin. Ez dixwazim vê xalê jî zelal bikim.

Di bernameya Partiya Karkerên Kurdistanê de, navê dewleteke kurdî Marksîzm-Lênînîzim nehatiye ziman. Lê weke ku min berê jî diyar kir, bername dewleteke serbixwe, yekgirtî û demokratîk tîne ziman. Wê netewedewleteke demokratîk be ku gel tê de xwebixwe xwe bi rê ve bibe. Wisa di bernameya me de hatiye.

Dozname di şikayeta xwe de berdewam dike; tê gotin ku hemû çalakiyên propaganda yên partiyê, propagandaya çekdarî bû, hemû çalakî û bi taybet

operasyonên lêşkerî weke propaganda hatine hesibandin. Her wisa dozname dibêje ku partiyê propagandaya çakdarî di hemû çalakiyên xwe de bingeh digire.

Di vê der barê de, di doznameyê de derbas dibe, berevajî hin rêxistinên din ên ku bi çalakiyên cudakeriyê radibûn, Partiya Karkerên Kurdistanê tevî ku hin zagonên demokrasiya borciwaz ên ku xwedî asteke diyar bûn, di banê destnîşankirî ji bo xwe bi kar anîn, ji ber dizane ku dê çîna desthilat di paşerojê de wê hovtir bibe, her weha tekez dizane ku ev zagon û derfet wê berdewam nekin, lewma ev şêweçalakî di xebata xwe de weke bingeh negirt dest.

Ji ber vê yekê, pêwîstî bi avakirina rêxistinekê li ser terzekî nû heye ku hêza xwe ji gel bigire. Ji ber ku hêzên rizgarikirna gelan, xwe dispêrin hêza xwe û di pey re xwe dispêrin alîkariya gelên demokratîk û pêşverû yên cîhanê. Li gor rêgezên Marksîzma Lênînîzimê xwe birêxistin dike û çalakiyên xwe destnîşan dike. Ji bilî wisa di vir de beşa girîng dest pê dike; berdewamkirina çalakiyên tund û tûjiyê bi çalakiyên propagandayê re.  Her weha operasyonên tund û tûj weke beşekî ji van çalakiyan dan diyarkirin.

Di vir de dîsa rastî û çewtî tevlihev dibin. Der barê beşa yekem de ya ku min xwend, tê de tê gotin ku partiyê di çalakiyên xwe yên eşkere de, sûd ji zagonên dewletê wergirtiye. Lê çalakî û xebatên veşartî ji xwe re weke bingeh digirt. Ev rast e, ev jî yek ji taybetiyên Partiya Karkerên Kurdisatnê ye ku wê ji rêxistinên neteweyî yên

borciwazên Kurdistanî cuda dike. Lê bihevvegirêdana operasyonên tund û tûjiyê û propagandayê, her wisa destgirtina operasyonan weke beşekî ji propagandayê ji bo ku partî armancên xwe pêk bîne, ev bi carekê re nerast e!

Ji bo tawana borî piştrast bike, dozname weha berdewam dike; vî serenavî bi bîr tîne (rêziknameya programê). Ji bo vê tekez bike, belgeyên bi min û Yeldirim re gava em hatin girtin bingeh digire. Ez dixwazim di vê mijarê de jî biaxivim.

Di vir de ez dixwazim du tiştan ji hev cuda bikim: Zagon an jî rêzikname ji bo parastina rêjîmê ye. Komara Tikiyeyê çi dike? Ji bo parastin û berdewamiya rêjîmê, zagonine destnîşankirî datîne û bi rêya artêş û polîsan, piştgiriya wan dike. Lê rêziknameya rêxistineke siyasî yan jî ya dezgihekê ji aliyê endamên wê ve tê danîn. Bername ji vê cuda ye, bingehên çalakiyên niha zelal nake, lê karên ku di paşerojê de divê bêne kirin, li gor şert û mercên dema niha diyar dike. Wekî em bibêjin bernameya Partiya Karkerên Kurdistanê, rewşa Kurdistanê ya heyî zelal dike. Li ser vî bingehî, partî karên ku pêwîst e di paşerojê de bên kirin, diyar dike. Ji ber vê sedemê, rêziknameya bernameyê tune ye, lê rêxistin hem xwedan rêzikname û hem jî xwedan bername ye. Bername rêziknameya wê tune ye û ev jî ne gengaz e. Yekem ji ber ku derbirîn ne rast e, ya duyem, xwespartina serboriyên gelên din. Ez dikarim bibêjim ku ji bo kar an operasyonekê, propagandaya çekdarî ne propaganda ye. Em mînakekî zindî bidin. Heger bi

serperiştiya partiya me li Batman û Ceylanpînarê, li vir û li wir erd hatibina serdestkirin, girev, xwepêşandan an civîn, pêk bihata, wê demê rêklama ji bo wan li Enqere û Elzaxê propagandaya lêşkerî ye.

Yan jî tiştine mîna wan; weke pêkanîna operesyoneke çekdarî li dijî çeteyan an li dijî paşverûyekî û sîxurekî; propogendaya ji bo van di hundirê welêt de yan jî ji derveyî welêt weke propogendaya leşkerî nayê hesibandin. Ya çekdarî ew e ku tê de ji bo armancine propogendayî, çek tê bikaranîn.

Dozname dixwaze partiyê mîna çete yan artêşekê destnîşan bike, lê ew di bingeha xwe de, rêxistineke siyasî ye. Ji bo bidestxistina desthilatê, rêxistinên siyasî alav in. Armanca Partiya Karkerên Kurdistanê ew e ku desthilatê bi dest bixe û ji bo vê armancê tê dikoşe. Hûn dixwazin têkoşîna gelek rêxistinan weke têkoşîna ji bo bidestxistina desthilatê bidin nîşandan: Dema dabaşa têkoşînê tê kirin, hûn bi taybetî fişarê li alîgiran dikin. Weke ku têkoşîneke biguman e(çekdarî). Tevî ku ev nerast e.

Gelek partî hene ku ji bo bidestxistina desthilatê û avkirina hikûmetekê têkoşînê dikin, lewma em wê dikin rewşeke hevrikiyê de. Rê û rêbazên bidestxistina desthilatê gelek in. Partî li dijî rijandina xwînê ye. Em ne xwînrij in; em jî mirov in. Lê heger di dema hevrikiya ji bo desthilatê de pêwîstî bi bikaranîna tundiyê hebe, dê rêxistina ku bidestxistina desthilatê ji xwe re kiriye

armanc, bê dudilî tund û tûjiyê jî bi kar bîne. Pêwîst e em baş li ser vê xalê bihizirin.

Nekuştina me ji mirovan re, rêzgirtin û hezkirina me ji wan re, ev vedigere mirovbûna me, lê nabe kelem ku em şer jî bi kar bînin. Li gelek welatên sosyalîst an jî kapîtalîst, ji bo hemûyan polîs, artêş û dewlet heye. Çima ev polîs û artêş hatine damezrandin? Bêguman ji bo ku dema bê xwestin şer bikin. Bi wateyeke din, tundî jî weke navgînekê di têkoşîna siyasî de tê bikaranîn û têkoşîna siyasî têne weke têkoşîneke çekdarî nayê hesêb. Gelek şêweyên têkoşînê hene; girev, meş, xwepêşandan, rêxistinkirin, propaganda û provakasyon. Ev hemû navgînên têkoşînê yên rêxistinên siyasî ne.

**Dadwer:** Partiya Karkerên Kurdistanê kîjan navgîn bi kar anî?

**Tawanbar:** Awayek ku partî wê bi kar bîne yan jî red bike tune ye; partiyê ji xwe re gelek erk û armanc danîne.

**Dadwer:** Armanca van erkan çi ye?

**Tawanbar:** Heger destûr hebe, ez ê şîrove bikim. Ji bo xwe gihandina armancê, bêguman, navgîn girîng e. Mînak: Heke ez bixwazim ji Ewrupayê biçim Amerîkayê, ez nikarim li ser hesp an jî bi kerê biçim, lê divê ez bi balefir an jî keştiyekê bi kar bînim. Wate, ji bo xwegihandina armancê, divê navgîna guncaw hilbijêrim.

Partiya me erkine giranbuha dane pêşiya xwe. Ji armancên wê yên demdirêj avakirina civakeke wekhev û bêçînayetî ye; yanî jiholêrakirina hemû çînan. Her weha tunekirina hemû cureyên stemkarî û keysbaziyê ye. Lê erkên wê yên nêzîk avakrina welatekî serbixwe û demokratîk e. Helbet dê navgîn li gor armancan bin û ji van armancan re bikaranîna navgînên dijber nabe. Yanî nabe ku navgînên Machiavellian ku li dijî armancên me ne, bêne bikaranîn.

Armancên giranbuha, pêwîstiya wan bi navgînên guncaw û bikêr heye; ne pêkan e ku ji bo pêkanîna van armancan, navgînên bênirx bi kar bên. Ez ê behsa hinek tawanên ku li partiyê bar bûne, bikim:

Her partiyek ango rêxistineke siyasî erk û berpirsyariyên xwe li gor şert û mercên welatê ku tê de têkoşînê dike, destnîşan dike. Yanî ew partî li gor şert û mercên welatê ku lê dijî, rê û rêbaz û navgînan hildibijêre. Mînak: çapemenî, weşan û radyo, herger pêkan be û rêxistina cotyar û karkeran jî. Ji van navgînan- ev girîng e- ji bo çekdariyê pêwîst e rêxistineke leşkerî jî hebe. Bi kurtasî, dozname dixweze partiyê, mîna çeteyan bide diyarkirin, lê di bingehê de, tiştekî wisa tune ye.

Lê belê, yek ji armancên partiyê, avakirina eniyekê ye û paşê avakirina artêşekê girêdayî vê eniyê tê. Ev rast e û ez ji vê agahdar im. Ez nêrînên partiyê yên îdeolojî bi awayekî taybet nas dikim.

Ez dixwazin behsa xaleke din bikim. Ev bû çend car hûn min bi tenê tînin vir û carinan bi komine din re. Di

darizandina me de, benda 168'an bingeh tê girtin. Her weha 30 bendên din jî hene, lê ji ber ku pirtûkên mafnasiyê li ber destê me tune ne, em nizanin çi di van bendan de heye. Ez bixwe naveroka wan nizanim, dibe ku ev tiştekî seyir be jî, lê hin têgeh gelek caran derbas dibin em wateya wan nizain. Ji ber di mafnasiyê de, agahiyên me kêm in. Mînak peyva "Aparat" pir dubar dibe, lê em wateya wê nizanin! Gelo polîs bi kar tînin an jî peyveke mafnasiyê ye? Em ji hev pirs dikin ka wateya wê çi ye? Lê bersiv tune ye! Her wisa mîna wê gelek peyv derbas dibin û nêzî (30) bendî tên gotin bêyî ku em bizanibin çi tê xwestin!

Di nava lêpirsînên destpêkê de, me wateya benda /168-125/ texmîn kir, ji ber gelekî dubare bû û li gor ku ez nas dikim, benda /168/ girêdayî damezrandina komikêm Mafyayî ye yên ku ji bo armancên cuda tên rêxistinkirin û di nav de jî armancên siyasî.

Dema belgeyên me hatin, pirtûkeke mafnasiyê bi wan re hebû, ez hinekî bi benda /125/ agadar bûm. Naveroka wê ev e: Qutkirina beşekê ji xaka ku di bin desthilata dewletê de, yan jî girêdana wê bi cihine din ve, an jî damezrandina dewleteke serbixwe yan jî ji bo armancine din, weke hewldana qutkirina parçeyekê ji xaka ku di bin destê dewletê de ye û sizaya van kiryaran, darvekirin e.

Li gor baweriya min, heger benda /168/ an /450/ yan jî /170/ yan jî kîjan bend be, ez naveroka van bendan nizanim. Lê min digot ku dê benda /125/ der heqê me de, pêk were. Baweriya me ew bû. benda 168'an ku partiyê

mîna artêşekê diyar dike, ev şaşîyeke mezin e. Tawanek e ne di cih de ye! Ev behaneyên hiqûqî ne. Di baweriya min de, darizanidina me bêhtirî xwe siyasî ye ne hiqûqî ye. Li gor ku ez têgihaştim benda 125'an girêdayî sizayên siyasî ye û tu têkilya wê bi bûyerên polîsî û sizayên normal re tune ye. Ji ber pirtûkên girêdayî zagonan an jî belgeyên zagonî di nav destê min de tune ne. Ji ber vê yekê, agahiyên pêwîst li gel min tune ne. Lewma ez pir di vê der barê de, nikarim biaxivim.

Ez dixwazim derbasî mijareke din bibim, dibe ku hûn jî dixwazin zelel bikin û dibe ku tawanbarên din jî vê dixwazin. Ew dê alîkar be di dana hin îfadeyên ku gelek rastiyên dîrokî, derxe holê.

Heger belgeyên saloxgeriyê di dest me de hebin (me xwestibûn) û heger derfet heba me îfadeyên xwe nivîskî bidaba û heger pirtûkên zagonan bi me re hebana, me dikarîbû îfadeyên xwe bi awayekî berfireh bidana. Ji bilî doznameyê tu tişt di dest min de tune ye. Ez ne ropot im, ez mirovekî normal im! Di rewşeke weha de, ez dê nikaribim hemû tiştên ku ez dizanim ji dadgehê re zelal bikim. Ji ber vê sedemê, min tenê karîbû hemû tawanên dijî partiyê kom bikim û ez ê bersiva wan bidim.

Yek ji van tawanan ew e ku tê gotin partiyê li dijî gel, tundî pêk anîye. Heger mebest karker, cotyar, rewşenbîr, ciwan û beşên niştîmanî yên din bin jî, ev tawanek e ne di cih de ye. Lê heger mebest bi peyva gel; feodal, paşverûtî û sîxur be, rast e. Partî ji bo ku xwe biparêze tundî li dijî wan bi kar anî. Ez ê vê yekê bi dilekî fireh şîrove bikim.

Hemû kesên di nava tevgerê de û yên ku piştgirî û alîkariya wê kirin; di milê îdeolojî de ne di heman astê de ne. Têgihiştina wan ji dozê re jî ne yek e û ev jî ne pêkan e. Yanî hemû ne di astekê de ne, lewma dibe ku hinan bi navê partiyê tundiyê li dijî hin kesan pêk anîbe, lê ev xet û îdeolojiya partiyê îfade nake û tiştekî wisa jî tune ye, ji ber ku ev partî ji gel e û ji bo gel têkoşînê dike. Ew rêxistinek a karkeran e. Tevî ku hêza xwe ya bingehîn ji vê çîneyê digire, lê ji hemû cemawerên kedkar jî hêzê werdigire.

Çi rêxistina siyasî ya hêza xwe ji cemaweran digire, dema fişaran ser wan pêk bîne, ew xwe mehkûmê tunekirinê dike. Di vê derbarê de, ez dixwazim hin tawanên dijî partiyê zelal bikim.

Di lêpirsînê de min hevaleke girtî dît. Wê da xuyakirin ku tu têkiliya wê bi tevgerê re nîn e, lê ew hevjîna yekî ji dilxwazên tevgerê ye. Bi rastî min heta wê kêliyê jî ew nas nedikir. Piştî ez ji lêpirsînê vegeriyam, ez ketim girtîgeheke girêdayî çekên endazeyî. Lê ew di zindana hejmar /1/ de bû, dema ez veguhezîm heman zindanê, ji min re got:" Bi darê zorê hiştin ku ez li ser du belgeyan wajo bikim". Min jê re got gerek te wajo nekiriba. Wê got: "Dest avêtin min (tecawiz) û di destavêtinê de ço bi kar anîn. Ez neçarî wajokirinê kirim." Heta niha min ji tu kesî re negotiye, lê rastî ev e. Işkence, fişar û bikaranîna hêzê ji kevin de siyaseta fermî ya dewletê ye.

Dema ku hûn lêpirsînê bi me re dikin hûn dibêjin:" Ev ne îfadeya we ya di bin işkenceyê de ye." Ev tê wateya ku hûn mukur tên ku polîs fişar û işkenceyê bi kar tînin.

Hin ji endamên partiyê û dilxwazên wan ên ku bi koka xwe kedkar in, ji ber kîna çînatîyê li hember hinek din, carinan xerab tev digerin. Lê ev ne siyaseta partiyê ye, ne ji îdeolojiya wê ye û tu carî wê nebe jî. Kesên wisa jî hesab ji wan tê xwestin û têne hişyarkirin ji bo van şaşiyên wisa dubare nekin. Min ev weke mînak ji dewletê re got.

Niha ez ê behsa hin tiştên girêdayî xwe ne bikim. Tawanên li dijî min hene. Heger hûn bixwazin ez ê bersiva wan bidim. Ez ê ji destpêkê ve dabaşa wan bikim an jî mîna jînenîgariyê, weke hûn dixwazin.

Di sala (1974 - 1975) min li zanîngehê ezmûnên pejirandinê pêşkêş kirin. Pileyên ku min kom kiribûn derfet dida ku ez li Zanîngeha Hacetepeyê bixwînim. Min xwe li wir tomar kir. Beriya wê ez dilxwazê Çepgiran bûn. Min belavokên Çepgiran ên curbicur mîna rojname, kovar û pirtûk dixwendin. Her weha ez bi dilxweşiyekê bi Marksîzma- Lênînizmê ve dihesîm.

Dema min dest bi dewama zanîngehê kir, hingê Komeleya Demokratîk a Xwendekarên Zanîngehê li Enqerê hebû. Ez carekê yan du caran bi ser wan de çûm. Her weha bi ser Yekîtiya Ciwanên Şoreşger û Partiya Karkerên Sosyalîst ya Tirkiyayê (TISP) diçûm, lê min gelek kes li wir nas nekirin. Paşê Komeleya Demokratîk

a xwendekarên zanîngehê ya li Enqereyê hate girtin. Her wisa, ez bi ser Komeleya Hacetepeyê û hinên din de jî diçûm. Ez bi hin kesan re diketin guftûgoya dewlet, demokrasî, faşîzm û kêşeya avakirina partiyê û şêwazên têkoşînê. Şahîn Donmez ew jî yek ji wan kesên ku mîna min di heman kêşeyan de, lê dikola. Di sala amadekariyê de, em di heman refê de bûn. Wî li Zanîngeha Hacetepeyê dixwend. Piştî sala 1975`an êdî Şahîn Donemez, gelekî dabaşa mafê gelan di dîyarkirina çarenûsa xwe de dikir. Ji bilî Şahîn jî, ev yek li gel hemûyan mijara balkişandinê bû. Bi taybet Partiya Karker û Cotkaran li Tirkiyeyê T.K.I.P. Partiya Karkeran pir pirtûk û kovar belav kirin û êriş dibir ser wan kesên ku paşguh dikirin mijarên neteweyî û mafê gelan di dîyarkirina çarenûsa xwe de. Ji ber ku ez pir xemxurê xwendinê bûm, min pir dixwend; çi pirtûk an kovarên ku nû derdiketin, min dixwest bixwenda. Min hin ji wan dixwendin û hin ji wan diman, lê weke rêzexwendin min didomand.

Di heman demê de, xwişka min jî weke min li Enqereyê dixwend. Wê di heman demê de dixwend û kar jî dikir. Lewre min gelek caran hin drav jê digirtin da ku pirtûkan bikirim û bixwînim. Min berî niha li Eskişehir û Balıkesir dixwend, lê belê ez bi şoreşgeran û tevgera wan hestyar bûm. Her weha di wê demê de, ji ber ku min dixwest hemû bîr û ramanên Marks û Lênîn nas bikim, pirtûkên ku mijarên wan mijarên neteweyî, demokrasî û dewletan bûn, min dixwendin.

Di wê demê de, min ji Şahîn re li ser pirsa netewan û mafê gelan di dîyarkirina çarenûsa xwe de, guftûgo dikir, lê belê ew ne di wê rewşê de bû, baş nedizanî. Wî ji vir û wir dibihîst û li ser wê yekê pir caran guftûgo dikir. Her weha dema ku me bi hev re çayê vedixwar an li kafeterya rûdiniştin. Wî hertim li ser mijara neteweyî nîqaş dikir, lewre pêwîst bû ku em nêrînên xwe der barê wê mijarê de ava bikin û vekolîn bikin. Wî ne tenê bi min re guftûgoya vê mijarê dikir, ev yek bû sedema ku ez pirtûkên girêdayî mijara neteweyî jî bixwînim.

Di wê demê de, pirtûka Lênîn ya di der barê mijara neteweyî û û mafê gelan di dîyarkirina çarenûsa xwe de nebûn, her weha pirtûkên Stalin û Marks û yên mîna wan nebûn. Çiqasî ez geriyam, lê ew ger bê encam bû. Min ji kovar û hin pirtûkên din ku di der barên mijara neteweyî de ne dixwend, di derdora sala 1970î de min hin pirtûkên girêdayî kêşeya neteweyî xwendin û zanebûna min di wê çarçoveyê de dewlemend bû. Zanebûna min a wê demê ne mîna ya niha ye, lê belê em her gav bi Şahîn û hin kesên din ku ne di nava tevgerê de bûn tevlî ku nêrîn û ramanên xwe der barê mijara netweyî de pêşkêş kiribûn re di nava pêwindiyê de bûn.

Di konferansa Komelya Şoreşgerên Demokrat a Çandî de (D.D.K.D), ez beşdar bûm, lê ez pir bi wan bandor nebûm ji ber ku bêhna borciwaziya neteweyî ji wan dihat. Di destpêka wê de, min nerazîbûna xwe ji wan re da xuyakirin. Rast e, ez diçûm komeleyekê, lê ez bi wan bandor nedibûm ji ber ku min xwe li ser rêbaza înternasyonal a Marksîzma Lênînîzm didît. Yan jî min

hewla vê yekê dida, lê belê ew neteweyî bûn û ramanê Marksîzma Lênînîzm bi wan re peyda nedibû û ji bo vê yekê, ez nêzî wan nebûm.

Hevalekî min ez bi Heqî dam nasîn, lê nayê bîra min ku ew dîdar li mala xwendekaran li Fakulteya Zanistên Ramyarî yan li baxçeyê Fakulteya Mafnasiyê bû.

Heqî nêrînên xwe di gelek mijaran de dan û ji min bêhtir rexneyên tûj li Komelya Şoreşgerên Demokrat a Çandî dikir û tekez dikir ku ew borciwazîyên neteweyî ne. Her weha rexne li çalakî û tevgera wan kir. Ev bû sedema ku ez pê re bi vehesînê bihesim. Piştî wê rûniştinê, min çendî hewl da ku ez pê re rûnêm, lê ev yek gelek caran pêk nedihat. Min pir ji raman û kesayeta wî hez kir û min xwest bi wan re têkoşîn bikim û pabendî îdeolojiya wan bibim. Ji bilî ku ez pir bi kesayeta wî bandor bûm, nêrînên me li hev dihatin. Min nedizanî ku ew kom in, tevger in an çi ne, tenê min dixwest ku tevlî wan bibim û erkekî biavêjin ser milên min. Coşa min ji vê mijarê re pir mezin bû! Dema ku ez vegeriyam welat, min ji gelek hevalên xwe re û ji birayê xwe re jî dabaşa Heqî û rêhavalên wî Cemîl û Doran kir, yên ku paşê tevlî refên me bûn.

Li Rojhilata Navîn, nearamiya rewşa aborî, siyasî û civakî mijara lêkolînê ye. Ji ber ku Rojhilata Navîn xwedî bandoreke pir mezin e li ser aboriya cîhanê. Ji bo tu destê xwe li ser aboriya cîhanê daynî, pêwîst e tu petrola Rojhilata Navîn desteser bikî. Ev yek ji mêj ve heye; ji serdemên kevin, an ji serdema feodalîzmê û heta

serdema kapîtalîzmê, xwestin ku dest li ser Rojhilata Navîn daynin. Di vê serdemê de, ev hevrikî di navbera hêzên Kapîtalîzmê û sosyalîzmê de jî heye û jixwe di herêmê de, Kurdistan xwedî cihekî stratejîk e. Divê bê fêmkirin ku Kurdistan xwedî girîngiyek jeopolîtîka ye. Eger tê xwestin; dûrxistina Rojhilata Navîn ji nîrê desthilatdariya hêzên Kapîtalîstî Emperyalîzm û qewtandina emperyalîstan, li Kurdistanê ya ku paşverûtî lê bi cih bûye, pêwîstiya lidarxistana şoreşekê heye. Jixwe ev yek dê ne pêkan be ku birêveberiya niha ji borciwaziyan an borciwaziya neteweyî bin, wê pêkanîna wê ne gengaz be, lê tenê dema ku birêveberiya wê ji çîna kedkaran be. Ji bo vê yekê, li Kurdistanê pêwistî bi avakirina prolotariyeke serbixwe heye. Her weha pêwîstî bi rêxistinkirina gel, karker, cotkar û welatperweran heye. Ev erk bi taybet jî dikeve ser milê rewşenbîr û ciwanê kurd in. Ev erkên me ne û pêwîst e di vê der barê em têkoşînê bikin. Me di nava xwe de, ev zelalbûn û raman, guftûgo dikirin. Her weha li derdora xwe me dida belavkirin.

Di hezîrana sal 1976'an de, ciwanekî ji aliyê Sirûcê hat kuştin. Ew xwendekarê Zanîngeha Hacetepeyê bû. Navê wî baş nayê bîra min, lê dizanim ku di oxirkirina wî de, hin xwendekar ji Enqereyê hatin û di nava wan de, Xeyrî û Kemal hebûn. Lê mixabin li Sirûcê hatin binçavkirin û di Zindana Amedê de, ew bi cih kirin. Tevî ku tiştekî fermî di navbera me de tune bû, lê ez hestyarê wan bûm. Ez  ji Qereqocanê çûm serdana wan li zindanê

û li gor tê bîra min, nêzî 1200 lîreyan wekî alîkarî min da wan.

Her ku min hin ciwanên nû nas dikirin, min ramanên tevgerê bi wan re parve dikir.

Di dawiya sala 1976'an û destpêka sala 1977'an de, min biryar da ku dest ji zanîngehê berdim û xwe ji îdeolojiya tevgerê re vala bikim. Wê çaxê ev ne peywireke rêxistinî bû, ji ber ku tevgerê rengê xwe yê rêxstinkirî hîn baş negirtibû. Her weha hevalan jî ew bawerî baş nedabûn min, ji ber tênegihiştina min ji nêrînên wan re. Lewma min dest bi tu erkî nekir, tenê li gel wan rûdiniştim û min li nêrînên wan ên îdeolojîk guhdar dikir. Piştî demekê tevlîbûna min hate erêkirin. Min gelek caran, pere ji malbata xwe distand ji bo ku pê cilan bikirim, lê belê min ew pere didan Heqî û Cemîl. Me bi wan pirtûk dikirîn.  Yan jî carinan bi wan pereyan ez diçûm min serdana hevalên xwe yên li Enqere û Stenbolê dikir û fikir û ramanên tevgerê bi wan re parve dikir, ji bo zêdekirina alîgiran. Yanî me pêwendiyên tekane jî pêk tanîn.

Ji ber naskirina min ji keskî ji Batmanê re, ez tim diçûm serdana wî û min hewl dida ku di rêya wî re ez alîgiran qezenc bikim. Jixwe ji mêj ve heta niha Batman bajarê karkeran ne û her tevgereke siyasî ku xwe weke nûnerê wan didît, dixwest bingehekî gelerî li Batmanê bide avakirin.

Heqî, berî min hin caran ji bo axaftina bi gel re, dihat Batmanê. Lê ji ber nezanîbûna wî bi zimanê kurdî û şerê

borciwaziyên neteweyî bi wî re ku guman dikir ku ew mirovekî tirk e û propaganda ji bo kurdan dike. Ev yek bû sedema derketina wî ji Batmanê. Lê berî ku derkeve li hevalekî digeriya ku şareza be, di zimanê kurdî de. Ev nûçe min bihîst û bi rijdbûn min xwest ku min bişîne herêmê da ku ez bi erka wî rabim, lê ji ber tirsa wî ku ez nikaribim bi vî erkî rabim ew dudil bû û ji bo moralê min neşkîne wî digot ``tu dizanî``.

Di dawiya sala 1976'an de, min çenteyê xwe amade kir. Her weha min hin drav ji malbata xwe stand nêzî (500) lîreyî bûn da ku bi wan biçim herêmên başûr ji ber ku min dibihîst ku wê li Ceylan Pînarê semînerek li ser Faşîzmê li dar bikeve. Min berê xwe dida wir, li çayxaneyekê rûdiniştim û carcaran min berî dida yekîtiya mamosteyan û min têkiliyên xwe bi wan re çêdikir û li gel wan radizam. Yenî tu dikarî bibêjî ez mîna geştiyarekî bûm.

Di sala 1977'an de, ez li Batmanê dimam û gelek caran min serdana wê dikir, carinan hefteyekê- sê hefteyan yan jî pênc rojan lê dimam.

Dadwer: Tu li ku derê û bi kê re bûyî?

**Tawanbar:** Di meha nîsanê û havînan de, ez li derveyî bajar bûm; cihê min ê xew û xwarinê tune bû. Ez li derve radiketim, carcaran li "Yekîtiya Mamosteyan" û li "Komeleya Xwendekarên Amadehî" radiketim. Her weha hin caran ciwanan min vexwendî malên xwe dikirin. Bê guman min ev yek ji destê xwe bernedida. Ji ber ku di rêya vê yekê re (bi taybet di dema rûniştina bi ciwanekî

re di ber çayeke xweş û bi sorkirina çixarakê re), min çi mijar heba bi wî re parve dikir û ramanên tevgerê jê re vediguhast. Li Batmanê aniha grûpek heye; li ser vê yekê bîner in  ku ez li derve razam û min zor û birçîbûn dît. Lê ez dikarim bibêjim ku gelê Batmanê mêvanperwer in. Me tu vexwendin ji ciwanan red nedikir. Em derbasî mala xwe dikirin. Tevî ku carcaran cilên me nepaqij bûn jî. Ne tenê wisa bi derketina rojê, cilê paqij ji me re pêşkêş dikirin. Ev rewş bi piranî hevalên me re çêdibû.

Tu drav ji bo kar û xebatên me, nedihatin terxandin. Dema ku em ji cihekî diçûn cihekî din, bi saya alîkariya dost û hogiran çi ji hêla erebeyan ve çi ji hêla dravî be dibûn pişt û bersiv bo me. Ev rewş heta payîza 1978'an berdewam kir.

**Dadwer:** Gelo tu li Batmanê mayî?

**Tawanbar:** Na, çalakiya min heta 1978'an berdewam kir, ango heta tebax û tîrmeha wê salê. Lê ji bo pirsa te ya li ser propagandayê, dema tu ji tawanbarekî re dipirsî te propaganda ji çi operasyonê re dikir? Bersivê didin ku ew bi wê propagandayê rabûne yan yek din.

Lê min bixwe propaganda ji tu operasyonan re nekirî, lê belê di ber Marksîzma Lênînîzm û şoreşa Kurdistanî de, dikir. Min nêrîna xwe û ya Marksîzmê di der barê dewleta demokratîk de, dida. Her weha min rêxistin, mijara neteweyî, têkoşîna di ber azadîya neteweyî de û xebatên leşkerî guftûgo dikirin, lê min propaganda nekir ji çi operasyonê re. Lê ger em pirs bikin, gelo min tu propaganda ji tu oparsyonan re nekirî? Belê, min ew

kiriye. Bo nimûne: Heger em bibêjin ku, ez li cihekî ji gund rûniştibûm, di dema pevçûna di sala 1978'an de ligel rêbir, feodal û hozên ji êla Silêman. Gelo min li gund çi dikir?

Min bi hevalên xwe re, hişmendiya paşverû, sawdara wan li dijî vî gelî û têkoşîna tevgerê li dijî vê yekê, dida diyarkirin. Pirs, ji bo wan kesên ku dibêjin bi karê propagandayê rabûne. Hûn ji bo çi operasyonê bi propagandayê rabûne? Bersiva me dan, ji bo vê operasyonê. Ji ber ku ew jî mîna min li ser dewleta demokratîk û rewşa heyî li Kurdistanê ji hêla aborî, siyasî û civakî axivîne. Jixwe li gorî têgihiştina xwe axivîne çi rast an şaş be. Ango ne gengaz e ku  ev propaganda bi vê operasyonê yan a din were pîvankirin! Ez bixwe jî di derbarê van mijaran de, pir diaxivîm; rewşa jiyanî li welêt, çawa derbasbûna me ji wê re, şêwazê bilindbûna asta têkoşînê û navgînên pêwîst e bên bikaranîn. Jixwe bi giştî ev guftûgo bi kesên ronakbîr re dihat kirin, ji ber ku asta wan her li pêş e û tê digihiştin ez çi dibêjim û mijar dişopandin. Lê ev nayê wê wateya ku bi çîna kedkar û cotkaran re, nehatiye guftûgokirin. Min tu carî derfeta axaftinê ji destê xwe bernedida û bi taybet dema ku ciwanan ez vexwendî gundê xwe dikirim.

**Dadwer:** Li ku derê û çawa pêwendî bi gel re dihat kirin?

**Tawanbar:** Li çayxanan, komele, gund û kolanan. Min yek derfet ji destê xwe bernedida û min tevahî dema xwe bi sûd derbas dikir, lê carcaran heger min nikarîba hin mijar zelel bikirana û nêrîna tevgerê derbarê wan de bida

nîşandan, min ev yek ji hevalê xwe ku ew jî bi karê propagandayê radibûn, dipirsî. Bo mînak: Ji bo mijara rêxistinkirinê çi bersivê bidim û nêrînên ku divê bînim ziman çi ne? Min pirs û guftûgo dikir û ew agahî vediguhestin ji cemaweran re. Ev çalakiya min heta gulan an hezêrana 1978'an dom kir. Tekez nayê bîra min, lê bi giştî min propaganda bi devokî li gelek deveran çêkir.

Di bûyera Amedê de, cara yekem bû ku dabaşa navê min hat kirin. Ew jî di bûyera revîna Elî Dorsin de bû. Lê belê ev nûçe ne dirust bû. Ji ber ku ez di wê operasyonê de beşdar nebûm. Tişta ku min kir ew bû ku min carekê du caran hin alav (pirtûk, kovar ...) veguhistin ji cihekî ber bi cihekî din ve. Eger em bêjin ez li Amedê me ji bo amadebûna civînekê yan dixwazim guftûgo û gotûbêjekê bikim, an jî pêwendiyan digel kesayetek ez berê nas dikim, an jî dixwazim biçim Batman an Besmel, êdî divê ez çi bikim ji bo cihê ku ez biçimê? Min pirtûk, rojname yan broşûr bi xwe re dibir. Ev bû tişta ku min dikir. Bi tu awayî ez beşdarî tu çalakiyan nebûm. Jixwe ez di wê demê de ne li Amedê bûm. Bûyera reva Elî Dorsin, min ev nûçe di rojnameyekê de, dît ku bi awayekî şaş hatibû weşandin, ev yek baş tê bîra min. Bi vî rengî nivîsî bû: " Elî Dorsin li ser destê hevalên xwe hatiye revandin û kuştin." Li gorî agahiyên polîsê hevalên wî ew kuştine.. wisa min xwend..

Xaleke din a ku bala min kişand ew e ku biryara vê bûyerê li navçeya Helwan û Sêwrikê ji hêla Dadgeha Gel ve, pêk hatiye. Lê ez dixwazim vê yekê zelal bikim. Dadgeha Gel, dadgeheke demokratîk e, êdî gel bixwe

biryarê tê de dide, ji ber ku ev rêgez ji rêgezên partiyê ne. Ya soseret ew e ku çawa wê ev yek pêk bê?! Li navçeyekê ku ne di bin serweriya partiyê de ye, wê çawa dadgeheke gelêrî ava bikin?! Ev yek hiş napejirîne. Ji ber ku Kurdistan bi tevahî dibin dagirkeriya dewleta Tirkiyeyê de ye. Hemû zagon ên navendên wê ne. Tu tişt bi navê Dadgeha Gel li herêmên di bin serweriya wê de tune ye. Li ser dirêjahiya dema ku min li wir derbas kir, min tiştekî wisa bi vî awayî nebihîst. Ger wisa heba min ê bihîstiba dema dibêjin filan kes hat darizandin û siza wî ev bû.

Ji bo mijara Dadgeha Gel, pir tişt tevlihv kirin; ji ber ku dihate gotin ku endamên tevgerê jî ji hêla Dadgeha Gel ve tên darizandin û siza der heqê wan de tên dan. Lê weke di rêziknameya tevgerê de, dihat zanîn ku kesê şaş bibe, kêmasiyan bike, ew ji hêla Komîteya Navendî bo Komîta Disiplînê tê veguhestin û ew li gor zagonên xwe û tawana kesên tawanbar, biryar di der heqê wî de tê standin. Bi kurtasî ji bo darizandinê, komîteyên taybet hene. Ev yek di rêziknameya partiyê de sepandiye, çilo û bi çi û kî dê endama siza bike? Êdî nabe ku em bibêjin evên din Dadgehên Gel in.

**Dadwer:** Çi sedem bûn berê we da ramana Kurdistanê? Çima hûn dibêjin Kurdistan û gelo we bi hûrbînî li dîrokê temaş kiriye?

**Tawanbar:** Belê, min baş dîrokê hûrbîn kiriye.

**Dadwer:** Jêdera te ya dîrokî çi ye, peresîna wê ya dîrokî çi ye, her weha hûn xwe bi felsefeya Marksîzmê didin

diyarkirin û hûn dibêjin felsefeya Marksîzmê bi mijara nijadî re nakok e, tevî daxuyaniyên we, çima hûn hatin vê yekê? Gelo ev yek di ramanên we de, ne nakokiyeke?!

**Tawanbar:** Ji bo pirsa te ku kengî û çima em bi ber ramana Kurdistanê ve diçin. Pirsa çawa û kengê min berê xwe da ramana kurd û Kurdistan pirseke seyr e. Xwedîderketina mijarên wisa ne di rojekê de ava dibe. Ez niha di temenê 26'î salî de me û ez dikarim bibêjim ku têkiliyên min bi tevgerê re, di sala 1976'an de dest pê kir. Yanî tê wê wateya ku temenê min 21 sal bûn û ji wî temenî ve, min pêwendî û hevaltî bi celebên kesan re kir û ez di jiyanê de, xwedî ezmûnekê me. Yanî ez guhdar im û guftûgoyan dikim û dibînim û dixwînim. Êdî bê guman wê ramaneke zelal li gel min saz bibe.

Ji bo mijara kurd û hebûna kurdan, ev yek ne cihê guftûgoyê ye û pêwîst nake em gufûgoya vê yekê bikin. Ji ber ku belî ye û li qada fermî ya Tirkiyeyê pêdan pê hatiye kirin. Di radyo û televîzyona Tirkiyeyê de, peyva kêmnetewe derbas dibe û ragihandina Tirkiye peyva Kurdistan bi kar netanî. Lê ev yek di demên dawî de, tê bikaranîn. Ev yek, jî mijareke gelekî seyr e.

Wekî ku tê bîra min, serokê (MHP)ê Torkêş yê ku li cem me navdar e bi faşîsta xwe, di sala 1979'an de, di der barê rewşa kurd û azerî de, li Îranê daxuyanî da. Wî der barê wan komkujiyan, rêjîma Xumênî tawanbar kir. Wî ew rexne dikirin û ji dewleta Tirkiyeyê xwest ku wekî bîner nemîne ji bo wan bûyerên rû didin.

Min bixwe her tiştê ku li ser mijara kurd û Kurdistanê li Tirkiyeyê dihatin belavkirin, dixwend. Ne tenê ev yek, lê belê min hemû pirtûkên ku vê mijarê di nava xwe de dihewîne, dixwend.

**Dadwer:** Te çi xwend?

**Tewanber:** Min Dîroka Kurdistanê ya Nûjen xwend, ew pirtûkek ji weşanên çapxaneya Ronahiyê li Almanyayê hatibû çapkirin.

**Dadwer:** Belê, wateya wê Rok e.

**Tewanber:** Belê, min pirtûka bi navê Têkoşîna li Kurdistanê ya ku vedigere sedsala19'an a nivîsakar Halvin, weşanxaneya Komal û pirtûka Dîroka Kurd û Kurdistan ya nivîskar Mihemed Emîn Zekî, pirtûka Zinar Slopî bi nasnavê Bişerîvan a ku têkildarî Kurdistanê ye ku bi awayekî raz û destbidest belav dibû. Pirtûka bi navê Kurd Miletekî Bêpal in, pirtûka Oliya Çelebî ya ku beşekî kurdî di nava xwe de dihewand. Min beşa têkildarî kêmnetewan a pirtûka Simayîl Heqî ya bi navê Bazara Mezin a ku di der barê dîroka Osmaniyan de ku ji 8 bergan pêk tê, pirtûka Osman Nûrî ya ku di der barê kurdan de û pirtûka Basîl Nîkîtîn a ku bi nasnavê Kurd, xwendin, Yanî bi kurtasî hemû pirtûkên min texmîn dikir ku tiştekî li ser kurdan bibînim, min xwendine. Her weha pirtûka bi serenavê "Raperîn di Çaxê Komarê de" ya ku ji hêla erkanên giştî ve dema ku ez li Enqerayê ji bo mijara neteweyê dixebitîm, hat derketin.

Ev pirtûk dabaşa raperîna di çaxê komarê de, dikir û ragihandinê diyar dikir, siyaseta Tirkiyeyê li hemberî pirsa kurd û Kurdistan wekî ku çawa niha ez dabaşa wê dikim. Mixabin min ew pirtûk hemû nexwend! Heke min bixwenda, min ê hin mijar jê derxistibana û min ê siyaseta dewleta Tirkiyeyê li hemberê Raperîna Şêx Seîd û tevgera Dêrsimê derxistiba, lê belê min tenê di şevekê de xwend.

Ev pirtûkên ku min dabaşa wan kir, hemû dabaşa kurd û Kurdistanê dikin. Ger ev doz tune ba wê ewqas nivîskar pê mijûl nebûbana; rewş û bûyerên civakî xwe dide tevîkirin. Ango civak, netewe, çîn, partî û rêxistin çima armanceke ne pêkan li ber çavên xwe danayînin û eger wisa bikin, êdî weke ku serê xwe tehtê bixin!

Gelo çima Partiya Karkerên Kurdistanê û mijara Apocîtiyê berî salên (1600-1700-1900) û heta salên (1950-1945) tune bûn?  Gelo çima hemû kesên ku li vir girtî ne, ne bi sûcên diziya ker û hêştiran hatin girtin; berovajî wê bi sedemên siyasî, hatine girtin?! Ez dikarim agahiyan der barê dîroka kurdan bidim, lê ez tu behaneyê nabînim bo guftûgoya hebûna kurd an nebûna wan, ji ber ku ev yek belî ye.

**Dadwer:** Bi kurtasî biaxiv.

**Tawanbar:** Ez di der barê dîroka Kurdistanê de diaxivim.....

**Dadwer:** Gelo ev pirtûk ramanên nivîskar dinimînin an xwe dispêre jêderên piştrast?

**Tawanbar:** Hin li gor baweriya kesayetî ne û hin jî xwe dispêrin jêderine piştrast.

Min pirtûka Hîrodot  a ku dabaşa Mîdiyan dike, xwend. Erê, ne mîna pirtûkên dema niha, li pêş e, lê belê li gor baweriya xwe dibêje mîdî wisa û wisa ne.

Her weha di pirtûka Evliya Çelebî de, weha tê gotin ku dewleta Tirkiyeyê ji navçeya Heskêfê li bakurê Kurdistanê 23 sindoqên zêr birine, ji Amedê 128 sindoq û ji Navçeya Dekayê jî ewqas sindoqên zêr …. Jixwe wî nêrînên xwe li gor agahiyên wê demê dinivîsand.

Ka em bibêjin ku min pirtûkên der barê dewleta Tirkiyeyê de xwendin.  Di wan de tê gotin ku hatina wan ya yekem bo Kurdistanê di sala 1040'î de bû û bi kurdan re niştecih bûne. Her weha, nivîskar vê yekê diçespîne ku kurd ji çi nijadî bin bila bibin an ji ku hatibin ne girîng e, lê li gor zanistiya min ew ji bakurê Ewrûpayê hatine. Bi taybet ji Girava Scandinaviayê û ji zozan û bilindahiyên Rûsyayê hatine.

**Dadwer:** Kîjan nivîskar tekez dike ku ji Scandinaviayê hatine?

**Tawanbar:** Bixwe min bi hûrgiliyên wê, lê temaşe nekirye, lê belê nivîskar Evdullah, lêkolînke wî ya berfireh di der barê vê yekê de heye. Min ev agahî ji pirtûka wî wergirt, lê belê ew ne tenê vê yekê dibêje. Mamoste Mihemed Emîn Zekî, Osman Nûrî û Zinar Slopî jî vê yekê dibêjin.

**Dadwer:** Gelo di kîjan salan de bû?

**Tawanbar:** Di sala 1000'î B.Z de ye. Lê weke min ji te re got, ev ne girîng e; dibe ku ji filan nijadî be yan yên din bin.

**Dadwer:** Baş e, tu yê çawa Kurdistanê li Tirkiyeyê çêbikî û kurd ji Scandinaviayê hatine?! Hûn dixwazin dewleta xwe çêbikin; jêdera vê ramanê çi ye?

**Tawanbar:** Ji bo min, mijara ji ku hatine, ne girîng e. Kurd ji mêj ve, bi gelên din re têkel bûne; û weke gel, kurd li Kurdistanê bi cih bûne. Ger tu li rûpelên dîrokê, temaşe bikî tu yê bibînî, bi dehan-sedan netewe ji dika dîrokê rabûne  û her weha hinan  heta îroj hebûna xwe parastine. Ger tu baş li dîrokê binêrî tu yê bibînî ku li ser Ekadan, Îtaniyan, Etroskîn û Kalîrînan baş hatiye vegotin. Mîna pirtûka Mihemed Emîn Zekî ya ku dabaşa pir gel û neteweyan dike û dabaşa kêşekêşên wan dike. Hin ji wan weke pergala siyasî xwe daye diyarkirin, lê di dawiyê de ji holê çûne û hinan ji wan heta qonaxa neteweyî xwe parastine û li ser dika dîrokê, rolek lîstine.

Min, ev hemî da diyarkirin ji bo ku ji te re bidim xuyakirin ku ne girîng e tiştê te dabaşa wê kir. Pir gel bi hev re têkdan bûn li seranserê vê dîroka dirêj. Her weha bo hebûna kurdan rastiyek heye; ew jî ziman û çand e û ev yek nayê veşartin.

**Dadwer:** Baş e, gelo lêkolînên we di der barê çandê de hene?

**Tawanbar:** Belê, mijarên têkildarî ziman û çandê hene.

**Dadwer:**  Heke lêkolînên we tune bin…..

**Tawanbar:** Belê hene, ez ne mirovekî li vê astê têneqihiştî me.

**Dadwer:** Heger lêkolînên we der barê vî zimanî de tune bin, gelo ev nayê wê wateyê ku ev ziman têkil e ji gelek zimanan?

**Tewanber:** Ger zimanekî têkel be, qet ji min re ne derdek e.

**Dadwer:** Tu dibêjî ku ziman û çandeke me heye, lê ku ev ziman têkel be ji çend zimanan, gelo wê wek ziman, bê pejirandin?

**Tawanbar:** Ne girîng e ku ev ziman bi hin zimanan, bandor bûbe yan zimanên din bi wî bandor bûbin. Gengaz e ku neteweyek, du, sê û çar bi zimanekî baxivin. Mînak: Pir netewe li Amerîka Latînî bi zimanê ingilîzî daxivin û ev yek mînakeke berbiçav e. Gelek dewletên dîtir bi zimanê portugalî û latînî daxivin, ev yek netewebûna wan, nade mandelkirin.

Weke ku min behs kir, ne girîng e ku zimanê kurdî bandor bûbe yan jî bandor li zimanên din kiribe û têkildariya zaravan jî ne girîng e. lê ya girîng rêziman e û jixwe rêzimana kurdî ji ya tirkî cuda ye. Zimanê kurdî ji koka Arî ye û ji malabata Hindo-Ewrûpî ye. Di vê der barê de agahiyên min ev bûn.

**Dadwer:** Gelo evên tu dabaşa wan dikî, di dîrokê de, dewlet ava kirine?

**Tawanbar:** Belê.

**Dadwer:** Kîjan dewlet ava kirine?

**Tawanbar:** Tişta ku ez dibêjim, dîrokê gotiye. Mînak: Beriya zayînê di sala 571'ê de, Emperatoriya Mîdyayê ava kirine. Ev emperatorî di 500'î de B.Z li ser destên Farisan hat rûxandin.

**Dadwer:** Li ku derê Medan emperatoriya xwe ava kirin?

**Tawanbar:** Ez dikarim bibêjim cihê ku niha kurd lê dijîn, li wir ava kir.

**Dadwer**: Mebesta te ku der e?

**Tawanbar**: Erdnîgariya Mîdiya ji Gola Urmiyeyê heta Çemê Firatê bû. Lê ew li ser destê heman kokê şkestin; ew li ser destên farisan şikestin. Lê belê, ez dikarim bibêjim ku kurdan di serdema farisan de, taybetiya xwe parastin û di serdema koledariyan de jî; ne tenê di serweriya farisan de, lê belê di serdema Emperatoriya Byzantium de jî taybetiya xwe parastin.

Di wan qonaxan de, kurd rastî êrişên bişaftinî nehatin, lê ji hêla civakî ve ew li pêş nekitin û lawaz man. Di serweriya ereban de, bişaftinê dest pê kir. Bi taybet di Cenga Qadisiyê de, sal (737-834) dema ku derbasî Kurdistanê bûn û yekem ceng di navbera kurd û ereban de di salên 740-840 de pêk hat. Kurd, ne tenê ketin bin serweriya îslamê, lê belê ew pir bi wê bandor bûn.

**Dadwer**: Beriya zayînê yan piştî wê?

**Tawanbar**: Ez dabaşa piştî sala 1300 Z dikim. Weke ku em dizanin, di wê demê de gelek mîrnîşîn li Anadolê

hebûn; ji mîrnîşîna Osmaniya biger heya mîrnîşna Karasîn. Her weha di wê demê de, li Kurdistanê jî mîrnîşîn hebûn û ji bo parastina hebûna xwe pergala derebegiyê (feodalîzmê) didan pêş. Heman tişt li welatê ereb û eceman jî hebû. Ji ber ku Kurdistan her dem rastî zordariyê dihat û cihê rûdana nakokî û şeran bû, aboriya (berhema) wê li pêş neket. Ji ber van sedeman, li Anadolê û welatê ereb û eceman dewletên navendî yên derebegî ava bûn, lê ev yek li Kurdistanê pêk nehat. Nakokiyên di navbera derebegeyên kurd de, heta sedsala 16'an berdewam dikir. Dema ku li Ewrûpayê dewletên samanî, navendî, di sedsala 16'an de derketin û sînorên neteweyî ji wan re hat danîn û neteweyên ku xwediyê heman ziman û çandê ne, di nava van mîrnîşînan de kom bûn û ji ber hebûna yekbazarê, bingehên avakirina neteweyan derket holê. Lê li Kurdistanê ev yek pêk nehat. Li Kurdistanê derebegeyî di nava nakokiyên hundirî de bû; dema ku aliyek têk diçû, berê xwe dida hêzên din mîna osmanî û sefewiyan û alîkariya wan dixwest. Bi vê yekê Kurdistan di navbera osmanî û sefewiyan de veguherî qada şer. Dîroka di pey re em hemû dizanin.

**Dadwer**: Biçe cihê xwe.

Civîn bi dawî bû.

Binçavkirina hemû tawanbaran dê berdeam be. Ji bo beşdarkirina wan li civîna bê, nameyk ji bo rêveberiya zindanan bê nivîsîn, da ku wan werînin di civîna bê de.

Civîn ji bo dîroka (19.06.1981) roja înê saet 8'ê sibehê, hat paşxistin (taloqkirin).

Biryara dadgehê di (18. 06.1981) de bi giştî hat dayîn.

Serokê dadgehê - Dadwer - dadwerê nivîskar

Ev belgename ji "Serxwebûnê"  hejmarên /5,6,7/ hatine wergirtin.

Ev daxuyanî, ji heval şehîd Mazlûm Doxan; endamê Komîteya Navendî, bi navê dîlên şer di zindana Amedê de amade kir ji bo gelê Kurdisanê yê leheng. Tê de, kiryarên hovane yên dagirkerên tirk di zindanan de, di der heqê kesên pêşverû, demokrat, şoreşger û welatparêz de eşkere dike.

**Ji têkoşerên dîlgirtî, ji bo gelê Kurdistanê yê leheng;**

hikûmeta Tirkiyeyê ya kolonyal û faşîst, a ku di krîzên aborî û siyasî yên zor de dijî, dikeve bin bandora armancên emperyalîzmê û dixwaze wan pêk bîne. Ew bi vê yekê zordestiya xwe tundtir dike. Bi taybet di der heqê gelê kurd de ku faşîzma tirkiyeyê ya kolonyal hemû karînên xwe di şerê li gel wê de, bi kar anîne. Piştî ku ala têkoşîna pêşverûyê roj bi roj bilind bû, hikûmeta tirkiyeyê ya dagirker di sala 1980'yî de bi hezaran şoreşger, kesên demokrat û welatparêz girtin. Ew xistin

zindan û girtîgehan ji bilî bi sedan kesên gazî ku ji ber kiryarên hovane yên MITê tirkiyeyê şiklên wan hatiye guherîn. Piştî ku biryar kete destê hêza leşkerî de, faşîstan di dîroka (12.09.1980'yî) de, bi polîs û leşkeran li ser hin herêm û gundên biewle bi dijwartrîn rêbazên nemirovane, oparasyoneke xurt da destpêkirin. Her weha bi armanca xurtkirina bargehên xwe yên leşkerî li Kurdistanê ji aliykî ve û ji aliyekî din ve, afrandina rewşeke xerab û bêhêvîbûnekê li cem gelê kurd, dest bi girtina gelek welatiyan kir.

Hikûmeta dagirkeriya faşîst, li Tirkiyeyê bi hemû hêza xwe dest bi tunekirina hêzên rikber kir û gelê me di bin işkenceyeke zor re derbas dike. Anha li Zindana Amedê zêdetirî 2000 girtî di bin şert û mercên herî dijwar de dijîn. Ew weke dîl, ji mafên xwe yên herî biçûk bêpar in. Her roj ji aliyê desthilatdaran ve, bi rêya xencer û binkeya Klaşinkovê û bombeyan, rastî gefxwrinê tên, ji bilî sixêfên ku ji aliyê cerdevanê zindanê ve ji wan re tên kirin (bi armanca bandora li derûnî û gewdeyê wan).

Bi vî rengî di zehmettrîn rewş de, nîvê têkoşerên gelê me, di zindanan de dijîn. Ê ku ji ber işkenceyê nemiribe jî hêviya jiyanê, winda kiriye. Dermankirin tune ye; bikaranîna derman ji aliyê girtiyan ve, tevî ku hin ji wan bi nexweşiyên vegir ketine jî, qedexe ye. Girtî, di zindan û girtîgehên tekane yên taybet de, bicihkirî ne. Ew ronahiya rokê nabînin; êdî nizanin ku roj e yan şev e. Ên ji wilo xerabtir jî, ew kiryarên cerdevanên zindanan «ew kesên ku faşîzmê ew ji nava refên xwe hilbijartine» ên ku li ser girtî û şoreşgeran disepînin. Mîna bikaranîna

heyberên hişbir û lîstina qumarê. Roj bi roj, zindan bi têkoşeran tije dibin û cih li wan teng dibe. Girtiyan, şeva xwe di nava sermayê de derbas dikir. Weke hewldanekê ji desthilatdaran ji bo kêmkirina rojên hevdîtinan an jî rakirina wan ji kokê de, di rojên hevdîtinan de, ji malbatên girtiyan re, astengî derdixistin.

Cerdevanê zindanê yê faşîst, li nava wan digere û hevoka xwe ya navdar dibêje: "Komunîst, hêjayî sizayê mirinê ne" û têkoşeran dibe cihê işkenceyê. Zelal e ku li pişt van kiryaran, dewleta faşîst, kesên paşverû û çete hene.

Di zindana mezin û fireh de, ya ku dewleta faşîst ew li Amedê, li taxa Baxlirê ava kirbû, di razangeha hejmara 5'an de, efserekî bi pileya servan (captain) û li ser razangeha hejmara 1'ê çawîşekî esmanî, çavdêrî dikir. Her du celad ji saloxgêriya tirkî (MIT) bûn. Ew berpirsên tundkirina işkenceya di der heqê şoreşgeran de ne, bi armanca têkbirina vîna şoreşgerên welatparêz. Her weha ji bo pêkanîna armancên xwe tundî û zordariyê bi berdewamî di der heqê wan de, dikin. Lê têkoşîna girtiyan û berxwedana wan di zindanan de, rewşeke metirsîdar li cem faşîstan diafrîne. Ew baş tê dighêjin ku ew dê sizayên xwe li ser destên van şoreşgeran, bistînin û ev karê wan ê faşîstane wê bê sizakirin derbas nebe. Li ser vê bingehê, hêzên faşîst di der heqê şoreşgerên azadiya Kurdistanê de, dijwartirîn cureyên zilm û zoriyê bi kar tînin.

Li himber van hewldanan, şoreşger bi rijdî li ber xwe didin û bawer in ku wê rojek bê ku serê faşîstan bi çakûçê destê şoreşgeran, bê pelixandin.


**Gelî şoreşger, demokartîk û welatparêzên birûmet ên li Kurdistanê!**

Faşîzmê dikarîbû girtiyên şoreşger ji nava refên we dûr bixe, lê tu carî nikare vîna wan têk bibe. Ew hîna jî leşker in û dilsoz in ji Kurdistanê re. Ew di rêya têkoşîna xwe re û zordariya li ser wan û ji berpirsyariya dîrokî ya li ser milên wan û ji ber ku ew xwediyê maf û azadiya Kurdisatnê ne, di tarîtiya zindanan de banga xwe dighînin we û baweriya wan heye ku hûn ê bê dudilî, cihê xwe di nava karker û cotkaran de bigirin........

Hûn in ewên ku hêzên şoreşger, ên ku hêvî li ser wan ava dibin, pêk tînin. Ji bo pêkanîna armancên gelê me, bi hezaran têkoşer di zindanên faşîstan de û di bin ala PKK'ê de, destaneyan dinivîsin û bi lehengî li ber xwe didin.

- Bimire desthilatdar û faşîzma Tirkiyeyê.
- Em ê berpirsên işkencekirinê, di zindanan de siza bikin.
- Bijîn têkoşerên azadî û serxwebûnê!
- Di pêşerojê de, asta têkoşîna xwe bilindtir bikin!
- Bijî Partiya Karkerên Kurdistanê!

Zindana Amedê (Diyarbekirê)
Têkoşerên Dîlgirtî!



**Mihemed Xeyrî Dormûş**

Endamê komîteya navendî ya partiya karkerên Kurdistanê(PKK)

Ev wêne beriya ku ji aliyê desthiladariya faşîst ve bê binçavkirin



**Mehmed xeyrî Dormûş. Piştî dîlgirtina wî di dema işkenceyê de**



**Rêheval Mihemed Xerî Dormûş: di dema pêşkêşiya parêznameya xwe ya dîrokî de**

**Ji Dosyeyên Doza Partiya Karkerên Kurdistanê.**

**Di dosyeyên dadgehê de, têkoşîna ji bo serxwebûn û azadiya Kurdistanê, dibe para dîrokê.**

**Dadwer**: Desteya dadgehê li hola dastnîşankirî civiya û civîna dadgeha leşkerî ya hejmara 5'an a girêdayî zagonên leşkerî di roj û demjimêra destnîşankirî de, dest pê kir. Ev yek jî piştî ku cara din hatibû paşxistin, bê ku tu guhartin, ne ji aliyê dadwer, ne jî di dosyeyan de çêbibin.

Hemû tawanbar amade bûn, grûpên Sêrt û Batmanê çûn cihên xwe yên destnîşankirî. Paşê nehazirbûna tawanbarên ku nehatine girtin, li civînê hat tekezkirin, lê parêzerên wan (Newzet Helwacî, Hisên Yeldirim, Hisên `Onî Altayî û Silêman Deniz) amade bûn.

Dadwer, bang li tawanbar Mihemed Xeyrî Dormûş kir.

Jêpirsîna Mihemed Xeyrî Dormûş dest pê kir.

**Dadwer**: Dadgeh dibîne ku tu endamekî Komîteya Navendî yê Partiya Karkerên Kurdistanê yî û yek ji damezrînerê vê partiyê ye û ji ber arandina te ji kuştinê re, em te bi binpêkirina zagona hejmara (6136) tawanbar dikin.

**Tawanbar**: Ez endamekî rêxistina Partiya Karkerên Kurdistanê me, pêşenega têkoşîna ji bo demokrasî û azadiya Kurdistanê. Ji destpêka lidarxistina çalakiyên tevgerê; ji dema ku bi rengê grûp bû, ez beşdar bûm. Her weha, ez di çalakiyên avakirina partiyê de û civîna damezrandina wê de jî beşdar bûm. Piştre, ez weke endamekî Komîteya Navendî hetim hilbijartin. Ango rast e, ez endamekî Komîteya Navendî me, lê ji bo angaşt û

tawanbarîyan, ez ê di dema îfadeya xwe de, yek bi yek bersiva wan bidim.

Ez bi arandina kuştina mirovan hatibûm tawanbarkirin, ez ê anha bersiva vê yekê bidim.

Min biryar bi vê yekê nedaye, ez bi karekî bi vî rengî ranebûme û ez vê tawanê napejirînim (rede dikim). Ez ê îfadeya xwe piştî demek kurt, berdewam bikim. Anha ez ê belgenameya tawanbariyê bixwînim û mîna hemû hevalan, ez dixwazim hinek şaştiyan tê de, zelal bikim bikim.

Ez ê piştî belgenameyê, îfadeya xwe berdewam bikim.

**Dadwer**: Beriya te Mazlûm Doxan nerazîbûna xwe der barê belgenameyê de nîşan da. Xalên ku wî anîne ziman dubare neke.

**Tawanbar**: Ez ê bi kurtasî bibêjim, li gor ji min tê xwestin, ez ê hin zelalkirinan ji yên hevalên xwe cudatir bibêjim.

**Dadwer**: Belê, baş e.

**Tawanbar**: Ez tevlî gelek gotinên hevalên xwe dibim, ne tenê heval Mezlûm Doxan, lê hemû hevalên ku diyar kirin û hemûyan dipejirînim. Lê bi taybet ez ê dabaşa xalên ku wan zelal nekirine yan jî ji bîra wan çûye, bikim. Ji bo vê jî, ez ê dabaşa hin xalên destnîşankirî bikim, lê bi rengekî cuda.

**Dadwer**: Lê bi kurtasî.

**Tawanbar**: Belê, ez ê hemûyan bi kurtasî bibêjim.

Ez gotina xwe ji dadwer, yan jî ji dadgehê bi xwe re dibêjim.

Di dema dadgehkirina tevgera me de, dadwer berê xwe dide siyasetê, bêhtir ji rêgez û zagonan. Ez dixwazim belgeyeke ku vê yekê aşkere dike, pêşkêş bikim. Weke ku tê zanîn …. Dadgeh. Ew jî darizandineke taybet û ji yên din cudatir e. Dema ku darizandineke taybet tê lidarxistin, ew siyaseta rêjîma heyî pêk tîne.

**Dadwer**: Ev nêrîna te ye.

**Tawanbar**: Bêguman, ev nêrîna min e; ez ramanên xwe dibêjim. Di vê rewşê de, siyaseta dewletê der heqê me de çi ye? Heger der barê me de, ev helwesta dadgehê be, divê em baş li siyaseta dewletê binêrin. Dewlet ew helwest û daxwaza xwe ya qirkirin û belavkirina me bê dudilî, aşkere dike. Armanca siyasetên wan tunekirina me ye.

Ev yek di nûçeyên desteyên fermandarî yên zagonên leşkerî de diyar e. "Tevgerên ku geflêxwarinê li yekîtiya welat dikin, dê bên têkbirin".

Bi vî rengî nîşan didin. Weke ku tê zanîn, dewlet ji bo pêkanîna siyasetên xwe, van rêbazan bi kar tîne û yek ji van rêbazan jî dadwerî ye ango dadgeh e. Dadgeh Ji bo astengkirina çalakiyên wan, biryaran der heqê bi sedan ji endamên partiyê, şervan û piştgiran de distîne. Ji bo wê jî heta ku ez vê yekê zelal nekim, ez berdewam nakim. Bi sedan partîzan û şervan tên dadgehan ji bo diyarkirina

îfadeya xwe, di heman demê de ji hemû derfetên parastinê bêpar dibin. Tevlî agahdarkirina şêwirmendê dadê bi dehên caran ji bo rewşê heyî, lê wî destûra hin alîkariyên pêwîst neda. Me daxwaza pirtûk û bendên zagonan kir. Her weha ji bo parêznameyê, me daxwaza hin pêwîstiyan kir, lê tu encam negirt...

************************************

**Tawanbar**: Ez ê hinekî dabaşa wê bikim paşê ez ê berdewam bikim.

Weke ku min beriya niha jî gotibû û ev yek di îfadeya polîsan de jî aşker ye, bi sedan ji piştgir û hevalên me hatin ku îfadeya xwe pêşkêş bikin. Ez bixwe amade bûm, dama hemûyan got ku naveroka belgenameya tawanbariyê, mîna naveroka îfadeya wan e ya ku di dema işkencekirinê de hatibû girtin. Tu guman tune ne ku naveroka belgenameyên tawanbariyê mîna heman goveyan e ku di dema jêpirsînê de, hatibûn standin. Mijarek din ji vê çêtir heye. Belgeyeke girîng heye, ez dixwazim aşkere bikim. Tevgera me weke ku komek nijdevan hat dîtin. Weke tê zanîn, çalakiyên nijdevanî qedexe ne û li gor zagonên sizakirinê yên Tirkiyeyê ya hejmara 168'an, tên cezakirin. Êdî ji bo girtina rêberên tevgera me ew bi lidarxistina çalakiyên negirêdayî vê cureyê, hatin tawanbarkirin. Paşê li gorî goveyên belgenameya tawanbariyê cezayê bidarvekirinê li wan tê birîn. Di demekê de ku diviyabû rêberên tevgera me li gor zagona sizakirinê ya hejmara 168'an bên tawanbarkirin, ew bi sûcên din li gor bendên (4-5-) ji

zagona 450'î hatin tawanbarkirin. Weke ku em di belgenameya tawanbariyê de jî dibînin, tevgera me destpêkê weke îdeolojiyekê derket holê, bi demê re bû bi awayê siyasî û jê re bernameyeke xuyayî, rêzikname û raman hene. Her weha nirxandinên wê ji rewşên ku li welêt rû didin re, hene. Li gel dadgehê belgeyên din û pirtûk jî hene, li şûna ku belgename me weke tevgereke îdeolojî  tawanbar bike, em dibînin ku me weke rijdevanên çekdar dihesibîne.

Belgename nirxandineke rast ji bername û îdeolojiya tevgera me re di nava xwe de nahundirîne û xwest tevgera me weke komek çeteyan bide xuyakirin. Xala yekem ku min dixwest zelal bikim, ew e ku dadgeh tevgera me weke tevgereke siyasî nabîne. Xala duyem ya ku ez dixwazim li ser rawestim, ew heman xal e ya ku hevalên min ew anîye ziman, ez dixwazim dabaşa hin aliyên wê bikim. Sûcê ku tevgera me weke rijdevan dinirxîne, tinazkirn e. Ez weke endamê komîteya navendî vî sûcî napejrînim, ez ji hevalên xwe cudatir im, zanebûna min ji ya wan berfirehtir e, ez qonaxên pêşketinê ku tevgera me tê re derbûas bû baş nas dikim. Tevgera me qet mîna hêzeke milîs derneket holê...

Weke grûpek çekdar ji çeteyan di çiyan de cihê xwe asê nedikir. Tevgra me tu carî ne grûpeke ji kesên revyayî û kujer e yan jî komeke ku xelkê talan û wêran dike. Tevgera me ne rijdevan e, tiştek bi vî rengî tune ye.

Desteya dadgehê yan jî dadwer bixwe, vê yekê baş dizane. Ji belgeyên li ber destên we, ji goveyên ku hatine

dayîn û mukurhatinan diyar dibe ku destpêka derketina tevgera me, bi rengê îdeolojî  bû. Ez ê vê yekê bi hûrbînî piştî demeke kin zelal bikim. Piştî 1970'î  tevgera me bi rengekî îdeolojî, Marksî -Lênînî bingeh ji xwe re girtiye. Ew li gor şert û mercên welat pêk aniye û bingeha civaka Kurdistanê analîz kiriye. Her weha ev mijar bi mehan guftûgo kiriye û di vê der barê de, gelek xelekên perwerdehiyê hatin lidarxistin. Piştî vê yekê gelek civîn hatin lidarxistin. Di van civînan de, rewşa tevgerê, welat û şoreşê dihat guftûgokirin.

Di salên dawî de û bi derbasbûna demê re, tevger neçarî bikaranîna rêbazê têkoşîna çekdarî bû. Bi vê yekê bûyerên kuştinê derketin. Ji aliyekî ve tevgera me dest bi blavkirin û firehkirina rêxistinê kir û bi awayekî siyasî û rêxistinî avakirinê dest pê kir. Ji aliyekî din ve jî, parastina kadroyên xwe û hebûna xwe dikir. Bi taybetî di wê qonaxê de, bi gelek çalakiyên çekdarî rabû û tedbîrên xwe di vê der barê de girtin û grûpên çekdar ava kirin. Grûpek çekdar hat avakirin û çalakî li dar xistin. Em vê yekê mandele nakin, lê destpêka tevgera me îdeolojî  bû, paşê di warê siyasî û rêxistinî de li pêş ket. Ev bingeh e, ango avakirina partiyê di destpêkê de, weke gava yekem tê û mijarên din di dawiyê de tên û bipêşxistina aliyê leşkerî ji tevgerê û avakirina komên çekdar weke gava duyem ji têkoşîna îdeolojî  ya tevgerê re tê.

Tevgera me "Partiya Karkerên Kurdistanê" ye û binavkirina me bi (apocî) yan bi Artêşa Rizgarkirina Neteweyî (U.O.K), ne di cihê xwe de ye. Heta ku ev nav di nava xelkê de belav bûbe jî binavkirina me ji aliyê

dadwer ve di belgenameya tawanbariyê de, bi vî awayî û li şûna îdeolojiyê, têkoşîna leşkerî dan pêş, tiştekî şaş e û bi mebest ji aliyê wî ve tê kirin.

Mijara sêyan, girêdayî bangeşeya leşkerî ye, ez dixwazim li ser vê mijarê rawestim. Beriya min hevalan dabaşa hin aliyên wê kiribû. Weke ku heval Mazlûm diyar kir, tevgera me şerê şoreşgerî bi awayekî destpêkî, dipejirîne. Ev bawerî, bi Marksîzm- Lênînîzmê re, ne nakok e. Mebesta min Marksîzm- Lênînîzm li her cih û her deman banga şer nake, em hemû tiştan bi şer çare nakin. Marksîzm- Lênînîzm bi rengekî teng li tiştan nanêre û rêbazên aştiyane dide pêş. Lê heger em baş li şoreşên civakî binêrin, em ê bibînin ku tu şoreş li cîhanê çênebûne, bêyî ku xwîn di wan de bê rijandin û biserktina şoreşan, bi têkoşîn û rijandina xwînê, rastiyek e.

Her weha şoreşên çînatî û tevgerên rizgariya neteweyî piştî têkoşîneke leşkerî ya demdirêj bi ser ketin. Gelo em, ên ku vê rastiya binirix nas dikin, em ê şerê şoreşgerî û têkoşîna leşkerî weke rêbaz ji bo têkoşîna rizgariya neteweyî nepejirînin? Na, em li dijî xwediyên vê nêrînê, têkoşînê dikin û em wan rexne dikin. Em dibînin ku mercekî sereke yê serkeftina tevgerên rizgariya neteweyî, ew e hebûna rêxistinek xurt û avakirina eniyeke bihêz e. Bi wateyeke duristtir; lidarxistina têkoşîneke leşkerî ya demdirêj û ev ramana me ya destpêkê bû. Lê rabûna me bi çalakiyan ji bo propagandayê ev yek pêk nehatiye. Di Marksîzm- Lênînîzmê de, tiştekî bi navê bangeşeya leşkerî tune ye û ev yek li cem hin kom û tevgerên ku şert û mercên welatên wan wilo dixwaze, heye.

Ev bingeha nirxandina şerê êrişkirinê ye. Weke ku em dizanin tevgera me êriş nekirye. Tişta ku di belgenameyê de hat diyarkirin der barê bangeşeya bi armanca tevlêkirina gel ji tevgerê re û sorkirina ciwanan ji bo hilgirtina çekan û avakirina zemînekê ji bo raperînekê û êrişîkirina li ser gel, ev yek ne rast e, me ev yek nekiriye. Ango çalakî û têkoşîna ku em pê rabûn, ne ji bo van armancan bû...

Piştre ez ê vê yekê zelal bikim .... lê em neçarî vê yekê bûn.

Ji destpêka ku tevgera me derket, ew hate armanckirin. Heta di komarê de jî dewletê bi rêbazên herî hovane û bi rijandina xwînê, li ser têkbirina hemû hewldanên guhartina çarenûsa welatê me, kar dikir. Bi hemû rêbazan, hemû rê li ber bipêşketinê girtin. Tevgera me ya ku bûbû hêviya guhartina çarenûsa welat, ji aliyê dewletê û rêxistinên girêdayî MItê ve, bi rengekî xurttir, dihat armanckirin.

Kadroyên tevgera me, rastî gelek Komployan hatin ku ji aliyê van hêzên navbûrî, pêk dihatin. Mînaka vê yekê jî kuştina Heqî Qerar li Entabê ye û mînakên bi vî rengî gelek in. Li hember vê yekê û ji bo parastina kadro û hebûna rêxistinê, tevgera me hin bergirî girtin. Di vê çarçoveyê de, hinek kom hatin biçekkirin û li dijî rêxistinên nokerî û taybet li dijî zordarên gel, hinek çalakî li dar xistin. Weke min berê jî gotibû, ev çalakî ne ji bo bangeşeyê bûn, lê ji neçarî bû û di çarçoveya taktekî

de û ne bi awayê êrişkirinê bû di vî warî de, ez angeşta dozgirê giştî, napejirînim.

Mijarek din heye. Weke ku min beriya niha jî aşkere kiribû, we îdeolojiya tevgera me weke rijdevan nîşan dabû. Di nava destên dozgerê giştî de, pirtûk û kovarên me ku ramanên me diyar dikin ( Kovara Serxwebûnê) heye. Di wan de, girîngiya bernameya me, erkên ku tevgera me xwe ji hilgirtina wan re amade kirine hene . Her weha di wan de, nêrîna tevgera me der barê pirtûk û berheman de, nirxandina wê ji çînên civakî re û rola wan di şoreşê de, diyar dibin. Belgenameya tawanbariyê, li ser van mijaran ranewestiya, ev yek jî bi zanebûn bû; wê bi hevokekê yan du hevokan, dabaşa armancên me kiriye. Weke duh hevalên min jî diyar kirin, belgenameyê armancên tevgera me tenê di çarçoveya avakirina dewleta Marksîzm- Lênînîzmê de dibîne, ez naxwazim carek din dabaşa vê mijarê bikim, lê ev hevok bixwe şaş e. Hevalê min jî nêrîna xwe di vê der barê de diyar kir. Tevgera me ji xwe re bernameyek danî, (bername sînorê kêmtirîn). Ev program li ser du beşan dabeş dibe: Beşa yekem girêdayî aliyê neteweyî yê şoreşa me ye û beşa duyem jî girêdayî aliyê wê yê demokrasî ye. Di vê bernameyê de, şîroveyeke berfireh ji her du aliyan re heye û ji kar erkên wan ên hevbeş bi bernameyê re heye.

Ez ê dabaşa rêziknameyê jî bikim, hevalê min jî ev yek zelal kiribû. Rêziknameya ku belgenamya tawanbariyê dabaşa wê dike, ew ne rêziknameya rast a tevgera me ye, dibe ew îfadeyek be. Min tu rêzikname bi vî rengî nedîtine. Min rêzikname xwend û ew li gel min bû. Di

nêrîna min de, ev goveyeke û weke rêzikname hatiye pejirandin. Lê di rastiyê de, ne rêziknameya tevgara me ye, tê de şaştî û kêmanî hene. Her wisa hinek tiştên rast jî hene. Ne girîng e ku ez dabaşa wan yek bi yek, bikim. Lê ez dibêjim ev ne rêziknameya tevgera me ye. Ez weke endamê Koîmteya Navendî, vê vegotina xwe pêşkêş dikim.

Mijara din a ku ez ê li ser biaxivim, mijara navlêkirina welat e. Dozger, danpêdanê bi welatekî bi navê wî Kurdistan, nake û dibêje:" Apoçî bi armanca avakirina dewleteke serbixwe, hewl didin rojhilat û başûrê Tirkiyeyê qut bikin". Ango ew parçeyeke ji Kurdistanê ye ku em navê bakurê rojavayê navîn ê Kurdistanê lê dikin. Ango parçeyê ku em lê dijîn, ew weke rojhilat û başûrê rojhilatê Tirkiyeyê dibîne. Lê heger em li gor dîrokê binirxînin, em ê bibînin ku tekez beşek ji Kurdistanê ye. Ew di bingeha xwe de beşek ji Kurdistanê ye, ne ji komara Tirkiyeyê ye. Hevalan nêrîna me di der barê vê mijarê de anîye ziman. Ez jî tevlî wan dibim. Em ne xwediyê ramanên netewperestî û şofînîst in û çavên me ne li xaka kesekî ne.

Mijara sereke ew e ku em dibînin, ew xaka ku gelê kurd ji mêj ve li ser dijî û di dema niha de jî rêjeya kurdan li ser vê xakê ya herî zêde ye Kurdisatn e. Ji bo tevlêkirin û tevlênekirina hin beşan ji Kurdisatnê re û ji bo herêmên ku bikevin nava sînorên Kurdistanê, ez tevlî nêrîna hevalên xwe dibin ku beriya niha wan diyar

kiribû. Vîna gel dê vê yekê pêk bîne. Ev yek girêdayî serkeftina têkoşîna me ye. Dibe ku di demeke dirêj de, em nikaribin hin beşan rizgar bikin û dibe ku beşek mabûna ser bi Tirkiyeyê ve bixwaze. Wê demê divê em nêrînên wan di ber çavan re derbas bikin. Lê bi zorê tevlêkirina herêmên cuda ji Kurdistanê re, yan qutkirina hin herêman ji welat û avakirina dewleteke çêkerî, şofînîst, netewperst û nijadperest, li gor nêrîna me, ev ne mijara guftûgoyê ye. Gelê kurd gelekî dîrokî ye. Duh hevalek axivî û hinekî ev yek zelal kir. Ez naxwazim di vê der barê de, biaxivim û guftûgoyê dirêj bikim, lê ez dibînim ku desteya dadgehê mijara hebûn û tunebûna kurdan, yan jî hebûn û tunebûna Kurdistanê dike mijara guftûgoyê. Ev yek, me gelekî matmayî dihêle. Îro pêwîstiya mijarê bi guftûgoya zêdetir tune ye. Ew ji gelek aliyan ve tê pejirandin, di nav de aliyên tirkî jî.

**Dadwer**: Ev alî kî ne?

**Tawanbar**: Belê?

**Dadwer:** Gelek alî hene, ew kî ne?

**Tawanbar**: Ew çapemeniya tirkî bixwe ye; ango çapemeniya tirkî bixwe, ev rastî pejirandiye. Ji planên ku Kurdistanê dikin armanc û siyasta dijberî Kurdistanê re, rûpelên paşverûtî di rojnameyên rojane de hene. Biryara lêkolînkirna vê dozê, bi awayekî dîrokî di siyaseta cîhanî, civînên navneteweyî û danûstandinên aştiyane de, hatiye dayîn.

**Dadwer**: Zanîna te ya berfireh li ser dîrokê heye?

**Tawanbar**: Zanîna min ji dîrokê re hindik e. Yanî di vê der barê de lêkolînên min ên baş tune ne, lê...

**Dadwer**: Naxwe te gelê kurd, tirk û cudakirina wan ji hev, ji me re ji ku anî?

Mafir zanîna te derbarê dîrokê de kêm e, te ev ji me re ji ku anîn?

**Tawanbar**: Ez dixwazim bidim diyarkirin, dema ku ez dibêjim ez nizanim, mebesta min ew e ku ez di vî warî de ne pispor û dîrokzan im, ne ku zanîna min tune ye. Ez mirovekî xwenda me. Bêguman agahiyên min di vê der barê de hene, min gelek pirtûk û belge jî xwendine.

**Dadwer**: Te li ku xwendin, te çi xwendiye?

**Tawanbar**: Der barê kok û dîroka kurdan û hatina wan ji Rojhilata Navîn re, her weha der barê Kurdistanê de….

**Dadwer**: Hatina wan ji Rojhilata Navîn re, ji ku derê bû, çawa bû û di dîrokê de, çi dewlet ava kirine?

**Tawanbar**: Berê min gotiye...

**Dadwer**: Bi kurtasî, dabaşa mijarên ku hevalên te anîne ziman bike.

**Tawanbar**: Ez li ser vê mijarê ranawestim; ango ez naxwazim wê bikim mijara guftûgoyê û ez bi hûrgilî li ser naaxivim.

**Dadwer**: Dadgeh pirsgirêkê nake mijara guftûgoyê, ew pirs dike. Bi kurtasî zelal bike.

**Tawanbar**: Di goveya hevalê min de diyar dibe ku kurd, arî ne û ew ji bakur rojavayê Ewrupayê hatine. Di dema koçkirina neteweyan de ku li dor Iskndnafyayê bi cih bûn, kurd jî bi wan re koçber bûn. Hema bi giştî tê gotin ku destpêka bicihbûna kurdan, li herêma di navbera gola Wanê û Ormiyeyê de bû. Ew ji beriya zayînê ve, bi hezar salî bi awayê hozan li herêmê bi cih bûne. Paşê van hozan yekîtiyek di nava xwe de ava kirin û ev pergala siyasî çêkirin.

Di wê demê de, ji bo parastina hebûna xwe pêwîstî bi têkoşîneke li dijî impratoriya koledar hebû. Li ser vî bingehî yekîtiyek di nava xwe de ava kirin, rêxistina xwe çêkirin û şerekî demdirêj bi asûran re li dar xistin. Di encamê de dewleta Asûrî têk çû û dewleta Medya ava bû. Ev destpêka avakirina yekemîn pergala siyasî ya dewleta kurdî bû. Serweriya Medya, nêzî dused salî di navbera sedsala heftan û ya pêncan de beriya zayînê, berdewam kir.

**Dadwer**: Belgeya te çi ye?

**Tawanbar**: Belgeya min nêrîn û gotinên dîrokzanan der barê vê mijarê de ye.

**Dadwer**: Dema tu diaxivî, tu xwe dispêrî çi belgeyên dîrokî?

**Tawanbar**: Ez dixwazim di vê der barê de, xaleke din bînim ziman. Dema ku gelek li pêşberî desteya dadgehê, dîroka xwe nîşan bide, ne tenê dikare sûdê ji şûnwar û bermahiyên heyî û belgeyên zelal bigire, dikare gelek

piştrastkirinan ji zanyarên navdar û ji kar û berhemên dîrokzanan jî bigire.

**Dadwer:** Ez pirsa belgeya ku we bingeh girtiye, ji te dikim.

**Tawanbar:** Nêrînên dîrokzanan di vî warî de hene. Mîna Hîrodot ku zelalkirnên wî der barê vê mijarê de hene. Her weha gelek belgeyên dîrokzanên sedsalên borî hene û min hemû xwendine. Der barê vê mijarê de, min lêkolîn di insklpedyayan de kirin û min li guftûgoyên ku di civînên lêkolînan de çêdibûn, guhdar kir.

Di dema ku gelek têkoşîna xwe ya serxwebûnê pêk bîne, wê nikaribe lêkolînên berfireh li ser dîroka xwe bike. Bi tu awayî nikare dîroka xwe zelal bike, nikare belgeyan berhev bike. Îro li London, Parîs, Bexda, Şam û Istenbolê û bi taybet di Muzexaneyan de, gelek belge hene. Lê em di wê rewşê de ne ku em nikarin lêkolînan li ser wan bikin. Em nikarin van hemûyan berhev bikin û dîroka xwe ya rast ji wan derxînin.

Divê desteya dadgehê vê yekê bipejirîne, gelek belavok û pirtûkên dîrokzanan hene ku van belgeyan dihundirînin, min got ku me ew xwendine û nirxandine...

**Dadwer**: Te çi xwend?

**Tawanbar**: Beriya anha jî min diyar kir ku min gelek pirtûk der barê koka kurdan (Şerê li ser Kurdistanê) xwendin.

**Dadwer:** Amadekarê vê pirtûkê kî ye?

**Tawanbar**: Der barê koka kurdan de, berhemên ( Nîktîn) hene. Ji bilî wî jî gelek dîrokzan û siyastmedar hene ku giringiyek didan şerê li Kurdistanê û li ser nivîsîne. Her weha belgeyên ku bi navê (di sedsala nozdehan de şerê li ser Kurdistanê) hene û min xwendine. Her weha min pirtûka (Dîroka Kurdistanê ya nûjen) a ku dabaşa rewşa Kurdistanê di serdema komarê de dike, xwendiye. Doza kurdî mijara gelek ji van nivîskaran bû. Ji bilî van lêkolînan jî parêznameya heval Abdulah Ocalan heye. Her weha analîza wî ji dîrokê re heye. Ev yek di Serxwebûnê de tê dîtin. Me gelek tişt der barê dîrokê de, ji heval nas kirin.

Ji bilî van hemûyan, şert û mercên heyî ji me re girîng in. Ango ji bo me, rastiya heyî ew di qada hebûna kurdan bixwe de, mijara lêkolînê ye. Em ji aliyê çandî û civakî ve, cudahiyê di navbera civaka kurd û ya tirk de dibînin.

**Dadwer**: Çi cudahî hene, ji hêla çandî ve çi cudahî hene?

Tawanbar: Gelo hûn çawa dikarin vê cudahiyê mandele bikin?

**Dadwer**: Na, na ji hêla çandî ve, çi cudahî hene?

**Tawanbar**: Li vir nîşeyek heye, mînak bi taybetî di Rojhilata Navîn de, bi belavbûna îslamê re çand û kultûra civakan bûne mîna hev. Her weha jiyana demdirêj a kurd û tirkan û hemû civakan, bûne mîna hev. Her weha li rex hev jiyankirina kurd û tirkan, bandoreke mezin li têkilbûna çand û kultûra herdu gelan kir, lê hîna jî cudahî heye. Zelalkirina wan yek bi yek ne pêwîst e. Dema em

dibêjin nirxên civakî, ew tê wateya ku em hebûna cudahiyê di çand û kultûran de dipejirînin. Mirov dikare vê yekê bi hûrgilî zelal bike, lê ez nabînim ku ev yek pêwîst e. Taybetiya ziman heye û hûn li cem radiwestin...

**Dadwer**: Zimanê ku ji gelek zimanan pêk tê, çawa dê bê pejirandin?

**Tawanbar**: Ez van gotinan napejirînim, zimaneke û heye tu kes nikare mandele bike. Di vî cihî de, em ji hev fêm dikin û ji bo ku hûn jî ji hin kesên ku bi tirkî naaxivin fêm bikin, we leşkerek ji Doxobayezîdê ku bi hezarê kîlometreyan ji vir dûr e, ji bo wergerê aniye. Bi vî rengî û di rêya wergêr re jêpirsîna tawanbarê ku bi tirkî naaxive, hate kirin. Kesên ku bi hezarê kîlometreyan dûrî hev in, tevlî ku têkiliyên bazirganiyê di nava wan de tune ne jî ji hev fêm dikin …

**Dadwer**: Tu çima vî zimanî dikî malê kurdan?

%90 ji vî zimanî, farisî û îranî ye û çi gotinên kurdî di vî zimanî de hene, heta ku tu dibêjî ew zimanê kurdî ye?

**Tawanbar**: Jixwe em aniha bi îraniyan re ne...

**Dadwer**: Ji zimanê erebî, farisî û ingilîzî bistîne û zimanê kurdî çêke.

**Tawanbar**: Ne wisa ye, gelek ziman nêzî hev in. Heger tu bi ingilîzî, farisî û almanî zanibe, tu yê bibînî ku rêgezên wan nêzî hev in, lê cudabûn di bilêvkirinê de xuya dibe.

**Dadwer**: Tu zimanzan bûyî?

**Tawanbar**: Ez ne şarezayê ziman im, lê zanîna min di vê der barê de heye. Min di vî beşî de xwendiye û der barê zimanê ingilîzî de li zanîngeha (Hacetepeyê) lêkolîn kiriye.

Min zimanê inglîzî salekê xwend û rêgezên wî dizanim. Her weha rêgezên zimanê kurdî û farisî jî dizanim û lêkolînên min di der barê zimanê tirkî de jî hene û rêgezên wî jî dizanim. Bi taybet di sazkirina hevokan de, cudahiyeke sereke di navbera rêgezên zimanê kurdî û tirkî de heye. Rêgez jî bingeha ziman e. Rêgezên zimanê kurdî jî xuyayî ne. Ev ziman mîna zimanê Rojavayî ne.

**Dadwer**: Wekheviya wê bi zimanê farisî re, bi vî rengî ye …

**Tawanbar**: Ji ber ku zimanê kurdî ji grûpa zimanê eworpî ye, ew ji aliyê rêzimanî ve mîna ingilîzî ye, lê cudahiyeke biçûk heye. Ango zimanê kurdî ji aliyê rêgezên xwe ve, mîna grupa zimanê ewropî ye.

Ji ber ku kurdan weke ku bi tirkan re jiyane, bi farisan re jî hîn zêder jiyane. Her weha ji ber ku ew û faris ji heman kokê ne, ew zêdetir nêzî zimanê farisî ye, lê ev nayê wê wateyê ku ew yek in û bi zimanekî diaxivin. Gufûgo li ser vê mijarê nabe, ez naxwazim di vê mijarê de kûr biçim, lê ew zelal e. Tu kes nikare mandele bike. Lê ev ziman li pêş neket û hinek gotinên wî hatine jibîrkirin û hinek ji zimanên din girtine. Ez nikarim bibêjim ku zimanekî xurt û dewlemend e …. Ne pêwîst e mirov pesnê wî bide, lê zimanek heye û bi rêgez û gelek tişên xwe yên din, xuyayî ye.

**Dadwer**: Em vê xalê derbas bikin.

**Tawanbar**: Taybetiyek din heye, ez dixwazim li ser rawestim. Tê gotin ku tevgera me xelk bi zorê koçber kirine, di vê der barê de hin pirs hatin kirin. Hevalên min ev xweşik zelal nekir, ji bo wê jî ez dibêjim ku gel bi zorê hat koçberkirin, ev yek rast e, lê ji kengî ve gel bi zorê tê koçberkirin? Di hin deman de neçarî koçberiyê bûye, mîna di serdema Sultan Hemîd de ji hin êlan re hate gotin ku divê hûn ji vî cihî biçin cihekî din. Ev yek di serdema komarê de çêbûye. Gelek caran çêbûye, dibe ku bi rengekî fermî ji tu kesî re nehatibe gotin ku divê tu ji vir biçî cihekî din, lê di rastiya xwe de, ew neçarî vê yekê bûne.

Siyaseta keysbaziyê, ji sedê salan ve li welatê me dimeşe, ev yek di serdema impratoriya Osmanî de jî pêk hatiye. Piştre li Rojhilata Navîn ji aliyê gelek dewletan ve, mîna komara Tirkiyeyê pêk hat, bi taybet ku rêxistinkirina aborî li welatê me pêk hatbû. Daxwaza me ev e … Talankirina aboriyê li welatê me li pêş ketiye. Li welatê me, heger di rêya bikaranîna samanan de baya, yan jî çêkirina rêyan ba, ev hemû ji bo talankirina dewlemendiyên welatê me ne. Heger mirov baş li pirojeya çêkirina rêyan binêre, dê bibîne ku hemû ji bo talankirinê ne û avakirina van rêyan dikeve xizmeta talakirina dewlemendiyên sererd û binerd ên welatê me ne. Mînak, di dema ku rêyek baş ku ber bi Hekarê ve biçe tune ye, em gelek rêyên ku ber bi Cizîrê ve diçin dibînin.

**Dadwer:** Na, te Hekarî dîtiye?

**Tawanbar**: Belê min serdana wê kiriye.

**Dadwer**: Te kengî serdana wê kir?

**Tawanbar**: Ne ji zû de; beriya salek yan du salan bû. Lê dema min got ku rê tune ye, min ne tenê ji bo Hekarê digot, lê ji bo herêmê bi giştî. Di dema ku tu rê ji bo gelek deveran tune ne, em gelek rêyên ku diçin Cizîrê dibînin.

Mebesta min ji vê yekê ew e ku bingeha avakirina aboriyê li welatê me, ji bo talankirina gencîneyên me ye. Di rewşek bi vî rengî de, gel neçarî koçberiyê dibe. Hemû berhemên wî diçin û xaka wî di destê beg û axayan de dimîne. Di van rewşan de, wê gel çawa karibe pêdiviyên xwe yên jiyanî dabîn bike?

Ew koçberî Caqûr Awa, Izmîr, Istenbûl û Almaniyayê jî bûn. Bi sedhezaran xelk li welatên xerîbiyê dijîn, ji bilî wê jî rastiyeke din mîna wê li ber çavan e, ew jî ….

Têkilî û tevgera feodala Kompradoriyê îro bi dewletê re xurt e, Ew desthilatdariya milîsên çekdar li ser gel dimeşînin. Bi salan e ku vê yekê dikin. Ew tevliheviyan di navbera beşên civakê de çêdikin bi vê yekê xelkê ji saman û gundên wan dûr dixin û wan desteser dikin. Bi hezaran mînak der barê vê yekê de hene. Ev yek li Sêwreg, Hilwan, Qiziltepe, Batman û Doxobayezîdê pêk hatiye. Ev rewş li gelek herêmên welat hene. Bi taybet (Mihemed Boçaq) ez nizanim kengî samanên wî jê hatine standin, yan jî di şerê wî li gel dijminê wî de, ev saman ji dest dan. Piştî pazdeh salên din ew dê bibe xwediyê (sî-

çil) gundî, ev jê re ji ku hatin? Ev çawa pêk tê? Ev yek bi zorê pêk hatiye. Ne tevgera me ye ku xwîn li van herêman rijandiye, li Sêwregê Mihemed Boçaq, li Hilwanê êla Silêman û li Batmanê êla Raman, bi hêza xwe xwîna hezarên kesan rijandiye. Havîna 1979'an baş tê bîra min, beriya ku li Sêwregê di navbera me û milîsên Boçaqê de şer rû bide, gelek caran şer çêdibû. Beriya şerê me û boçaqan li wir 15-20 kes mirin û di heman mehan de, gelek gund wêran bûn û hatin şewitandin. Eger em li arşîvê vegerin, ev yek wê bi zelalî derkeve holê.

Ev tê wê wateyê ku bi sedan kes hatine kuştin û koçber kirin. Bi taybetî ez dixwazim bibêjim, kesên ku zilm û zorê li ser gel dimeşînin, ne em in. Ew kesên ku beriya niha min dabaşa wan kir ew in ên ku vê yekê dikin. Coqraooa, Izmîr, Manîsa û Mêrsîn, her weha Almanya jî bi koçberan tije bûye. Bi vî rengî bi hezarên kesan, dest ji warê xwe berdane. Ev yek ne ji ber tevgera me ye.

**Dadwer**: Kurt bike.

**Tawanbar**: Belê, di vê der barê de, min dixwest ez vê bibêjim. Niha bi rengekî fermî û bi hûrgiliyan ez ê îfadeya xwe pêşkêş bikim.

Ji ber ku ji destpêka tevlêbûna min ji tevgerê re min erk wergirtine, dema ku ez dabaşa têkoşîna xwe bikim, ez ê dabaşa awayê pêşketina tevgerê bikim.

Ez naxwazim şert û mercên avakirina tevgerê dubare bikim, ji bo wê jî ez ê dabaşa têkoşîna xwe bikim. Min ji

sala 1970'yî û bi şûn de, ango di qonaxa amadayî ji xwendina xwe de, ji ramana şoreşgerî hez kir. Min ji qonaxa navîn de, ji xwendina pirtûkan hez dikir. Di qonaxa amadayî de û di dema ku Tirkiye di nava têkoşînê de bû, mijarên siyasî bala min kêşa û min berê xwe da xwendina pirtûkên siyasî û min da ser rêya ramana şoreşgerî. Di qonaxa amadayî de, min gelek pirtûkên Marksîzm-lênînîzmê xwendin. Di vê qonaxê de, ez di xwendina hemû pirtûkan de baş tê nedigiham. Piştre di sala (1974-1975) de, ez derbasî Zanîngeha Hacetepeyê ya li Enqerayê bûm. Min lêkolînên kûr der barê gelek pirtûkên Marksîzm-lênînîzmê yên klasîk de kirin. Ji bo baştir ez mijarê fêm bikim, ez beşdarî gelek guftûgo û komcivînan dibûm. Her weha komeleyên (DDKO) hebûn û ez diçûm (AYÖD) jî ku li wê derê komcivîn dihatin lidarxistin û ez beşdarî wan dibûm. Ji bilî wê, di pol û malên xwendekaran de jî gelek guftûgo di navbera xwendekaran de çêdibûn. Bi vî awayî min Marksîzm-lênînîzm fêm kir. Di rêya rewşa herêma me, Tirkiye û Kurdistanê re, min rewşa civakî jî fêm kir. Li herêm û welatê me, min fêm kir ku heta kîjan astê têkiliyên paşverûtiyê, gelê me li paş hiştiye. Şepêlên sazkirinê û ramanên ku banga paşverûtiyê dikirin, tu gav bi pêş ve neavêtine û siyaseta wan, li gor desthilatdaran dimeşiya.

Desthilatdariya heyî, bi têkoşîneke bi vî rengî hêsan, nayê guhartin. Ji ber vê yekê jî baweriya min bi lidarxistina şoreşê hat. Di wê demê de gelek ji komên siyasî, mijara şoreşê didan pêş. Bi rastî kesên ku bawriya wan bi lidarxistina şoreşekê ji bo guhartina

desthilatdariyê dihat, hebûn. Li gor zanîn, nêrîn û pêşketina min a siyasî, ez tê giham ku pêwîstî bi şoreşekê heye. Ev yek jî ji bo jinavbirina desthilatdarên paşverû û têkiliyên paşverûtiyê yên li herêmê bû. Têkoşîna ji bo serxwebûna Kurdistanê di serê min de nehatibû bicihkirin. Her weha li Tirkiyeyê bi giştî jî bi cih nebûbû. Ji ber vê jî baweriya min bi lidarxistina şoreşê hat.

Di dema ku baweriya min bi lidarxistina şoreşê xurt bû û ev bawerî di serê min de bi cih bû û piştre….

**Dadwer:** Şoreşeke Marksî?

**Tawanbar**: Bêguman baweriya min bi ramana Marksî hat. Şoreşeke bi teoriya Marksî dikare bibe şoreşeke neteweyî rizgarker. Her weha dikar şoreşeke çînîtî di nava xwe de bihundirîne. Mariksîzm tekez şoreşeke sosyalîst e; guftûgo li ser vê yekê nabe.

Teoriya Marksîzm û bîrdoziya Marksî heye. Li gelek welatan ev bîrdozî dikar pêşengtiyê ji tevgerên rizgariyê yên neteweyî re bike. Her weha ji tevgerên rizgariya civakî re jî bike. Ango îdeolojiya Marksî di her qonaxê de, pêwîstiyê bi şoreşa sosyalîzmê nabîne, lê berovajî vê yekê ye û em li dijî vê nêrînê ne. Em ji aliyê xwe ve dibêjin ku ev nêrîn, îdeolojiya Trotskî ye; anog jirêderxistina Marksiyetê ye. Parastin û berdewamkirina Markisyetê, ji pêkanîna wê li her welatekî li gor şert û mercên wî yên taybet tê.

Pêkanîna îdeolojiya Marksî di birêvebirina tevgerên neteweyî de, gelekî girîng e. Di doznameyê de ev yek bi

rengekî şaş hat xuyakirin. Di wê demê de, baweriya min bi ramanên Marksî dihat. Her weha, bi lidarxistina şoreşekê li gor şert û mercên welatê me, dihat. Lê di têkoşîna ji bo serxwebûna Kurdistanê de, tiştekî bi vî rengî tune bû. Ez dixwazim vê yekê zelal bikim, dema ku ez gihaştim vê baweriyê û bi şûn de, ez bi kes û komên ku şoreş pêşniyar dikir re di nava têkiliyên yekser de bûm; komele (komeleyên ku rêdan û destûra  xwe ji hikûmetê wergirtine) awayên din ji têkoşînê bûn. Gelek şepêlên din hebûn ku di demên berê de, bi çalakiyan radibûn û me navê (kurdçî, kurd) lê wan dikir. Di baweriya me de ku hinek komên radestkirin û sererastkirnê hebûn û ev kes berê di nava refên (TIP) (Partiya Karkerên Tirkî)  de bûn. Piştre têkiliyên yekser di navbera min û kesên ku di nava refên (DDKD) de (Komeleya Çandî ya Şoreşgerî ya Demokratîk), ên ku piştî 1971'ê dest bi awayên nû yên tekoşînê  kir, çêbûn. Her wisa têkiliyên min bi komên Çep ên tirkiyeyê re jî çêbûn.

Ên ku em wan bi sosyalîzmên şovenîst bi nav dikin. Di wê demê de, guftûgoyên herî çalak, ewên ku ji bo doza kurdî rû didan, bûn. Komên kurdî ku di nêrîna me de komên radestkirin û sazkirinê bûn û komên tirk ku di nêrîna me de sosyalîzmên şovenîst bûn, hemû di nava gelek guftûgoyan de bûn. Doza Kurdisatnê, rewşa dîrokî, rewşa şoreşê, mijara serxwebûna Kurdistanê û der barê şoreşa tirkî de, guftûgo dikir. Lê nêrîna min ji ya wan cuda bû.

Komên kurdî ku me ew bi komên sazker û radestker bi nav dikrin, ne li gor şert û mercên welat tevdigeriyan. Li ser têkoşîna ji bo Kurdistanê nedihizirîn, her dem banga sazkirinê dikir.

Mîna (fêrbûna bi zimanê kurdî û pejirandina wê li herêmê, derfeta jiyaneke hevbeş di nava hemû çînên civakê de) bi vî rengî dihizirîn. Daxwazên wan hebûn û ev yek mafê wan ê sereke ye. Daxwazên wan ji şoreşgerî zêdetir, çandî bûn. Ji ber vê yekê min ew welatparêz didîtin. Min nedidît ku ev hizir dê ji milyonan kedkar, çînên kedkar li Kurdistanê, cotkar, belengaz û rizgarkirina biroletariya re, bibe rêya felatê. Ji ber vê yeke, ez bi tu koman ji wan ve, nehatim girêdan. Mînak ... Di sala 1975'an de, dema ku ofîsên (D.D.K.D) hatin damezrandin, gelek xelk bûn endamên wê.

...

Na, ji ber ku dilê min jê ne rihet bû û tu têkliya min bi wan re tune bû, ez nebûm endamek jê. Komên tirkî yên ku me ew weke sosyalîzmên şovînîst didîtin, Kurdistan û mercên wê ên objektîv û şoreşa li Kurdisatê paşguh dikirin û girîngiya têkoşîna ji bo serxwebûna Kurdistanê fêm nedikir. Bi rastî min nikarîbû bi zelalî li ser vê mijarê bihiziriyama ..../na (kurd tenê hebûn, dîrok girîng e, ev yek derbas bû ew jî mijara şoreşa tirîkî ye. Rizgarbûna kurdan girêdayî rizgarîkirina çînên kedekar ên li Tirkiyeyê ye). Bi vî awayî ramanên xwe nîşan didan, lê mijar ne weke ku wan dida nîşan dan. Mijar ne bi vî rengî bû ku rû dabû û derbas bûbû. Kurdistana parçekirî heye,

civaka Kurdistanî heye û civakeke paşmayî heye ku di bin zordariya serdema paşverûtiyê de maye, ev yek guftûgo li ser nabe.

Ev binçîneya civakî nikarîbû bi şoreşa tirkî re bimeşiya. Divyabû ew li hêviya şoreşa tirkî mabana heta ku biketa rêya rast. Lê ji ber ku ew nêzî doza Kurdistanê nedibûn,  ji ber ku wan şoreşa kurdî nedipejirand, ev yek jî ji pirsgirêkê re nebûne çareyek. Ji ber van hemûyan û heta sala 1975'an tu girêdaneke min bi komên sosyalîzm ên şovînîst û tevgerên çep re, tune bû.

Ramana lidarxistna şoreşeke rast ji çînên kedkar re li Kurdistanê, di serê min de digeriya. Bi vî rengî guftûgoyên min bi hevalên min ên xwendekar re derbas dibû. Kesên ku weke min dihizirîn an jî ji berê de ev raman li gel wan peyda dibû jî hebû. Dema ku ev reman di serê min de bi cih bû, gelek hevalên min bandor li min dikirin. Min pirtûkên Marksî, doza neteweyî … doza neteweyî û doza dagirkeran dixwendin. Ew di mejiyê min de bi cih bû û ez têgiham ku di dema me ya niha de, tevgerên rizgariya neteweyî nûnertiya beşeke ji tevgerên şoreşa cîhanî dikin. Birciwaziyet di roja me ya îro de, nikare pêşengiya tevgerên rizgariya neteweyî bike. Têkoşîna rizgariya neteweyî ne têkoşîneke ji bo birêveçûnê ye, lê ew ji bo rizgarkirina kedkaran e û tê de kedkar têkoşîna xwe ya rizgariya neteweyî bi rê ve bibin. Wê tevger bi vê yekê li pêş bikeve û ev raman di serê min de bi cih bû. Her weha bi hebûna şert û mercên pêwîst, ramana lipêşxistina tevgera serxwebûnê li Kurdistanê, li cem min bi pêş ket. Şahîn Donmez, li

Hacîtepeyê hevalê min ê xwendinê bû. Têkilya min ya yekser bi wî re hebû û me guftûgo dikir. Em di vê mijarê de nêzî hev bûn. Beriya ku ez wî bibînim, Şahîn bi Abdullah Ocalan û komek ji hevalan li ser lipêşxistina parêznameyên nû der barê Kurdistanê de, kar dikir. Di bin navê têkoşîna ji bo serxwebûna Kurdistanê de, tev digeriyan. Min bihîst ku ew van ramanan li pêş dixin, lê nêrîneke min a baş li ser vê yekê tune bû.

Di destpêkê de, têkiliya min bi Şahîn re bû. Piştre min Abdullah Ocalan nas kir û tevlî ku heycangirtî bû jî, lê hizrandina xwe der barê mijarê de, ango nêrîna xwe der barê Kurdistanê de, ji min re şîrove kir.

Ez bi vê yekê aram bûm, min dît ku ramanên min û nêrîna wî weke hev in. Ez gihaştim wê baweriyê ku şert û mercên pêwîst ji bo rizgarkirina kedkaran, di nava tevgera rizgariya neteweyî de, li Kurdistanê , bi awayekî rêxistinkirî heye. Her weha bawriya min bi têkoşînekê ji bo vê yekê hat. Ew yekmîn car bû ku têkilya min bi şepêlekê re çêbû. Ev yek di buhara sala 1975'an de pêk hat. Di wê demê de, ev raman di serê min de bi cih bûbûn. Weke ku min niha jî diyar kir … komek ji hevalan bi rêbertiya Abdullah Ocalan re bi ramanên xwe gihaştibûn encamekê " têkoşîn ji bo serxwebûna Kurdistanê" binçîneya civakî û rewşa çînatî, ev hemû hetibûn çarekirin. Ango beriya min ramanek hatibû bicihkirin, heger weke kom derneketibe jî lê weke raman hebû. Tevgera min yekser bi van hevalan re dest pê nekir; me gelek caran hev du didît, lê di vî warî de ez ne çalak

bûm. Tevgera min di dawiya sala 1975'an de, dest pê kir. Di salên (1975-1976) de min li Enqerayê kar kir.

Di vê demê de, heval Heqî, Kemal, Baqî û gelek mîna wan, ji bo zêdekirina aghaiyan der barê Kurdistanê de, her weha ji bo kirina karên taybet û ji bo bangeşekirinê, li Kurdistanê digeriyan, lê çalakiyên li Kurdistanê hebûn, têrê nedikirin. Her weha têkilî li pêş neketibûn, bi taybet li herêmên Entab û Dêrsimê. Tevgerê li Kurdistanê, li vê herêmê dest pê kir ku hinek hevalan têkoşîn dikir, lê karê min di wê demê de li Kurdistanê tune bû. Min bi rengekî sereke heta nîvê 1977'an li Enqerayê û li herêma ku ez lê bûm, têkoşîn dikir û tevdigeriyam. Ev tevger herî zêde li Hecetepeyê, di nava xwendekar, ciwanên Kurdistanê de bû.Ya me bi hev ve girê dida ramana me ya hevbeş bû. Li gorî vê ramanê diviyabû her hevalek li herêma ku ew lê bû, zanebûna xwe bi kar bîne û hinek pêwîstiyan peyda bike. Ji aliyê aborî ve divyabû ji bo hevalên ku kar dikin û têkoşînê bi rê ve dibin, ew gelek pêwîstiyan peyda bike û alîkariyan dabîn bike. Ango ji bo pêkanîna karê ku tê xwestin, her yekî ji hevalan xwe dispart zanebûna xwe. Ev yek ji karê rêxistinî zêdetir, karekî tekane bû. Em nikarin bibêjin ku yekîtiyeke hizrî bi awayekî zelal û sereke hebû. Ez di sala 1976'an de li Enqerayê bi cih bûm. Di gulana 1976'an de, heger ez ne şaş bim, li Zanîngeha Hacetepeyê xwendekarê şoreşger Fewzî Aslan hate kuştin. Ji bo beşdarbûna merasîma cenazeya wî, ez çûme /Orfa, Sirûcê/ û piştî cenazeyê ez hatim girtin. Ez nêzî mehekê li Amedê girtî mam û paşê ez serbest hatim berdan. Di havîna 1977'an de, ez careke din çûm

Enqerayê. Ez heta kuştina Heqî, li Enqerayê mam û ez bi heman têkoşîna xwe ya berê radibûm. Di pûşbera 1977'an de, min dest ji Enqerayê berda. Bi rengekî baştir di havîna 1977'an, ez tevlî têkoşîna li Kurdisatnê bûm. Ew cara yekem ji destpêka têkoşîna li Kurdistanê bû, ev yek li cihê jidayîkbûna min, Bîngolê bû. Piştre ez li Ruha û Amedê geriyam. Duh we ji hevalên min pirsî; ango têkilya me bi Mêrdîn, Ruha û Amedê re tune bû?. Têkiliyên me sînordar bûn, bi rengekî giştî ew bi alîgirên me yên xwendekar re bûn. Xwendekar jî ne her dem li herêmên xwe diman. Li şûna têkilyên (cihî) xwepêşandan çêdibûn û pir civîn dihatin lidarxistin û em beşdarî wan dibûn. Bi vî şêweyî me bangeşe ji raman xwe re dikir. Ez bawer im ku (dozgerî) diyar dike ku di wê demê de plana bernameyê hazir bû, tu bingeh ji vê yekê re tune ye. Di wê demê de, tu plan ji bo bernameya me tune bû û ramana me bûbû mîna rêgezekê li Kurdistanê. Rewşa herêmê û nêrînên me, bûn rêgez û yekîtiya hizrî bi gelemperî êdî peyda dibû. Heta wê demê ramanên me nehatbûn nivîsîn; ango me bi devokî bangeşe ji wan re dikir. Cara yekem û bi vî awayî ramanên me bûbûn rêgez.

Ji bilî vê jî li gorî xwesteka min û li gorî birêveçûna têkoşînê, ez li herêmên başûrê Kurdisatanê jî mame. Ez beşdarî civînên ku li Wêranşehr, Qiziltepe, Nisêbîn û Ruhayê li dar diktein, dibûm. Ev komcivîn der barê şoreşa Kurdistan, impryalîzm û sosyalîzmê de bûn. Me bixwe û ji bilî me jî ev civîn li dar dixistin, ez jî beşdarî wan dibûm û min nêrînên xwe pêşkêş dikirin. Di vê demê

de, têkoşînên me bi rengekî mezin li ser bingehê îdeolojî û danasînê li pêş diketin.

Ji ber ku têkiliyên me yên rixistinî bi rengekî xurt, tune bûn û derfetên tevgera me kêm bûn, me dest bi tu çalakiyên şer nekiribû. Cara yekem di sala 1977'an de min dest bi belavkirina belavokan kir û ji bo fêmkirina van belavokan min têkoşîn û bangeşe dikirin.

**Dadwer:** We rêziknameyên kîjan partî û welatan, weke bingeh ji bo danîna rêziknameya xwe girte dest?

**Tawanbar:** Partiya proletarya, ango partiya proletarî ya ku dê proletarya welatê me bi rê ve bibe. Bi bingehgirtina îdeolojiya Marksîzm-Lênînî jî, rêya xwegihandina partiya me, diyar dibe. Her weha rêziknameya Bolşevîk di yekîtiya Sovyetê de jî, lê ne heman rêziknameya partiya kedkaran (şexîle) ya vîtnamî ye.

**Dadwer**: Zêdetir nêzî kîjanê ye? Zêdetir sûd ji kîjanê hat girtin?

**Tawanbar**: Nêrînên herduyan der barê mijara rêxistinkirinê de hene. Di Marksîzmê de jî rastî heye û ew ji aliyê Lênîn ve berfireh bûye û li pêş ketiye. Hin bingeh hene divê di dema avakirina partiyekê de, pabendî bi wan bê kirin û ew bikevin çarçoveya mercên wê yên taybet de. Her weha hinek tişt jî lê tên zêdekirin.

Bi vî rengî partî rêziknameyên xwe amade dikin û rêziknameya me jî girêdayî Marksîzmê ye. Rêzikname dibe ku ji (5-10) rûpelan pêk bê, mirov bi rengekî kûrtir binivîse, lê divê ew jî bi kurtasî be.

**Dadwer**: ji bo pêkanîna armancên xwe, hûn çi rêbaza têkoşînê guncaw dibînin?

**Tawanbar**: Ev xal ji aliyê hevalê min ve hatibû zelalkirin, ez jî dikarim bi kurtasî zelal bikim… bi vî rengî … beriya her tiştî em dizanin ku em di civaka Kurdistanê ya paşketî de ne; ya ku di tarîtiya sedsalên navîn de maye. Her weha girîngiya welatê xwe ji bo Rojhilata Navîn nas dikin û em baş armanca emperyalîzmê û hikûmetên girêdayî wê yên ku dek û dolaban li dor Kurdistanê digerînin, nas dikin. Ji ber van em rastiya ku têkoşîna me dê zehmet be, dipejirînin. Dema ku welatê me beriya sedên salan hate dagirkirin, ew bi zorê hate parçekirin û hinek parçe bi hêz, zordarî û rijandina xwînê hatin dagirkirin. Li seranserî dîrokê, ji bo guhartina çarenûsa gel û welat, gelek raperîn çêbûn û ji bo azadiyê gelek destwerdan çêbûn û her dem bi rijandina xwînê hatine têkbirin.

Bi vî şêweyî û bi rijandina xwîna bi milyonan kes, welatê me hate dagirkirin. Ji demeke kevin ve nêzî du hezar sal welatê me nikarîbû xwe ava bike. Lewre ji bo rizgarkirina civakeke paşketî û di tarîtiya sedsalên navîn de dijî ku bi zorê hatiye dagirkirin. Ji bo jinavbirina van hemûyan, pêwîstî bi zorê heye. Me got û em bi vê yekê bawer in ji bo avakirina rêxistineke rast, divê karker û cotkar bingehê wê bin û bi vî rengî wê têkoşîn pêk bê. Her wisa ji bo avakirina enyekê, divê hemû hêzên ku welatê me doza serxwebûn û demokrsiyê dikin, li hev bikin û em bawer in ku avakirina artêşeke gelêrî pêwîst e.

Tenê bi vî şêweyî dibe ku ji aliyekî ve yekîtiya gel a neteweyî û ji bo sazkirina eniyaa gel. Ji aliyekî din ve sazkirina artêşa gel û lidarxistina cenga gelêrî ya demdirêj. Tenê bi vî rengî em bawer in ku gelê me dê azad bibe. Ev nêrîna me ye bi kurtasî.

Dadwer /nivîskarê dadwer/

/endamên dadgehê/ serokê dadgehê

Beriya darzandina heval Mihemed Xeyrî Dormûş wî nameyek ji malbata xwe re rê kirbû û ji ber ku Heval Xeyrî, zana, mamoste û birêveber bû ji me re û ji ber girîngiya vê nameyê ji kesayeta wî ya şoreşgerî ku xwedî şêweyên fermandarîyê ye, me pêwîstî bi belavkirina vê nameyê dît.

Bavê min … dêya min, xwişk û birayên min, hemû xizm û cîranên min:

Weke ku li hemû cîhanê rû dide û ji ber ku ez kesayetek im ku erkan nas dike û hestê berpirsyariyê li cem min heye, ez tevlî têkoşîna ji bo serxwebûna welatê xwe û rizgarkirina gelê xwe bûm. Min di salên (1973-1979) têkoşîna pratîkî kir. Di oparasyona ku ji aliyê polîs û leşkerên tirk ve hatibû plankirin di 3'yê mijdara sala 1979'an ez hatim girtin. Anha ez li Zindana Amedê ya leşkerî me; di nava bi sedan ji hevalên xwe yên welatparêz û demokrat de me.

Ez dengê xwe ji zindanan dighînim we, lê divê ev yek we bê hêvî neke. Hinekî aram bin û ji bo pêşerojê geşbîn bin. Ji beriya çend mehan ve, ev cara yekê ye ku ez nameyekê ji we re rê dikim, ne ji ber bêrîkirinê ye, vê yekê guman nekin. Ez vê yekê di destpêka nameya xwe de ji we re zelal dikim; heger ez tengav bim û zehmetiyan bikşînim, ev yek ji ber rewşa welat û gelê min e.

Ez ji ber we tu zehmetî û êşa bêrîkirina we, nakêşim. Lê hûn ne wilo ne, hûn tevlihev in. ez ê ji we re diyar bikim ku dê çawa di hin rewşan de tevbigerin, ji ber vê min giringî bi vê nameyê dît.

Çawa û kengê ez tevlî têkoşînê bûm, ez şîrovekirna wê dirêj nakim. Baş tê bîra min dema ku em bi hev re bûn, min ev yek baş ji we re şîrove kir. Heger hin tişt hebin ku hûn tê negihabin, wê piştre hevalên min bi pratîkî, we û hemû gelê me fêrî her tiştî bikin û rêya we ronî bikin. Ez dixwazim bibêjim ku tevlêbûna min ji têkoşînê re, ji bo welat û gelê min bû û ji bo mirovahiyê bû. Tevlêbûna min ji têkoşînê re, ne bi zorê yan bi xapandinê bû, lê ji ber têgihiştina min bû ku ev berpirsyariyeke dikeve ser milê min. Di vê yekê de, divê guman li cem we tune bin. Ji bo serxwebûna welat û rizgarkirina gelê xwe, ez heft salan bi karê pratîkî rabûm. Dibe ku ji bo we demeke dijrê be, lê li gor siyasemedarekî ku jiyana xwe gorî gelê xwe û mirovahiyê kiriye, ew beşek ji demê ye û derbas dibe.

Di nava têkoşîna şoreşgerî de û ji rojên destpêkê ji tevlêbûna min, ez tê gihaştim ku serxwebûna gel û dewletan di çend meh û salan de pêk nayê. Her weha min di rêya têkoşînê re, nas kir ku serxwebûna welatekî mîna Kurdistanê û bidestxistina xweşiyê ji bo gelê wî, demek pir dirêj dixwaze. Ji ber van sedeman û mîna hemû hevalên xwe, ez di têkoşînê de kûr bûm û min xwest ku hemû salên xwe yên mayî di nava têkoşînê de derbas bikim. Lê ez hatim girtin û ji têkoşînê dûr ketim û ev yek min diêşîne! Lê pelixandina gel û hevalên min di bin lingên leşkerên tirk de, kîn û hêrsa min zêdetir dike. Dema ez dibihîzim an dibînim ku di bin işkenceya leşkerên tirk de, tên kuştin. Rûmet û girêdana min a bi şoreşê re, baweriya min xurttir dikin. Ez ê bi hemû hêza

xwe di têkoşînê de berdewam bim, heta ku ez di zindanê de bim jî ez ji heval û berjewendiyên gelê xwe cuda nabim. Di heyama heft salên borî de, min hemû karînên xwe di rajeya gelê xwe de bi kar anîn. Min di rêya gera xwe ya li parçeyên Kurdistanê bi hevalên xwe re pirsgirêkên gelê xwe li gorî rastiyê nas kirin. Her weha min ji bo têgihiştina ciwan û rewşenbîrên welat ji zehmetiyên gel re, kar kir.

Ez ê li gorî zanîna xwe, ji we re şîrove bikim ku çima gelê me paşketî maye, êş û zehmetiyan dikşîne û rastî komkujîyan tê. Çima dewlemendiyên wî hatin talan û wêrankirin. Çima ziman û çanda me şaş hatin bikaranîn û kesayeta gel winda bû û ew birçî ma û sedemên koçberkirina wî ji Istenbol, Edene û Intakiyayê ji bo ku wan weke kole bi kar bînin.

Berpirsê yekem ê van êşan dagirkeriya Tirkiyeyê û kurdên xayîn ên girêdayî wê ne (axa, beg, komprador û maldar). Ez vê yekê ji gelê xwe re radighînim. Bi angeşekirin û sorkirinê erk bi dawî nayê. Her weha bi vî rengî welat û gel jî rizgar nabin. Ev tişt, li tu derên cîhanê çênabe. Ji bo bidestxistina serxwebûn û azadiyê, divê yekîtiya gel pêk bê û şerê xayîn û dijminan bê kirin. Lê eniya gelekî şerker dê çawa li ber xwe bide? Divê em bersiva van pirsan bidin. Gel, bixwe heye? Her yek ji me dizane ku gelê me lawaz û lipaşketî ye. Ji ber wê jî nikare xwe birêxistin bike û eniyekê çêke.

Ev yek li tu derên cîhanê nayê dîtin. Rewşenbîrên welatparêz û şoreşger ên ku di nava van gelên bindest û

dagirkirî de çêdibin, bi fedekariyên mezin gel birêxistin dikin û ji bo avakirina eniyeke şer, kar dikin. Ev yek li Vietnam, Angola û Filestînê pêk hatiye û li her derê pêk tê.

Weke mirov û takekes ku di wateya berpirsyariyê de têgihştî ye, ez jî vê baweriyê dipejirînim, ji ber vê yekê min bi hevalên xwe re dest bi têkoşîn û rêxistinkirina ciwan, gundî û karkeran kir. Bi rengekî giştî, me welatparêzên Kurdistanî tev li têkoşînê kirin, min her tişt xiste xizmeta têkoşînê. Ez jî weke hemû hevalên xwe derbasî warê pratîkê bûm, heta ku wê çawa gelê Kurdistanê azad bibe û em ê çawa bikaribin eniyên şer li welat ava bikin? Gelo me ev yek fam kiribû heta ku em bi gel bidin fam kirin. Di destpêkê de, em grûpeke biçûk ji gel bûn, tu kesî girîngî, nedida me û me cidî nedigirtin. Hin grûpên şoreşger ên sexte hebûn, hewl didan ku me reş bikin lê nedikarîbûn, ji ber ku em li ser rastiyê bûn û îdeolojiya me ya têkoşînê bû, ne ji bo berjewendiyên kesayetî bû. Me bi rengekî fedayî têkoşîn dikir, ji ber vê yekê, di demeke kurt de, li gelek herêmên Kurdistanê ciwanên şoreşger û welatparêz li me kom bûn. Gelê me bi me re bû alîkar û ji her aliyî ve tevlê bûn ji ciwan, gundî û karkeran çêbû û tev li çalakiyên pratîkî bûn. Di wê demê de, dewleta Tirkiyeyê ya dagirker ji ber pêşketina tevgera me, şaşwaz bûbû. Me êriş bir ser faşîstan, axan, rêxistinên sîxur, diz, xayin û peyên axan ên ku hewl didan me tune bikin, lê me hin ji axan û faşîstan tune kirin û hin ji wan jî ji Kurdistanê reviyan. Di têkoşînê de, helbet windayî jî çêdibe, hin hevalên me

yên mîna heval ( Heqî Qerar, Xelîl Tişaxor ) û gelek ji alîgir û hevalên me jî şehîd ketin. tevî wilo jî me têkoşîna xwe berdewam kir û ranewstand.

Lê windahiyên dewleta Tirk û sîxurên wê zêdetir bûn. Me li herêma Hilwanê gelek xayin kuştin û hinan ji wan jî xwe radestî me kir. Di encamê de, baweriya gelê me bi têkoşîna me hat û bi hejmarên mezin tevlî nava tevgera me bûn. Me gelek serkeftin bi dest xistin û me gelek herêm xist bin kontrola xwe. Herêmên ku ketin destên me ev bûn (Hilwan, Cîlan Pinar, Batman, Dêrik, Qiziltepe û Sirûc) tevî gelek gund û herêman, şaredariyên van herêman bi temamî ketin destên me. Tevgera me gavên pir mezin avêtin, bi taybetî li herêma Toncayî (Dêrsim), Bîngol û Entabê.

Di sala 1978'an de û bi berdewamiya wê ji gelê me re bû weke mizgîniyekê, ji ber ku Partiya Karkerên Kurdistanê PKK di vê dîrokê de hat damezrandin. Damezirandina Partiya Karkerên Kurdistanê û têkoşîna bênaber a ku wê serxwebûnê ji welatê me re û azadiyê ji gelê me re bîne, dijminê me gelekî tirsand. Nemaze piştî ku hemû hewldanên sîxur û faşîstan ji têkbirina me ya ku neçû serî , dijmin yekser bi artêşa xwe li himberî tevgera me û gel derket. Wekî salên destpêka 1979'an, dijmin dest bi cezayên neyasayî kir û armanc jê ew bû ku agirê têkoşîna ramanên serxwebûn û azadiya gelê me vemirîne. Kurd û Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) vemirîne, lê agirê têkoşînê yê ku li seranserî Kurdistanê vêketibû, artêşa Tirk nedikarîbû vemirîne. Tevî ku dewleta Tirk sizayên giran di dadgehan de li kesên şoreşger dibirîn, lê

vê yekê têkoşîna PKK'ê ranewestand. Me şehadet da ber çavên xwe û me şerê polîs, leşker û xayînan kir.

Tevî hemû zor û zehmetiyan, gelê me, li derdora me kom dibû, me diparast û bi me re dikete warê pratîkê de. Bi domana demê re, artêşa Tirk bi hemû hêza xwe êrişî gelê me kir ku bi deh hezarên leşkeran dest bi operesonên li dijî gelê me kir. Bi girtin û êrişkirina malên gel, ev êriş li herêmên (Hilwan, Siyork, Batman, Qiziltepe, Dêrik û Cîlan Pinar) pêk hat.

Jin, mêr û zarok hemû di bin işkenceya dewleta Tirk re derbas bûn û sosret (kuştar ) pêk anî û hin ciwanên tevgera me şehîd xistin. Mîna: Salih Kendal, Cuma Tak, Ehmed Kurt, Metîn Toroxos, Aytekîn Toxloq û Edîb Solemaz. Bi sedan ji hevalên me kirin zindanan û işkenceyên herî hovane li hevalên me kirin. Ev yek di salên 1979-1980'î de derbas bû ku bi sedan heval û gelê me kirin zindanan û ez jî yek ji wan bûm.

Heta sala 1980'î hejmarên mezin ji hevalên me yên ku di asta rêveberiyê de dixebitîn şehîd bûn û dîl hatin girtin. Lê her carê gel li derdora me kom dibû û hêz dida me. Tevî hemû êriş û işkenceya bi serê me û gelê me de dihat, me têkoşîna xwe berdewam dikir û dijmin nedikarîbû me tune bike .

Piştî ku desthilatdarî ket destê artêşê, êrişên pir mezin anî ser PKK'ê û gelê me, çekên giran ji tank, helîkopter û hêzên komando li hemû derê belav bûn û dest bi operesyonan kirin. Kiryarên herî xirab pêk anîn, bi koman ji gel dikuştin. Bi taybetî li herêmên wekî (Siyork,

Qiziltepe, Dêrik, Dêrsim û Nisibînê). Di wê demê de şervanê qehreman (Delîl Doxan) ê ku bawerîya xwe bi gelê xwe û hevalên xwe; piştî dorpêçkirina wî şehîd ket. Qiziltepe bombebaran bû û di encama wê de gelek heval, gundî û welatparêzan ên ku her tişt bexşî têkoşînê kirin, şehîd ketin. Hevalên me yên li dadgehê hatin darizandin, cezayên bidarvekirinê li wan birîn mîna heval ( Orhan Aydîn ) û hevalên me yê dîtir. Di zindanan de, dijmin hemû şêwazên xerab û hov bi hevalên me re bi kar anîn. Dewleta faşîst a Tirk di xwînrijandina gelê Kurdistanî de ranewestiya.

Gel işkence dikirin û çi kesê ku dewletê ew digirtin cezayê herî giran li wan dibirî. Rast e me gelek bedelên giran dan, lê artêşa Tirk û sîxurên wê yên wekî axa û began nedikarîbûn têkoşîna me û rihê berxwedaniya gel têk bibin, û wê bi têkoşîna PKK'ê gelê me azad bibe. Di têkoşînê de, ez jî weke hevalên xwe ji hêla dewletê ve hatim şopandin û girtin û ji ber ku dewletê tişt li ser min isbat nedikir, her çiqas işkence dikirin, min xebata partiyê ji wan re nedida diyarkirin. Lê piştî ku belge li ser min isbat kirin, min nema dikarîbû ji dewletê veşêrim û min xwest ez layiqê partiyê bim. Min armanca partiyê bi dijmin da naskirin û berxwedaniya gel, bi dijmin da diyarkirin.

Salek di ser girtina min re derbas bû, dijmin şêwazên herî xirab û hovane di zindanê de li hember min û hevalên min dimeşand, lê tevî hemî zordariya dijmin, me li ber xwe dida û em hemî heval giyanek bûn û me hêz dida hev.

Ez bê hedan li hêviya we me, ji ber ku darizandina me dê bi dawî bibe, çimku di demên nêzîk de dest bi darizandina bê kirin û ez dizanim bê hûn çiqasî ji me ditirsin û hûn zêde min nas nakin. Ez  di deryaya PKK'ê de, dilopeke avê me.

Artêşa Tirk bi rengekî rojane gundan topbaran dike û sosretan dike û tevî cezayên bidarvekirinê, cezayên ji 30 heta 40 salî li girtiyan dibire. Bi kurtayî ez dikarim bibêjim ku artêşa Tirk bi hovetî kuştin dikir.

Pêwîst e em di hin tiştên din de bihizirin; pêwîst e em hemû wisa bihizirin. Tevî hemû mercên dijwar di roja me de, divê em berdewam bigihêjin rêya rizgariya rast û em girî û gazinan rawestînin û dijminê xwe ji hevalê  xwe nas bikin, da em bigihêjin çareseriyekê. Ez kur, bira û mirovê we me û di demeke nêzîk de, dikarim agahiyan ji we re rê bikim, lê ez bi tena xwe nikarim her tiştî bikim. Hûn perçeyek ji gelê Kurdistanê ne û di pêşeroja xwe de bihizirin û heta ku em bi hev re tevlî têkoşînê bibin û berxwedaniyê li dijî dijmin bikin, ev ya herî rast e ku em bighêjin rêya rizgariyê, hemû hevalên din û gel rizgar bikin.

Di darizandina min a ku nêz bûye de, ez ê weke hemû hevalên xwe helwestên dirust bidim nîşandan. Ez ê hemî kiryarên dijmin ên sexte û kurdên xayîn bidim diyarkirin. Ew kiryarên ku ji sedên salan ve li dijî gelê me dan meşandin, welatê me Kurdistan talan kirine û kuştin û işkenceya ku di zindanê de dikirin û kesên bê guneh dikuştin. Di dawiyê de, ez ê diyar bikim ku berpirsê

kuştin û talankirina ku di welatê me de çêdibe, dewleta Tirk e. Ez ê xayînan ji ber kiriyarên wan ên xirab rezîl bikim û di dawiyê de ez ê diyar bikim ku tu sûcê min tune ye û ne gunehkar im. Tiştê ku min kir erkê min bû, ji dîrokê ve ji min dihat xwestin û yên sûcdar dewleta Tirk û kesên xayîn in. Piştre êdî nema xema min e ku dewleta Tirk cezayên giran li min bibire; heta ku cezaya bidarvekirinê be jî. Ya girîng ji min re ew e ku ez li ser rêgez û nirxên partiyê bimînim û ez pê li nirxên xwe nekim. Jixwe dijmin vê yekê xweş dizane. Bi taybet darizandina me nêz dibe, ji bo vê yekê dijmin hewl dide ku sîxurên xwe bixe dewrê û bi aqilê malbatên girtiyan bilîze û wan bixe bin bandora xwe. Ya din jî parêzger û kesayetên beradayî ên bê sinc hene, wê hewl bidin ku we qezenc bikin û we bidin bawerkirin. Hûn ji van kesan bawer nekin û bibêjin tu derdê me tune ye. Ji bo ku hûn xwe ji van kesayetên sexte xelas bikin. Du armanc ji vê yekê re hene, ji bo ku hûn xwe jê biparêzin, ya yekê wê ji nezanî û hestyariya we sûdê bigirin ku wê dravan ji we bixwazin.

Wê sozên derew didin, ji bo ku bi hêsanî we bixin bin kontrola xwe û we dûrî rastiya we bixin.


Ya duyemîn: Dewleta Tirk hewl dide ku min û bi sedan ji hevalên min bê bawerî bikin, me ji xwe re bikin ajan û sozên derew bidin me, lê pejirandina du tiştên ku ji me dixwazin ne pêkan e û em ê wan nepejirînin. Heger ya yekê em poşmaniya xwe ji dewletê re bidin nîşandan, wê cezaya min a herî giran be. Ya duyem: Ji bo ku ez nebim xayîn û dijminê gel û hevalên xwe, ez ê

poşmaniyê nedim nîşandan û nebim ajanê dewletê. Ji ber ku hebûna min bi hebûna hevalên min ve girêdayî ye. Ez parçeyek ji gel im, temenê ku ji Xeyrî re maye wê di têkoşînê de derbas bike. Heger Xeyrî bibe xayîn heqê wî dibe pênc qurûş (drav ) û ez dizanim ku hûn jî vê yekê ji bo min naxwazin, ji ber ku ji berê de, malbata min jî xiyanet nekiriye û ez ê jî vê yekê nekim.

Ez kesayeteke siyasî me, min daye ser vê dozê, ez ê têkoşînê berdewam bikim û bi qasî serê derziyê, ez ê ji dijmin re poşmaniyê nedim nîşandan û li ser vê rêya rast a Partiya Karkerên Kurdistanê PKKê, ez bang li we hemûyan dikim ku tevlê bibin û têkoşînê bikin.


Di dawiyê de silav û rêzên min ji bo we ...

Kur, heval û xizmê we ( Xeyrî ).




**Heval Kemal Pîr, Endamê Komîteya Navendî Ya Partiya Karkerê Kurdistanê (PKK)**

**Heval Kemal, Hevalekî Navnetweîyî bû mirovekî tirk û ji Çîna proletariyê bû.**



**Kemal Pîr**



**Kemal Pîr di Dadgeha Faşîzmê de ye**

Dadwer di roja (30.4.1981) zayînê de hejmara biryarê (274 -356-1981)  doznameya zêde di roja 18.04.1981) de, (hejmara biryarê (276- 358 -1981)

Ev biryar ji hêla dozgerê giştî yê leşkerî ve hat xwendin; (her weha doznameya zêde jî ji hêla  dozgerê giştî yê leşkerî ve hat xwendin.

**Dadwer**:  Lêpirsîna tawanbaran  berdewam kir.

Navê "Kema Pîr" ji hêla dadwer ve hat xwendin û dest bi lêpirsîna wî hat kirin.

**Dadwer**: Tu endamekî ji endamên" Rêxistina Partiya Karkerên Kurdistanê " yî Her weha tu endamekî çalak di herêmê de. bû.

Di roja 04.08.1978 tu di kuştina Îsa Abacî de beşdar bûyî.

Di roja 15.08.1978 tu di bûyera kuştina Mihemd Akyûz û birîndarkirina kurê wî de beşdar bûyî.

Di roja 12.08.1978  tu di kuştina endmanek ji endamên ewlehiyê yê bi navê Ekrem Culkin de beşdar bûyî.

Di roja 25.09.1978 de, tu di bûyera kuştina Fehmî Kasar Uxlî beşdar bûyî. Her weha te berxwedan li hemberî endamên ewlehiyê kiriye û te hewl daye ku tu yekî

bikujî. Divê tawanbar mîkrifonê bixwe rast bike. (tawanbar li ber mîkrîfonê ye).

**Kemal**: Di doznameyê de, tê gotin ku ez endamekî Komîteya Navendî ya PKK`ê me, ji ber vê yekê divê ku ez bersiva kesên wisa dibêjin bidim.

**Dadwer**: Ev tiştekî normal e, jixwe mebesta me ev e (Endamê Komîteya Navendî) di herêmê de ye. Bi dengekî bilind biaxive ji bo hevalên te guhdar bikin.

**Kemal**: Dozname li gel hevalekî ye. Ger pêkan be, ez wê doznameyê dixwazim ji bo ez hin xalan zelal bikim.

(Ew dozname dan tawanbar)

Hûn dikarin min di tevgera (PKK) de, wekî endamekî normal rêz bikin; bi rengekî normal, ez ne endamekî damezrînerê rêxistinê bûm, ji ber di wê demê de ez di girtîgehê de bûm, min dixwest ez yek ji kesên damezrînerên partiyê bûma û Endamê Komîteya Navendî bûma, lê mixabin ez ji hêla partiyê ve nehatibûm erkdarkirin heta ku bibim yek ji kesên damezrîner. Lê îdeolojî û nêrînên min weke îdeolojî û nêrîna siyasî ya partiyê bûn.

Çawa û ji bo çi ez tev li vê tevgerê û beşê siyasî bûm? Gelo ma kedeke min di vê lehiya siyasî de heye? Di ber vê yekê de, îdeolojiyeke min heye? Ez dixwazim vê xalê diyar bikim heta ku li hember dîrokê zelal be ku ev doz ne tiştekî hindik e. Dizanim ku ev darizandin wê dîrokî be, tevî ku wê darizandineke mafdarî be lê wê dîrokî be jî. Ez girîngiya wê di dîrokê de baş dizanim. Weke min di destpêkê de jî da diyarkirin ku ez bi girîngiya wê ya dîrokî bawer im.

Erkê mirov e ku rastiyan li pêşiya dîrokê diyar bike. Ez bixwe dixwazim her tiştê girêdayî kesayeta min li pêşiya dîrokê bidim diyarkirin û awayê tevlêbûna xwe di nav partiya  PKK'ê de jî diyar bikim.

Ez di nava malbeteke xizan û belengaz de hatime dinê. Di 12'yê adara 1971'ê Z de, şoreşger li Tirkiyeyê dihatin kuştin û bidarvekirin û êrişên dijwar li ser gel çêdibûn. Ez di wan salan de, xwendekar bûm û ji bo sedema vê rewşê, ketim lêgerînê. Min bala xwe dayê ku wekhevî tune ye...

Çîna karkeran di bin sitemkarî û çewisandinê de mabû. Gelek cudahî di navbera xizanên ku di xaniyên xerabe wekî xaniyên mirîşkan de dijîn û kesên borciwazî ên ku di koşk û qunaxan de dijyan, hebûn. Ev çîn û cudahî li ber çavan dihat xuyakirin. Rewşa cotkarê reben pir diyar bû. Her wisa xwînrij jî diyar bûn, lê li kêleka vê; tevgera rizgariya gelan jî zelal bû û li hemû deverên cîhanê tevgrên sosyalîst, girîngiyeke wê ya mezin hebû.

Di sala 1972'yan de, tevgerên şoreşger, tevgerên ciwanên şoreşger û tevgerên rizgariyê yên di cîhanê de, hiştin ku ez bikevim nava lêgerîn û analîzê de. Dema ku min analîz û lêgerîn dikirin, rastî baş li ber çavên min xuya bûn û ez ber bi Marksîzmê ve çûm.

Min bawerî bi Marksîzmê anî ku ew rêya tekane û rasteqînî ye. Her weha ew sîstemeke bi hizrê re li hev tê. Sîstema sosyalîzmê, wê gelên bindest rizgar bike û her weha wê dawiyê li nijadperstî û bêdadiyê bîne.

Ez fêr bûm ku Emperyalîzm bingehê newekheviyê ye, ji ber vê yekê ez bûm Marksî. Min bawerî bi Marksîzmê anî, lewre ez bûm kesekî sosyalîst. Ji bo min naskirina jiyanê û cîhanê ne bes e, divê mirov şêwazê jiyanê û cîhanê biguhere. Loma, pêwîstî bi kar û têkoşîneke berdewam heye. Mîna mirovekî ku jiyan û cîhan nas kiriye li gel min baweriyeke xurt çêbû ku divê ez beşdarî têkoşînê bibim; lewre ez beşdar bûm.

**Dadwer**: Kemal, guherîn çi ye; ev guherîna cîhanê ya ku hûn dabaşa wê dikin?!

**Kemal**: Di cîhanê de, newekhevî heye û jêdera vê newekheviyê ji sîstema Kapîtalîstê tê. Qonaxa herî jor a Kapîtalîstê, Emperyalîzm e.

Ji ber vê yekê min biryar da ku ez şerê Emperyalîzmê bikim û têkoşînê ji bo sosyalîzmê bikim.

**Dadwer**: Mebesta te ew e ku Sosyalîzm dewsa Kapîtalîzmê bigire?

**Tawanbar**: Erê, divê Sosyalîzm, Kapîtalîzmê têk bibe û serweriya xwe li hemû deveran bike. Di van rewşan de, ev guherîn ne hêsan e. Ji bo ku mirovên normal baweriyê bi vê hizrê bikin û bigihêjinê hêsan e. Weke em dizanin her sîstemek ji bo parastina xwe, gelek dezgeh û sazî ava kirine. Êdî hebûna xwedarizandin, siza, hêzên çekdar, hêzên polîsê û hêza artêşê ew ji bo parastina rêjîmê yan ji bo parastina dewletê û xizmeta wê ye. Ev sazî yan rêxistin rê nadin guherînê û ji ber ku ew rê nadin guherînê, ew sîstemên parastina rêjîmê bixwe ne...

Divê dewlet hilweşe ev tişta ku ez li ser dihizirim û armanca min e. Ji bo ku tu sîstemekê bi cih bikî, divê tu têkoşînê li hember sîstema kevin bidî meşandin (Marksîzm wisa dibêje). Armanc, ketina dewletê ye û divê li ser kavilên wê dewleteke nû bê avakirin. Di vê demê de ez bawer bûm bi ketina dewleta Tirkiye. Ji ber ku çîna desthilatdar çîneke Kapîtalîst e. Her weha sîstema wê sîstemeke Kapîtalîst e û girêdayî Emperyalîzma cîhanî ye. Ev karîgereke yan faktorek ji yên bibandor li min kirin, ên ku kesayeteke şoreşger ji min afirandin. Binkeyên Emperyalîzmê li ser xaka Tirkiyê (Încirlîk, Edena, Sînob) hene. Her weha binkeyên NATO yan Koalîsyona Bakurê Atlantic hene …hwd

Tevî ku ez mirovekî têgihiştî bûm, azadîxwaz û bi dagirkeran ve ne girêdayî me, vê şepêlê bandor li hestên

min ên neteweyî dikir. Emperyalîzm berhemên xwezayî yên welatê me talan dike. Her weha ji bo budceya me têk bibe, tiştên çêkirî difroşin me û girîngiyê dide tiştên çêkirî. Ji ber ku zanist û teknîk negihaye asta ku tê xwestin. Ji siyasetên Emperyalîzmê, koçkirina kesên zana û afrîner ber bi Rajavayê de ye. Ji ber vê yekê, gel paşverû û xizan ma û welat jî di tarîtiya paşverûtiyê dimîne.

Çawa wê gel rizgar û azad bibe û wê çawa welat bi pêş bikeve û Emperyalîzim van tiştan tevan dike?! Ev karîgerek bû ji karîgerên ku hişt, ez ber rêya şoreşgeriyê ve biçim. Hezkirina welat hişt ez bibim mirovekî şoreşger. Rêjîma Tirkiyeyê rêjîmeke Kapîtalîst e. Ew bi siyaseta Emperyalîzmê ve girêdayî ye û ew destek û piştevaniyê dide avakirina vê sîstemê li Tirkiyayê. Desthilatên li Tirkiyayê serwer in ji çîna borciwaziyê ne û borciwaz in. Ji her çînekê re taybetiyên wê yên xweser hene. Bêguman çi mirovê ku baweriyê bi armancekê tîne bandora çîna wî lê heye. Bi giştî rewş wisa ye; her sîstemek peyrewên çînekê ye û çînên din girêdayî sîstemê ne. Ya li pey vê  ji min dihat xwestin ku ez li dijî çîna birciwaziyan rawestim û ez sîstem û armancên wan têk bibim, ji ber vê yekê û ji bo pêkanîna vê armancê, ez li tevgera dijî çîna borciwaziyan digeriyam. Li Tirkiyayê Tevgera Şoreşgeran, Tevgera Sosyalîstan û li Kurdistanê tevgera Rizgarkirina Niştimanî hebûn. Di sala 1974'an de, Tevgera Şoreşgeran ji hev xistibûn. Endamên ku ji zindanê derketibûn nikarîbûn tevgerê bi rê ve bibin. Di nava tevgerê de, gelek parçetî hebû. Vê tevgerê nûnertiya

yekîtiyê nedikir; berovajî wê ber bi parçebûn û cudabûnê ve diçû. Di hundirê Tirkiyê de, bi rengekî ji rengan peywira kombûnê qezenc dikir. Tevger an rêxistina bi navê (PKK) tê nasîn di sala 1972'an derket holê. Ew ji bilî ku rêxistineke, ew lehiyeke siysî û îdeolojîk bû. Peywira wê kombûn û yekîtî bû, li ser dema dirêj (pêşeroj) tiştek tenê hebû û ew jî serkeftin bû û anha ew serkefin li ber çavên min in. Ez di wê baweriyê de me ku wê ev tevger rojekê ji rojan bighê desthilatê. Ez endamekî ji tevgera wê me, her weha ez endamekî Komeleya Çandê ya Perwerdeya Bilind a Demokratîk bûm. Cihê wê li Enqerayê bû û min bi berdewamî lê dewam dikir. Min li komeleyê Abdullah Ocelan nas kir (min ew di rêya Komeleyê re, nas kir). Di nîgarkirina teşeyê wê yê îdeolojîk de, ez beşdar nebûm; ji ber ku gava ez giham komeleyê teşeyê xwe yê îdeolojîk standibû. Ez tev li vê tevgerê bûm û min sedemên tevlêbûna xwe ji wan re diyar kirin (ji ber ku ew li dijî dewletê bûn û ez jî li dijî wê bûm).

Ji ber ku dewlet borciwazî ye û yên wê bi rê ve dibin ew jî borciwazî ne, me dixwest em dewletê hilweşînin. Ji ber vê yekê ez tev li tevgereke wisa bûm. Beriya wê min bi hûrbînî lê temaşe kir; gelo sosyalîst e yan na, komunîst an an, neteweyî ye yan na? Ez li dijî netewperestiyê me, ger ev tevger, tevgereke neteweyî ba yan ji bilî kurdan ba jî ez tevlê nedbûm(li çi deverê ba) û ez ê li dijî wê bama. Di sala 1974'an ez tevlî PKK'ê nebûbûm, lê min di wê demê de, ew nas kiribû.

Di wê demê de, min nû endam û nûnerên wê nas kirin û guftûgoyên me hebûn. Min dixwest ez tevlê bibim. Weke ku di îfadeyê de hat. Gava ez tevlî tevgerê bûm, hîn nebûbû partî. Ew tevgereke siyasî û îdîyolojîk bû û hîn pêwîstiya wê bi rêxistinkirinê hebû.

**Dadwer**: We çawa guftûgo dikir??

**Kemal**: Weke beriya niha hat gotin, gotûbêj der barê dagirkeriya tirkan ji kurdan re bû. (Ev bixwe şaştiyeke; ew dijî Marksîzmê ye). Li Kurdistanê civakeke heye, me dixwest (min û hevalên xwe) em Marksîzmê lê bi cih bikin. Me guftûgo dikir û min got ger Marksîzm ji bo gelan rêya felatê ye, ji bo kurdan jî wisa ye. Ne tenê ji bo kurdan, lê belê ji bo civaka Kurdistanê bi tevahî.

Di wê demê de, li cîhanê dengê tevgera rizgariya gelan bilind dibû. Mîna: Şoreşa Vietnam, Kembodya û Lawsê. Tiştên ku li cîhanê rû dane û tevgerên rizariyê tiştin ku em li dijî Emperyalîzmê rawestin. Her weha van rûdanan hişt ku em gelek guftûgayan derbarê dijîtî û şerkirina li dijî Emperyalîzmê bikin.

Di Rojhilata Navîn de, gelek gel (kurd, tirk, faris, ereb) di nava hev de, dijîn. Di Rojhilata Navîn de, Emperyalîzm piştgirtiya Kapîtalîzmê dike, lewra pêwîstî bi tunekirin û qewtandina wê heye. Her weha li Ewropayê jî derfeta têkbirina wê heye.

Rojhilat cihê petrol û hêza mirovî ye. Li ser vê yekê, nexşeya Rojhilatê ji aliyê Emperyalîzm û hevbendên wê (birciwaz, derebegî, canbaz) hatiye nîgarkirin. Ev

nexşeyeke siyasî ye, ji ber ku ji hêla wan ve hatiye nîgarkirin, em wê napejirînin û em ê li dijî wê derkevin. Em bi nexşeya ku gel bixwe çêbike re ne.

Gava em li gelên cîhanê dinêrin em dibînin ku bi vîna xwe nexşe û jiyana xwe li gor xwe xêz dikin. Ev dide diyarkirin ku guherîna vê nexşeyê pêkan e û mînakên wê li cîhanê tên dîtin; Efrîka, Rohilatê Başûrê Asyayê. Her weha ev guherîn li van deveran berdewam e.

Dema em Emperyalîzmê û mijara wê ya giştî û çawaniya şerê wê nîqaş dikin, mijara "civaka kurd" derdikeve holê. Gava ez hatim zanîngehê min tiştek li ser kurdan û doza kurdî, nas nedikir. Di salên zanîngehê de, min dît ku ew bi kurdî diaxivin û dibêjin:" Em kurd in…" Ew bi tirkî naaxivin.  Min hewl dida ku ez çareyên pirsgirêkên Tirkiyeyê nas bikm. Ji bo naskirina van mijaran û pirsgirêkên heyî, pêwîstî bi naskirina rewşa abûrî, siyasî, pirsgirêkên heyî û rewşa Tirkiyeyê hebû.  Ji ber vê yekê, min kurd û Kurdistan nas kirin. Di lêkolîna xwe de, min dît ku Kapîtalîzm derbasî nava civaka wê bûye û di nava civaka wê de, çîna biroletariyayê heye. Ew weke gel rastî keysbaziyê hatiye.  Civaka ku Kapîtalîzm bi rengekî beşî derbasî wê bûbe, şerê çînîtiyê tê de hebe, çîna birciwazî weke çîneke yan çîna nûjen lê hebe, dêmek ev gel e. Em dikarin navê gel an neteweyê lê bikin. Dêmek ji Kurdistanê re pêkhatineke dîrokî heye û ji bo naskirina Kurdistanê pêwîstî bi naskirina kurdan jî heye. Ji ber vê yekê li gor derfetên xwe min dîroka kurdan nas kir. Di sala 1976 `an de min biryara xwe ya dawî da û tevlî PKK`ê bûm. Beriya wê di sala 1974`an

de, di çarçoveya gotûbêjan de bû, lê di sala 1976`an ez tevlî tevgerê bûm.

**Dadwer**: Peywira yekem a ku spartin te çi bû û tu bi çi rabû?

**Kemal:** Kesên ev peytandin nivîsîne, ew ne li gor rêzkirineke mentiqî nivîsîne; ew li gor rêzkirina xwe nivîsîne. Ji ber vê yekê ew di rêzkirinê de, ketine şaştiyê de.

**Dadwer**: Pela peytandinê (îdîaê) li ber te ye û divê tu bersivê bidî!

Tu têkiliya me bi rêzkirina lojîk, yan tiştên mîna wê re tune ye. Encumana dadgehê hin bersivan ji te dixwaze û divê tu bersivê bidî. Tiştan li nav hev nexe ( rêzkirin, pirsgirêk) û tiştên tu naxwazî, bersivê nede.

**Kemal:** Min berê bersiv daye, navê min di nava kesên ku partî damezirandine de, heye û pê têm tewabarkirin. Lê dozname dibêje te ew damezirandiye.

**Dadwer:** Em guhdar in wisa berdewam bike.

**Kemal**: Ev ne rêxistineke, em ne damezrînerê wê ne û ez jî nedamezrînerê wê me.

**Dadwer**: Heke tu zelal bikî em guhdar in, lê tu dibêjî wan rêxistin danemezrandine, derbasî hêla ez nizanim ya nola wan nebe.

**Kemal:** Peytandin dibêje rêxistin ne li gor ramanê wan kesan ava bûye û dabaşa hêla îdiyolojîk a rêxistinê dike.

Di vê xalê de, heke rêxistinkirin tune be, bi rengekî normal dê rêxistin jî tune be. Ev tê wateya ku di sala 1974`an de, tune bû. Ev nîşaneke ku di wê demê de, rêzikname û bernameya wê tune bûn. Di wê demê de, (Apo, Apoçîtî) hebû ji ber têkliya min bi tevgerê re hebû, ez dabaşa (Artêşa Rizgariya Gel)(U.K.O) bikim. Weha hat gotin ( peytandin).

Belavokên ku ji hêla wan ve, derdiketin wajoya (U.K.O) yê li ser bû. Min bi berdewamî hemû belavokên wan dixwendin; min tu carî wajoya ku navê (U.K.O) yê li ser, nedît. Di wê demê de, bi vî navî tu rêxistin tune bûn. Ev tevliheviyek bû, mebest jê afrandina gengeşeyê bû û derblêxistina tevgerê bû. Ev tevger zû bi pêş ket û li dora xwe gundî, karker û xort civandin. Ji bo navxerakirina wê, ew bi nave (Apoçîtiyê) dan nasîn. Ev tê wateya girêdana partiyê bi kesayetan ( em ne girêdayî kesayeta ne). Ev tê wateya ku ew kesayet winda bibe (heval Abdullah) wê tevger jî winda bibe. Abdullah jî mirov e di vê tevgerê de, kesayetek e.

Ev tiştê ku tên gotin, derew û bêbextî ye. Di amajeyê de, nerîneke giştî heye, weke ku me mirov bi gefxwarin û tirsandinê derbasî partiyê kirine; ew xweber derbasî nav partiyê bûn(xwebexş). Gefxwarin û tirsandin di Marksîzmê de tune ne. Şoreşa me vî tiştî li ser me disepîne. Hin bîneran anîn ziman ku me gelek kes bi zora çekê, tevlî dikirin, yan ev tişt bi wan re, çêbûye. Em bersivê didin; ev tişt ne rast e. Me kes neçar nekiriye. Her weha me zor bi kar neaniye û dirav ji kesekî nexwestiye. Me gef li kesekî nexwariye û bi darê zorê kes tevlî

tevgerê nebûye, ev ne ji sincên me ye. Em nehiştiye xelkê bi zorê bi me re kar bikin. Ji bo em mirovekî qezenc bikin, me (sêsed carî jê re şîrove dikir. Me danûstandin bi mirovan re dikir û me dihişt ew jî danûstandinê bikin û tevlî me bibin. Ew yek ji erkê min bû.

**Dadwer:** Mebesta te kîjan devera Kurdistanê ye?

**Kemal:** Em dê vê xalê jî zelal bikin. Heke miletek sînor jê re tune be, bi rengekî normal em dikarin cihê wî bi destnîşnkirina  rûbera ziman û belavbûna vî zimanî bidin xuyakirin.

Ev tiştekî zanistî ye. Her weha li cîhanê, gava li Ewropayê dewleteke gelerî yan neteweyî ava dibû, sînorê wê li  gor belavbûna zimanê wê dihat destnîşankirin. Weke ku em dizanin li hemû cîhanê Emperyalîzmê, cudabûn, sînorên netewe û dewletên ne dadmend û çêkirî, hene. Mebesta min jê ew e ku sînorên siyasî bi rengekî ne dadmend hatine çêkirin. Di rewşên normal de, sînorên neteweyan li gor rûbera zimanê wî gelî ye. Dewletên dagirker sînorên wan heta dawiya cihên ku ew dagir kirine, diçe. Birciwazî gava  ji bilî gelê xwe, gelekî xizan dagirkiribe, dikare sînorê dagirkeriya xwe berfireh bike. Tirkan,  kurd binpê nekirine, lê hêza ku li Kurdistanê desthilatdar e birciwaziyên tirk in û ne gelê tirk e. Tu berjewendiya gelê tirk û çîna kedkar di dagirkirina gelên din de, tune ye. Me ziyan gihand hêzên din gava em berhemên binerd ên Kurdistanê talan dikin, sitemkariyê li gelê kurdistanî dikin, bi vê yekê dijminên

me yê çînî, xurt dibe. Her weha karkerên ku bi zorê diçin kargehên me, bi heqdestên erzan kar dikin. Ev karker yedekên artêşa karkeran e. Karbidest li Tirkyayê ji kargehan bera me didin. Tu dergehê me tune ye. Em ziyanê dighînin xeynî xwe û ji ber vê yekê di navbera tevgera Rizgariya Gelêrî ya Kurdistanê û Tevgera Şoreşgerên Tirk li Tirkyayê hevgirtinek heye, baweriya min bi vê yekîtî û hevgirtinê heye. Ji bo vê yekê min bawerî bi biratiya kurdî –tirkî aniye. Bi biratiya van herdu gelan em ê dawiyê li çîna birciwaza desthilatdar bînin. Bi hilweşîna çînî, wê di kêşwerê azadiyê de yekîtiya herdu gelan çêbibe. Ez mêledarê dewletên mezin ên Rojhilata navîn im. Dewletên ku xwe dispêrin wekhevî, azadî û dadmendiyê. Dewletên ku derebegî, birciwazî, canbazî û çîna desthilatdar tê de tune ne.

**Dadwer**: Min berê pirsek kir: Mebesta we bi Kurdistanê ku der e?

We dabaşa ziman kir û we berê got: Hûn bi hûrbînî li ser dîroka Kurdisatnê rawestiyane, ev ziman li ku tê bi kar anîn?

**Kemal**: Di çarçoveya sînorên Kurdistanê, zimanê kurdî belav dibe.

**Dadwer**: Li ku ye, ew tişt?

**Kemal:** Ev sînor di hundirê xwe de, Entab, Mereş, Erzerom û beşin ji Sîwas, Qeres jî dihundurîne. Bi rengekî xwezayî li van deveran (beşê Kurdisatna Tirkiyeyê) berbelav e.

**Dadwer:** Tu weke zimanzanekî li van deveran geriyaye û te kok û rûbera wî bi hûrbînî şopandiye?

**Kemal:** Gava ziman ne fermî be, heke ABC ya wî tune be, zû bi zû bi pêş nakeve.

**Dadwer:** Hûn bi lêkolînan û hûrbîniyan rabûne?

**Kemal:** Kêm e, ji ber ku ez mirovekî şoreşger im, ne zimanzan im.

**Dadwer**: Hûn bi hin hûrbîniyan di der barê ziman de, rabûne. Ji bo rêjeya belavbûna vî zimanî li ser rûbera vî welatî bi giştî, çi girêdan di navbera wan de heye?

**Kemal**: Ji bo her zimanî, ev vajeyeke zanistî ye.

**Dadwer**: Na, te got hûn bi hin analîzan rabûne û li ser bingehê wan, we sînorên dewletê nîgar kirine.

**Kemal:** Pêwîstî bi dahûrandin û lêhûrbûna vî zimanî tune ye. her wiha nepêwîst e em rêzgez û tiştên pê ve girêdayî bikolin, Mebesta min bi dahûrandin (analîzkirina) zanistî ew bû ku ez bidim nîşandan ku ziman sînorê dewletê destnîşan dike. Ev tişt li Ewropayê pêk hat. Di dema avakirina dewleta neteweyî. Mînak: Li Fransayê dewlet li ser bingehê belavbûna ziman hat damezrandin. Gelê Alman li ser pevçûn herdu herêman (Elazas, Elorîn) ava bû.

Gelê Îtalî li ser rûbera zimanê xwe belav bû. Her weha dewletên mîna Nerwêc, Siwêsra jî li ser rûbera zimanê xwe ne(Flman)

**Dadwer:** Li Siwêsrayê çend ziman hene ku gel pê diaxive?

**Kemal:** Sê ziman hene, li Siwêsrayê demokrasî heye û li dewletek  mîna wê ev tişt pêkan e. Îro ev tişt li Ewropayê nabe, lê gava demokratî li Ewropayê berdewam bû. Îro demokratî li Eworopa tune ye, ji ber ku ên wê bi rêve dibin, desthilatdar in û paşverû ne. Ev li nav Ewropayê ne pêkan e. Ev yek li nav gelên Sosyalîst pêkan e. Ev mînak li nav sîstemên Kapîtalîst ne pêkan e.

**Dadwer:** Baş e, em werin qonaxa piştî sala (1978).

**Kemal:** Erê, ez ê der barê tiştên girêdayî me, bi rengekî giştî biaxivim.

**Dadwer**: Di sala 1979'an tu ji zindana Orfayê reviyî?

**Kemal**: berdewamî heye, berdewamiyeke nû heye, Ji ber ku 29'ê gulanê dîroka lêpirsîneke nû ye, ew li gel dozgerê giştî heye.

Ez dixwazim di wê dadgehê de, tewanên ku arastî min hatine di navbera (1979) û dîroka girtina min de, zelal bikim.

**Dadwer**: Çima tu dema 1979'an û zindankirina te, di dadgeha me de zelal nakî??

**Kemal**: Anah wê dozname ji wê dadgehê bighe min. Ew dozeke serbixwe ye ji vê dozê.

Gava ez herdu dozan bikim yek, di wê demê de, divê ez ji wê doznameyê bixwazim ku ez li hember dadgeha ku wê min dadgeh bike, biaxivim ( li gorî vê doznameya din)

Dadwer: Pêkan e, em her du dozan bikin yek û tu bi kurtasî der barê (1979) û heta girtina te, biaxivî.

**Kemal**: Min ev amajgerî sergihayî nekir. Bi kurtasî ji ber ku ez derveyî wewlat bû.

**Dadwer:** Tu li ku bû?

**Kemal**: Li Suriyayê bûm.

**Dadwer**: Li kîjan bajarî bû?

**Kemal**: Heleb û Şamê.

**Dadwer**: Girêdanên we bi kê re bûn?

**Kemal**: Ji ber ku ew nehatine girtin, ez navên wan nadim.

**Dadwer**: Tu li Wargeha Filestînê bûyî.

**Kemal**: Na.

**Dadwer**: Te li Şamê û Helebê çi dikir?

**Kemal**: Min nasnameyeke sexte, hilgirtibû, ji bo ez neyêm nasîn.

**Dadwer**: Çi pêwîstiya te bi derbasbûna Sûriyayê hebû, çawa te hest pê kir ku tu yê derbasî Sûriyayê bibî?

**Kemal**: Ya baş ew e, ez ji we re şîrove bikim.

**Dadwer**: Bi kurtasî.

**Kemal**: Ji ber ku doznameyê ev tişt neaniye ziman tu bersiv li gel min tune ye. Tiştên ku di amajeyê de, bi dawî bibe wê çêtir be.

**Dadewr**: Tu yê bersiva çi bidî?

**Kemal**: Weke amaje pê tê kirin hin sûc ketine histiwê min; weke ku ez endamê navendî yê Partiya Karkerên Kurdistanê me. Her weha, wekî ku ez endamê birêveberiya Orfa û Diyarbekrê me.

Wan wisa amaje pê kir û ez ê bersivê bidim,

Her weha dibêjin ku ez endamekî komîteya navendî ya Partiya Karkerên Kurdistanê me. Ez ê bersiva wê jî bidim.

**Dadwer**: Bersivê bi kurtasî bide, bi rengekî giştî, zelal bike û kurtebir bersivê bide,

**Kemal:** Di doznameyê de, bendek heye dibêje: Di dîroka 5'ê nîsana 1979'an biryar hat standin ji bo damezrandina rêveberiya herêmê. Ev baş nayê bîra min di kîjan rûpelê de bû; dibe ku di rûpela 60'î be. Di wê demê de, ez di zinadan de bûm. Her weha di doznameyê de, hat gotin ku min bi rengekî aktîv di rêveberiya herêmî ya Diyarberkê de, kar dikir.

**Dadwer**: Kemal, Li Bazarçikê di dîroka 18-11-1978 tu hat girtin. Gelo di heman rojê de, roja ku tu hatî girtin, tu ketî zindanê?

**Kemal:** Na, di 17.11.1978 de li Orfayê hatim girtin.

**Dadwer**: Li kîjan dadgehê doza te dîtin?

**Kemal**: Doza min ji bo dadwerê el ehkam el`urfiya ye yê Edenayê hate rêkirin û di pey re ez hatim vir, anah va ez li vir li ber destê te li dadgeha te me.

**Dadwer**: Tu li Edenayê (li zindana Ehkamê `Urfî) heta 15'ê hizêranê tu mayî?

**Dadwer**: Di zindana Edenayê de, ji 17.11.1978 heta kîjan dîrokê tu mayî?

**Kemal**: Heta 16 kanûna duyem li zindana Orfayê, bûm.

Di sala 1979'an ji 16'ê kanûna duyem heta 15'ê tîrmehê di zindana Edenayê de bûm û ji 15`ê tîrmahê heta reva min, ez di zindana Orfayê de bûm. Ji ber van sedeman zelal e ku ez pêşberî tu rêveberiya nebûme. Li gorî dîrokê ez vî tiştî napejirînim. Her weha ez amajeya ku dibêje ez rêveberiya Orfayê bûm jî, napejirînim. Ji ber ku di wê demê de, ez di zindanê de bûm. Pêkan e gava ez di zindanê de bûm, rêveberiya herêmî hatibû çêkirin. Her rêxistineke, li gorî daxwaz, têgih û armancên xwe kadroyên xwe çêdike. Xalek li vir dimîne, gelo ez dixwazim peywirekê biavêjim ser mile xwe?

Çêdibû ku ez bibêjim, erê. Ez dixwazim. Ji ber gelek sedeman min tu peywir wernegirtin, hêza min hebû ku ez bi vî tiştî rabim, lê daxwaz tiştetekê û kar tiştekî din e. Ji ber vê yekê ne pêkan e ji hêla dîrokî ve ku ez li Orfa û

Diyarbekrê, cihê birêveberiyê bigrim, ez ê sedeman zelal bikim.

Ez vê dibêjim ne ji ber ku heger ez berpirsek bim di rêveberiya partiyê ya herêmê de, ez ê bêm siza kirin, sizaya li min bê birîn, li gor baweriya min sizayeke siyasî ye, û ew ê ji bo min rûmet û şanaziyeke mezin be.

Niha em behsa sûcên kuştinê yên ku ez pê tême tawanbarkirin, bikimn. Bi kurtasî ez ê behs bikim ji ber hin agahiyan berê dizanim.

**Dadwer:** Ez ê pirsa çîroka kuştina Îsa Abacî ya ku di dîroka 04.08.1978 an de çêbûye, ji te bikim.

**Kemal**: Belê, di girtina me de li Orfayê zilamek anîn, heger ez ne şaş bim ap an jî xalê yê kuştî bû(îsa Abacî), da ku me bibîne û yê kujer destnîşan bike, wê demê zilzm got ku em min nas nake û ne ez im ê kujer.

lê ya balkêş ev gotin di girtînameyê de nenivîsîn û ya sosrettir ez heta wê kêliyê jî nizanim sedema girtina min ku ji bo kuştina Îsa Abacî ye, lê apê yê kuştî li gel polîs û dadgehê tekez kir ku kesê kurê me kûştiye keseke û ev du kes in û ji bilî vê yekê ne ew in. Ez jî tekez dikim ji wan re, ez ne kujerê wî me.

**Dadwer**: Tu tawanbar î, te li ber xwe da û gule bera erebeya polîsan dan û hewldana kuştina wan kir.

**Kemal**: Ev tawan, ne rast e û tu bingeh jêre nîne, tu têkiliya min bi vê bûyerê re tune ye. We di destpêka rûniştinê de got ku tawana Kemal ew e ku serkêşiya

şaneya tevgerê ya li Hêlwanê di sal 1977'an de, kitiye. Lê dixwazim zelal bikim ku mebesta we PKKê ye,! Lê di wê dîrokê de, qet şopa wan jî tune bû û ger mebesta we komên rêgiran be em ne mijûlî wan in, em xwedî armanc in, îdeolojî û siyasî ne, em ne berpirs û têkildarê rêgiran in.

**Dadwer**: Te semîner li zindanê pêşkêş dikirin?

**Kemal**: Belê, min pêkêş dikirin.

**Dadwer**: Tu bû yî yê ku semîner pêkêş dikir?

**Kemal**: Belê, bi giştî ez bûm.

**Dadwer**: Armancên we yên siyasî û îdeolojî çi ne? Gelo berê tevgera PKK'ê bi ku ve ye?

**Kemal**: Ji hêla îdeolojîk ve ( di heman demê de armnca PKK'ê ye); li Kurdistanê sedema paşverûtî û xizaniya heyî ew e stemkarî û serweriya aborî li rex stemkarî û serweriya siyasî li pêşberî civakê ye, ev yek dibe rêgirek li hemberî bipêşketinê.

Ji bo em civakeke azad biafirînin û dûrî mêtingeriya aborî û siyasî, gereke em li koka mêtingeriya aborî û siyas bixin. Ji bo vê yekê mêtinger çi tişta ku dibe kelemek li pêşiya civakê xurt dike mîna (asîmîlekirina kesayetê, dabên nebaş, paşverûtî) û çandê bi pêş ve nabe, êdî ji bo wilo em dibêjin divê ev koka rakin û mêtingeriya aborî û pergala wê bi dawî bikin.

hela em dabaşa nûnerên mêtingeriya li Tirkiyê bikin. Çîna serwer a borciwazî, ew ne gelê tirk e. Her weha çîna

desthilat a ku mêtingeriyê li Kurdistanê dike, ew ne gelê tirk e. Van kesan (çîna desthilat a borciwazî) dema ku mêtingerî li Kurdistanê pêk anîn; hevalbendên vê rêbazê ji xwe re dîtin û bêyî hevalbendan nikarin armancên xwe yên mêtingeriyê pêk bînin.

Êdî çîna desthilatdar hevkarî digel hemû parlementerên feodal kirin. Ev yek ji her kesî re diyar re. Xwediyên erdan (axa) mîna (Keb Oxlo) feodalê mezin li Amedê û parlementer (Mihemed Celal Bocaq) ji Orfayê bû. Ev kes hilbijartina wî her dem misoger e di parlementoyê de. Mêtingerî hevalbendîa van kesên wilo kir.

Armanca derve ya şoreşê têkbirina mêtingeriyê ye... û armanca hindirîn a şoreşê ew e têkbirina feodalên kombiradorî ye, lewre li gorî nêrîna min eger ev rêjîm têk neçe, êdî civak bi pêş ve naçe. Ev rastî ye û heta aniha nêrîna min hê jî ew e û nayê guhartin. Em ne bi xerakirin û talankirina dewletê re ne ji hêla ciwanên rewşenbîr ve û ne bi kûştina ewqas ji me ew qas jî ji we, em ne bi wê yekê re ne. Em bi rabûna şoreşeke bipergal in, em ne xwedî van ramanan in. Em ne bi sawdariya dewletê li hemberî gel re ne, ango em bi aramiyê re ne, dûrî ji sawdarî û fişarê ne. Ev yek jî hevaheng e ji pergala ramkirinê re. Îro di nêrîna min de ew dema terorê û fişarê ew ne ji xwestekên faşîstan e. Her weha em li dijî fişar û zordariyê ne ya ku li ser gel dide meşandin ku di encam de gel jî serê xwe hilde û îsyanê ragihîne, ev yek dûrî zihniyeta me ye û di ramana Marksîzmê de jî peyda nabe. Demekî li Kurdistanê şoreşe gel, rizagarî û azadiyê heye

û demekî mêtingerî binyada aborî û siyasî armanc girtiye, ji bo vê yekê em şoreşek gelêrî û demdirêj diafirînin; ev ramana me ye**.**

**Dadwer**: Wê ev şerê gelêrî çawa be?

Şerê gelêrî yê demdirêj ez ê ji te re şîrove bikim, di bîrodziya me ya giştî de ev şer armanca me ya stratejîk e û ev şer armanca rêxistina PKK'ê ye, ji ber ku binesaziya îdeolojîk û siyasî stûnê sereke yê rêxistin û avakirina PKK'ê ye, ev armanc e, lê rêxistin tiştekî cuda ye, dibêjin ku PKK'ê baskekî leşkerî ye, wisa li vir dihate gotin, ev gotin di doznameyê de jî derbas dibe. Ev gotin dûrî armancên stratejîk û rêxistinî ne. Ji ber ku di binesaziya îdeolojîk a vê tevgerê de tune ye. Tevgera PKK'ê ji bo parastina gel e, li Kurdistanê derebeg û çînên desthilatdar gel diçewisînin, yanî dijberiyek di civakê de heye, me di navbera gel û derebegan de nakokî dernexistine, şerê PKK'ê ji bo alîkariya gel e, di heman demê de weke tevgereke çînayetî ku piştgiriya gel dike û xwe weke tevger jî diparêze tê nasîn. Ev di dema avakirina tevgerê de bû, normal ez wê demê tune bûm, lewma armanc çibû û rêxistin ji bo min çi bû, ez nizanim. Lê hemû tiştên min anîn ziman di der barê armancên stratejîk de bû, ev jî tê wateya ku rêxistinkirin ji demeke dirêj û şerekî demdirêj e. Û ev ya tiştekî din e.

Ev armancên serbixwe ne yên artêşeke serbixwe ne. Artêşeke pispor û rêxistineke çekdarî ya pispor wê bi pêşengiya partiyê be, ev armanc pêwîstiya wan bi rêxistineke ku binesaziya wê cuda be heye, ji ber ku

PKK'ê xwe ser vî bingehî birêxistin nekiriye, heger li ser vî bingehî xwe birêxistin kiribane, dê hejmara kesên ku niha hene ji wilo pir kêmtir baya, her wiha dibe ku me dengine bilindtir bibihîstana. Lewma PKK'ê ne li ser tiştên borî hatiye rêxistinkirin. Dibe ku şert û mercên heyî derfet nedida yanî derfetên wan sînordar bûn. Rêxistineke wisa avanekirin û ez nizanim bê çima wisa nekirin?

Lê ji armancên wan e ku wisa bikin û ew şiyan û taqeta wan heye ku wisa bikin.dibe ku piştî 10 salan an jî piştî 20 salan be, dem ne girîng e. Ev bîrdozî heger piştî pêncî salan pêk were û serkeftinê pêk bîne, ev tê wateys ku li benda (Ibrahîm, Ehmed, Hesen, Mehmûd, Hisên) bû, hebûna van ji bo serkeftinê ne girîng e, heger (Ehmed) nebe, têrê dike ku (Mihemed) hebe, ji ber armanc şerê gelêrî yê demdirêj e. Weke ku di doznameyê de derbas dibe yan jî ez texmîn dikim, PKK'ê tiştekî wisa guftûgo nekiriye û wê bi tu karên leşkerî ranebe. Heger bi karekî leşkerî rabe ev ya demekê dixwaze, yan jî li gor şert û mercan dibe ku 5 sal an 2 sal an jî 10 salan bê paşxistin, em paşxistinê deynin aliyekî heger dema guncaw hat û mercên pêwîst pêk hatin, hingê dê aliyê leşkerî têkeve guftûgoyê de.

**Dadwer**: Gelo dewleta ku we di serê xwe de daye avakirin, li deverke cîhanê nola wê heye ku wekhevî û dadmendî tê de, li ser hemû astan heye?

**Kemal**: Belê heye, lê niha ne pêkan e, ji ber ku komunîzmê baş li cîhanê belav nebûye û pêk nehatiye, lê

pêvajoya destpêkê ji komunîzmê heye û ew jî sosyalîzm e.

**Dadwer**: Li ku ev yek heye?

**Kemal** : Mînakên berbiçav Yekîtiya Sovyet, Vietnam û Angola .....dewletên sosyalîst in.

**Dadwer**: Bi vê axaftinê, tu teqez dike ku hûn li ser vê rêkê diçin?

**Kemal**: Belê lê hin tişt hene xwe dispêrin bingeha felsefeya Marksî û îdeolojiya Marksîzm-Lênînîzmê ku serweriya siyasî dê ya ku gel bi rê ve dibe.

**Dadwer**: Li Rûsyaya komunîst, dadgeh û zindan hene?

Kemal: Hene.

**Dadwer**: Bo çi dadgeh û zindanan didin avakirin?

**Kemal**: Heta niha li Yekîtiya Sovyetê cudabûnên çînî hene, Her weha li Vietnamê jî ev cudabûn hene. Li Yekîtiya Sovyetê, Vietnam û Angolyê dîktatoriya proletaryayê heye û ew ên serwer in. Li Amerîkayê jî dîktatorî heye, lê ji ya proletaryayê cuda ye, ya Amerîkayê hejmarek ji çîna borciwazî ne ew in ên ku serweriyê dikin. Di dîktatoriya proletaryayê de, piraniya gel serweriyê dikin, lê di hişê min de ew rengê serweriya siyasî ya ku dê saz bibe, çi li Tirkiye yan Kurdistan an jî dewleteke erebî be ew ê demokratîk be, jixwe demokrasî jî taybetiya wê heye. Çi demokrasiya hebe; ger demokrasiya proletariya be dê bi navê dîktatoriya

proletaryayê be. Ger demokrasiya borciwaziyê be dê bi navê dîktatoriya borciwaziyê be.

**Dadwer**: Di klasorê 12'an û di peldanka (musenef) 6'an yê taybet bi tawanbar, min îfadeya wî xwend û bi sedema van bûyeran û girtina bersiva te ji hêla dozger û dadwerê lêpirsînê, ez ê bikurtasî weha bibêjim...

Ez ne kujer im û têkiliya min pê nîne  û di dîroka 15.08.1978'an de, ez ji ber darizandinê reviyabûm û li Enqerayê min xwe veşartibû. Tu têkiliya min bi kuştina (Mihemed Azak Yûz) de tune û hevalê min dema navê min da, ew di bin lêdan û işkenceyê de bû**.**

**Dadwer**: Te wisa da diyarkirin û te ji dadwerê lêpirsînê re di îfadeya xwe de ku demjimêra bûyer bûyer çêbûyî tu li Enqerayê bû û tu beşdarî operasyona kuştina polîsan nebûyî.

**Kemal**: Belê ez wê demê li Enqerayê bûm.

**Dadwer**: Te bi hûrbînî li dîroka Kurdistanê meyze kiriye?

**Kemal**:  Belê, hinekî li gorî derfet û hêza min.

**Dadwer**: Li gorî hûrnêrînên te, tu gihaştî ku?

**Kemal**: Gelên li Rojhilat dijîn ji asûr, îlamî, somerî û akadî ev tev li Mezopotamiya jiyane (ango welatên di navbera çemên Dicle û Firatê de ne) navendekê ji çavkaniya şaristaniyê re saz dikin, ango şaristaniya ku li vê deverê ji cîhanê belav bûye, lê kurd ew niştecihên vir

in, wate ji aliyê pratîk ve gelek dibetî hene ku hin dibêjin ew civakeke cîgayî û resen e.

**Dadwer**: Min ji te pirs kir li gorî hûrbîniya te?

**Kemal**: Li gorî pêzanîna min kurd beriya 2000 sal B.Z ji bakurê Ewropayê hatin; ji Çemê Diyabo û Diyaster bi derbasbûna Qefqasiyayê heta li vir bi cih bûn.

Jixwe xalek li vir heye ez ê wê ronî bikim, kurd ji koka arî ne û ji malbata Hindo-Ewropî ne û ya herî girîng ku berî wan û piştî wan tu kes li vir bi cih nebûne, ev hersê sedem nêrîna min tekez dikin. Lê di warê pratîk de dikarim ji te re bibêjim ku ev mijar a pisporên dîroknivîsan e, ne ya min e. Ya ji min re girîng wek şoreşvan, ez ji bo teoriya şoreşê dixebitim, ne tekûzkirina dîrokê ye.

**Dadwer**: Gelo nêrînek we ya din heye bo vê yekê?

Kemal : Belê xaleke din heye ew e ku ev der cih û warê kurdan ne, ne ji cihekî din ve hatine.

**Dadwer**: Cuda?

**Kemal**: Nayê hişê min, lê pêwîst nake lêkolînek zanistî di derbarê vê mijarê de bê kirin**.**

**Dadwer**: Gelo tu bawer û piştrast î ku ji bakurê Ewropayê hatine?

**Kemal** :Belê, lê pêwîstî bi lêkolîn, hûrnerênî û kûrbûnê tune ye. Hûn dizanin çima pêwîstî pê tune; ji ber ku ev milet li cihê xwe ye. Her weha ya li ser milê min dikeve

ew e gihaştina rastiya aborî û siyasî û min ev yek kir tu pirsgirêk tune ye li ser bûyera neteweyekê ji ber ku hatibe an têkilî neteweyek din bûbe. Mînak tirk jî ji Asyaya Navîn hatine û li Anadolê bi cih bûne, erê em ji Asyaya Navîn in û me taybetiyine din ji Anadolê girtine. Ev rastiyek e gerek mirov baş bigire dest û tê bigihêje.

**Dadwer**: Nasnameya Kemal xwend.

**Kemal**: Erê ya min e.

**Dadwer**: Gelo axaftineke we heye ji bo bersivdana îfadeya tawanbar?

**Dozger**: Na

**Dadwer**: Biçe cihê xwe. Tişta guncaw bixwîne ji ber dema rûniştinê dirêj kir ku (20) xulek ji bo wê hatin dan, li ser wê erê bû û biryar bi giştî derket jê re.

(26.05.1981)

Dadwerê civînê
serokê dadgehê

Nivîskarê dadwer

**Nameya yekem:**

**Gelî hevalên hêja**

Dîroka mirovahiyê tijî ye bi têkoşîna çînên stembar û civakên şoreşger li dijî çînên stemkar. Kole li dijî koledaran. Cotkar li dijî derebeg (feodal) û êlperestan. Ploretarya li dijî borciwaziyê. Van çînan bi qehremanî li dijî wan li ber xwe da. Ev berxwedana çînî li dijî dagirkerên keysbaz jî bû.

Çerxa dîrokê bi rêya têkoşîn û fedakariyên çînên stembar digere. Di tevgera civakê de jî xwîna gelek kole, cotkar û karkeran rijyaye. Bêyî rijanda xwînê, tu serkeftin bi dest nakevin, ev tiştekî dirust û zelal e.

Şoreş ne her gav û di hemû deman de li ser xeteke li pêş û rast e, çiku taktîk di hindirê şoreşê de hin caran hilkêşî ye û carinan dakêşî ye.

Rêya şoreşê xwaromaro ye; geh dadikeve, geh jî bilind dibe. Carnan jî şoreş di rêyên pir zehmet û teng re derbas dibe. Ji her şoreşekê re, berdêlên wê hene, li hin welatan ev berdêl heta astekê hindik in û li hin welatên din jî ev berdêl pir buha û giran in. Lê tişta girîng ku tevgerê ber bi serkeftinê ve dibe, ew e ku tevger li gorî şert û mercên welat, Marksîzma-Lênînîzm pêk bîne û têkoşîna xwe li gorî zanista Marksîzma-Lênînîzm bi rê ve bibe. Baweriya rêxistinê bi zanista Marksîzma-Lênînîzm, dê serkeftina partiyê bi xwe re bîne, çi aniha be.

Kesên ku şoreşê mîna keştiyekê di deryayeke aram de ku pêl lê nade dibînin, ew di xewnan de dijîn. Dîrokê di

hemû deman de, ev nêrîna wan şaş derxistiye û diyar kiriye ku ev kes nikarin xwe ji bin zordestiya ku li ser wan dimeşe, derxînin. Şoreşa Cotmehê ya sosyalîzm (1917) deriyên nû ji rizgarkirinê re vekir ( dema şoreşa karkeran) wê demê tevgera rizgariya neteweyî bû beşek ji şoreşa cîhanî û ew heta roja me ya îro li dijî dagirkeran tê dikoşe. Tevgera rizgariya neteweyî ya gelên Rojhilata Jêrîn: Hindistan, Çîn, Afrîka û Amerîkaya Latîn ji bo serxwebûn, rizgarbûn û demokrasiyê li dijî dagirkerî û paşverûtiya herêmî têkoşîn dikir. Bi vê yekê serkeftin bi dest xist, dagirker ji welatê xwe derxistin û sîstema wan ya dagirkeriya kevin, têk bir.

Gelê Kurdistanê, heta niha di bin destê dagirkariya kevin de ye, êş û azaran dikişîne. Gelên Kora, Çîn, Guinea, Mozambique, angola, Cambodia, Laos û gelê Vietnamê yê qehreman (dilêr) di encama rijandina xwînê de, qehremaniya xwe û rêya rizgariyê ya ku li ser meşiyan, cihekî berz da rizgariya neteweyî û ji bo tevgerên rizgariya neteweyî yên cîhanî, bûn mînak.

Gelê me yê kurd ku di bin zor û dagirkeriyê de ye û divê ji têkoşîna van gelan sûd bigire. Ji bo rewşa Kurdistanê û jiyana gelê me, em neghan vê roja îro, bê ku tu tevger û kar bê kirin. Gelê kurd mîna gelên din ji bo ku nekeve bin dagirkeriya dewlatên biyanî û tevlî zehmetiyên dûrbûna wî ji şaristanî û bajarvaniyê re jî; gelê me ji bo rizgarkirin û serxwebûna xwe, gelek xwîna giranbuha rijandiye. Welatparêzên ku xwîna wan bi axa Mîdyayê re bûye yek, ev qurbanî ne ji bo xayin û keysbazên ku ji bo berjewendiyên xwe yên kesayetî bi

hêzên dagirker re dikin, dane. Ev kes bûne xincerek di dîroka biêş a gelê Kurdistanê de. Sembola êşa gelê Kurdistanê, di fedekariya şoreşger, qehreman û kesên dilsoz û birûmet de diyar dibe. Ji aliyekî din ve, tevlî ku biêş e jî lê sembola din xiyanet, xweradestkirina ji dagirkeran re û nerastiya ku li welatê me Kurdistan hatiye bicihkirin e. Piştî têkçûna Emperatoriya Medyayê û destpêkirina qonaxa dagirkirinê sedemên nerizgarbûna me û mabûna me di bin dagirkeriyê de, vedigere xweşikbûna xweza û dewlemendiya welat, her weha ji ber cihê welatê me yê stratejîk ku bû sedema bicihbûna dagirkeran li Kurdisatnê û bicihkirina xiyanetê di nava çînên gel de. Ji ber ku dagirkerên tirk welatê me Kurdistan kir mîna bazaran ji bo berhemên xwe û hilberandin heyberên xam, bi xwe re çîna proletariya derxiste holê. Bi demê re (ji bo ku di pêşerojê de, em li dijî wan li ber xwe nedin) bicihbûna li deverên ku wan ava kiribû (bajar) dan pêş. Ev cih ji bo ku ciwan ji xwe, welatê xwe û perwerdeya xwe ya li dibistanên biyan bibin, ava kiribûn. Çîna ku dîroka mirovahiyê ya nûjen dinivîse- çêdike ew çîna proletariya şoreşgerî, rewşenbîr û ciwanan e. Ev mijareke dîrokî ye.

Ev yek ji bo şoreşa welatê me, mercekî objektîv e. Lê ji ber koçkirina ciwanan û sirgonkirina wan ji derveyî welat re, her weha ji ber tênegihiştina çînê û wernegirtina wê ji zanista çînî û zendeyan re ji aliyê tevgera rizgariyê ve, proletariya li Kurdistanê weke xwe ma. Bi vî rengî berdewam kir heta ku ciwanan li dibistanên mitropolan, dest bi xwendinê kir. Zanist, têkoşîna rewşenbîrên tirk û

Şoreşa Vietnamê rê li ber ciwan û rewşenbîrên welatê me vekir û ji wan re bûn alîkar. Piştre li gorî mercên welatê xwe, Marksîzma-Lênînîzm û komeke îdeolojîk ku bû navenda tevgera şoreşgeriya neteweyî, pêk anîn. Wan ramana têkoşîna çekdarî li Kurdistanê belav kir û bi têkoşîn û pêkanîna pratîkî ji teoriyê re, gavên mezin avêtin. Mîna hêzeke fîzîkî pir mezin derket û bi demê re, bû Partiya Karkerên Kurdistanê.

Gelî hevalan: Berjewendî û pêşeroja gelê Kurdistanê, ew nîşan û rêberên me ne; em li gorî wan dimeşin, li gorî PKK'ê ew erkekî mirovî û pîroz e. Azadiya cîhanê û jinavbirina zordestiya mirov li mirov, ew erkekî mezin û birûmet e. Tevlî hemû zehmetiyan, ez ê bê kêmanî bi erka xwe rabim.

Ez ê ji bo pêkanîna vî erkê mezin û pîroz bi hemû raman û zanista (zanebûn xwe) kar bikim. Min dixwest ji bo rizgarkirina gelê xwe û serxwebûna Kurdistanê, ez demeke dirêjtir şer bikim. Dibe ku dagirkeriya tirk a faşîst rê nede ku ez vê yekê pêk bînim, ji bo wê jî ez we yek bi yek himbêz dikim û silavên min ên germ ji bo hemûyan.

**Orhan Aydin**

**Nameya duyem:**

## Ji Bo Hevalan

Mirina dê raserî her mirovê ku rûbirûyî min tê, piştî ku fermana bidarvekirina min ji hêla dagirkera faşist a tirkiyê ve derket. Di demeke kin de, ez ê dûrî we bikevim, lê hêviya min ew e ku berî ez dûrî we bikevim, ji bo serxwebûna welatê xwe û azadiya gelê xwe, li rex we demeke dirêjtir, li hember dagirkeriya faşist ya Tirkiyê û feodalîzma komprator, şer bikim û di vê rêyê de, bibim pakrewan.

Hêviya min ew e ku li gel we mil bi mil şer bikim, li rohilata sor, spêdeya sor a wê were, li xwarbûna şitlên daran temaşe bikim. Bewariya min bi vê yekê bê sînor e...

Bila tu kes guman neke ku tiştekî bêberamber heye. Di têkoşînê de ev tişt pêkan e ger ew mirin be jî. Yê ku vê ramana rast ji hiş û nihadê (wijdanê) xwe demeke kin derîne û di vê rêya têkoşîna li hember dijmin de tiştekî hêsan heta ku mirin be jî nede, wê rojekê bê hesab biçe mirinê. Di rûpelên dîrokê de, gelek mînak û rastî hene, ên ku nirxê mirinê bi zanebûn nas kirin, niha ew li ber çavên min in û di ramana min de dijîn.

Di têkoşînên şoreşgerî de, yên ku bûn pakrewan çi bi guleyan çi bidarvekirinê, hemû pakrewanên şoreşan in, di dilê gelên stembar ên proletaryaya cîhanî de, bûn xetîreyeke nemir a şoreşgeriyê. Kesên ku ji mirinê natirsin û heta kêliya xwe ya dawî bi qehremanî li

hember wê rawestiyan û dema ku kêliya îdamkirina wan a bi guleyan hat, gotin:"Bijî pêşdarê me Ho Chi Minh (Ho Çî Minh), bijî gelê Vietnamê". Ên ku bang kirin mîna (Van Troî), bûn sembola vîn û fedekariyê; mînaka pêşengiya qehremaniyê, bûn nîşaneya me. Niha ew di aşop û ramana min de ne û canê wan, wê bi min re bimîne û tu carî ez ê wan ji ramana xwe derneyînim û wisa wê ba û bahoza şoreşê bimînin.

Di jiyanê de, tiştek ji têkoşîna şoreşê çêtir tune ye, lê ew rêyeke zehmet e; tijî strî, xwarûmar, daketin û hilkişîn e. Rêya têkoşîna şoreşê, bêyî rasthatina van qedexe, zehmetî û tengasiyan û bê bêhneke fireh pir dom nake. Ev jî rastiyek e. Her weha di rêya têkoşîna şoreşê de, rasthatina mirinê pêkan e. Ji bo daxwazeke hêsan, bi tifengan, xwîn û stûnên sêdaran li beramberî wî radiwestin.

Ev tişt, li welatê me Kurdistan, bêtir û zelaltir dibe. Li gorî zanebûn û têgihiştina min, mirin li pêşiya min e. Min di vê têkoşîna ku pêşenga me PKK'ê tê de ye, xwe bexş kiriye. Serxwebûn, azadî û serkeftinê di vê rêya têkoşînê de; ji bi vê biryara dagirkeriya Tirkeyê ya faşist ez ê nikaribim bibînim. Di vê demê de, mirin jî nêzîk bûye. Heta vê kêliyê tu tirs an lewazbûneke hêsan jî neketiye dilê min. Di temenê xwe yê sînordar de, di xalekê tenê de dihizirim. Dema ku ez biçim ber sêdara darvekirinê, li hember dagirkerên faşist û celadên kûçik ên ku nefret ji devên wan derdikeve, ez ê serî netewînim; ez ê qehremanî û mêraniyê, şanî wan bidim. Ez ê

qehremaniya ku giyanê PKK'ê ye zindî û mayînde bihêlim. Ez ê tolê ji dijmin hilînim hevalno!

Ev sîstema ku roj bi roj lawaz dibe, ji demekê heta demekê ji bo ku temenê xwe zêde bike, agirê raperînê yê gur, vemirîne û tirsê di dilê cemaweran de biçîne heta ku ji bo jiyaneke aram li welatê me têkoşînê nekin. Li hemû deverên Kurdistanê ji bo standina biryarên darvekirinê, ev dadgeh ava kirin. Ev qonax mîna qonaxa ku tê de cemawerên me li ser sêdaran darve kirin.

Dixwazin ji van komkujiyên ku li Kurdistanê pêk tînin, Mereşê ji nû ve zindî bikin. Ev komkujiyên ku xwestin hin bi hin li Kurdistanê pêk bînin. Ji bo ku armancên xwe di demeke kin de pêk bînin, li hember têkoşînên me şer kirin, ji ber vê yekê, êrişên xwe zêde kirin. Lê ew nikarin têkoşîna partiya me PKK'ê vemirînin û nikarin di sînordarkirina belavbûna tîrêjên şoreşê, di nav cemaweran de, bi ser bikevin.

Têkoşînên me yên rizgariyê, derbeyan li dagirkerên tirk didin û ben li qirika wan asê dikin. Dema ku wan digihîne ber mirinê, hartir û hovtir dibin û li şêwaz û xapandinên nû digerin. Yên ku li dijî têkoşînên tevgera me, bi Derbeya 12'ê Îlonê rabûn, nikarîbûn tiştekî bi dest bixin. Lê belê dagirkerê tirk îro di bêhnvedanên xwe yên dawî de ye. Ji bo tunekirina PKK'ê û qutkirina têkiliya bi cemaweran re, çandina tirsê di nava mirovan de û bêhêvîkirina wan, weke dema Dêrsimê û Şêx Seîd, dadgehên weke dadgehên wê qonaxê ava dikin. Ji ber vê yekê ji bo destpêkirina sizayên darvekirinê, kuştina bi

sedan ji hevalan û şêwazên din ên terorê û tirsandina cemaweran, ji wan dadgehan li Kurdistanê zêde dikin.

Ji bo pêkanîna berjewendî û armancên xwe, li hêviya mercên guncaw in; ên ku bi karê wan ê tirsonek re dibin alîkar. Armaca wan ya stratijîk di qonaxeke weke vê de, naskirina qehremaniya PKK'ê, ji vê rêyê dûr dikeve yan na û şer dike yan na, ev yek mercên şoreşgeran dide û zelal dike.

Gelo wê armanca xwe ya stratejîk pêk bînin yan na…?

Ne gengaz e pêk bînin! Dibe ku ji hêla tektîkî ve, hin armançên xwe pêk bînin, lê ji hêla stratîjîk ve wê hilweşin. Wê serkeftin a pêşenga me PKK'ê û serweriya wê ji gelê Kurdistanê re be. Ev tiştekî mutleq e.

Hevalên me yên ku bi sedema darvekirinan şehîd dibin, wê bi bêhinvedanên xwe yên dawî û pêlên şoreşê, dijminan bifetisînin.

Ma em bibêjin ku ev dem ne wek dema raperîna (1925 – 1940) ye, berevajî wê demê, gelek rewş û mercên serkeftinê yên objektîv hene.

Di dîroka ciwantiya têkoşînên tevgera me de, rêberê me Heqî Qerar bi destê nokerên dagirkeriya tirk û alavên wê, hat kuştin. Her weha peyayên axayan, hevalên mîna Xelîl Çaxon, Salih Kendal û Cûma Taq ên ku bi xwîna xwe gorî kirin, şer kirin û bi mêranî şehîd ketin, kuştin. Lê şoreşgerên Şekston û Qiziltepe, hemû şervan û têkoşerên PKK'ê, yên ku bi qehremanî û bawerî şehîd bûn, şervanên ku yek bi yek şehîd bûn mîna têkoşer

(Delîl Doxan). Her weha şehîdên şoreşê yên ku stûnên serxwebûnê vegirtin, ew stûnên ku hişktir û xwedîbergirî û rehên xwe berdane, tirs di nava dagirkeriya tirk, hevpeymanên wê, nokerên wê feodalên komprador, her weha heval û hevpeymanên wan emperyalîstên derve de, çand.

Ji bo dirêjkirina bêhinvedana xwe ya dawî, dabaşa birîna stûnên ku hişktir bûne û wê wan weke zendên heştpêyê bifetisîne, dikin; wê ji ketina tekez rizgar nebin. Bi wan stûnên ku ji bo darvekirinê datînin û bi wan me bikujin û tune bikin, nikarin têkoşîna PKK'ê û gelê me bi dawî bikin.

Dibe ku ew bi pêkanîna sizayên darvekirinê demekî, li ser lingên xwe rawestin. Heta bi bidarvekirina min û hevalên min bawer dikin ku em ê lawaz bibin! Lê em ji xelekeke lawaz derketin û em bi giyan û jîn in. Û ew ji gora siyasetê derketine; nikarin bi pêş de biçin, ew mîna pîrmêrekî ku dawîhatina wî nêz dibe.

Dagirkeriya tirk a faşist çiqas hartir û hovtir bibe, nikare tiştekî bi dest bixe. Wê mîna kûçikê har serê xwe li dîwaran bide û ji bo dojehê wê were qewitandin. Ez bawer dikim ku wê gelê Kurdistanê serkeftinê bi dest bixe û bi vê baweriyê ez ê bi aramî dûrî we bikevim û xatir ji we bixwazim. Baweriya min bi PKK'ê wê nehêle ez bikevim.

Mirin ji ku û çawa tê bila bê, ez baş wate û mebestên vê gotinê dizanim. Min dizanîbû ku ez ê di rawestgeheke weke vê de rawestim. Min biryara sizaya bidarvekirinê

ya ku di derheqê min de derket, bi aramî pejirand û ez ê heta dawî bi vîna xwe ya şoreşgerî aram bimînim û piştî wê jî ez ê li beramberî mirinê ji bo şoreşê bi rengekî asayî rawestim. Mirin, niha bê dudilî bi vî rengî li beramberî min e û ez ji hevdîtinê re amade me. Ez ê bi hemû hêza xwe ji bo bidawîkirina erkê xwe yê dawî, kar bikim. Ez bawer im ku bêyî guhdayîna dûrketina ji we, ez ê biçim ser mirinê.

Di vê rewşê de, hevalekî min got:" (Me ev rûmeta berz diyarî kiriye, lê bi mercê ku mirov wê nas bikin.

Bi vê gotinê, biryardayîna min a têkoşînê bêtir bû ku ez hêjayî pêşeng û rêbera me PKK'ê bim. Bi dilsoziya şehîdên şoreşê, ez ê pêvemayî bimrim ku alaya partiyê ji destê min nekeve. Gereke gumana we bi vê yekê tune be.

**Silava şoreşê ya mayînde!**

**ORHAN Aydin**

Piştî ku desthilatdariya dagirkeriya tirk, sizaya darvekirinê di derheqê wî de birî, heval Orhan Aydin kadroyê li pêş yê PKK'ê, ev her du name ji bo gel, hevalên xwe û hemû kesên pêşverû û şoreşger, ên cîhanê rê kirin.



# AYTEKÎN TUGLUK

Piştî bilindbûna asta têkoşîna tevgera rizgariya niştimanî ya Kurdistanê, di bin rêveberiya PKK'ê de, li hember vê pêşveçûnê ya li Kurdistanê, rêveberiya siyasî ya dagirkeriya tirk, neçar ma. Ji ber vê yekê û ji bo fetisandina şoreşê ya ku rehên wê li hemû deverên me, belav bûn û bi rêya artêşa tirk ya dagirker a ku wîlayetên Kurdistanê operasyon kir (şekirin), zagonên leşkerî li piraniya wîlayetên Kurdistanê sepand. Yek ji van wîlayetan wîlayeta Elezîzê bû ya ku di bin rêveberiya

PKK'ê de bû, navendeke çalakiyên şoreşgerî. Di yek ji operasyonên xwe yên hovane de, artêşa tirk di sala 1979'an de, bi gelek binçavkirinên berfireh rabû. Yek ji wan jî grûpekê xiyanet bi rêgezên xwe re kir û xwe radest kir. Di wê demê de, navê hevalan eşkere kir; yek ji wan heval Aytekîn Tugluk bû. Faşîzmê, di kesayeta grûpa hevalên Elezîzê de, plan kir ku partiyê qir bike. Ji ber vê yekê ji bo ku serî daynin, gelek şêwazên qirêj bi wan re bi kar anî. Heval Aytekîn, bi berxwedaniyeke lehengî, dijî rêveberiya girtîgehê, faşîzm û xayinan li hember hemû hewldanên wan yên neçar rawestiya. Girîngiya berxwedaniya wî ya li girtîgehê ji bergiriya wî ya di ber alaya partiyê ya şoreşgerî de tê. Di wê demê de, heval Aytekîn weke şoreşgerekî şareza hat xuyakirin.

Piştî faşîzmê nas kir ku heval Aytekîn Tugluk, di girtîgeha Elezîzê de, bi işkence û lêdanê, wê serî netewîne, plan kirin ku xwe jê xelas bike. Bi çekdarkirin û erkdarkirina endamekî xwe yê faşîst ji bo kuştina heval Aytekîn. Di encamê de, rêheval Aytekîn şehîd bû û bi xwîna xwe axa Kurdistanê ya tîya sexwebûn û azadiyê, av da.

Dema ku rêheval (Ehmed Kurt, Selman Dugru û Mihemed Kurt) her sê rêveberên gel di partiyê de ên herî xuya, di encama operasyoneke mezin de, ya ku faşîstan li ser gundê Şikistonê pêk anî, şehîd kirin. Her du heval Ebdulah Yocih û Mihemed Kurt hatin girtin û di encama işkenceyeke hovane de, di 28'ê adara 1980'yî de, şehîd bûn.



**ABDULAH YOCIH**




**MIHEMED OZSOY**



**EHMED DEMIR**

**Li zindana Mardînê di bin işkenceyê de şehîd ket.**




**UMER EQTAŞ**

**Di Sala 1980yî De , Li Zindana Mardînê, Di Bin Işkenceyê De Şehîd Bû.**



**Se'îd Şemşik**

Prolîter bû, di kargeheke bajarê Neyzebê yê girêdayî wîlayeta Entabê de kar dikir. Di nav refên karkeran de, bi rengekî çalak kar kir. Di sala1981`ê de, rêveberiya rêxistina partiyê li bajêr wergirt. Faşîstên xwînmij bi operasyonên xwe yên hov li ser rêheval, rabûn. Di du rojan de li pey hev û tevî işkence û lêdanê ya li Entabê, ji dijminan re devê xwe bi gotinekê jî venekir. Bi vê yekê, vî hevalî berxwedana ku bû beşek ji kevneşopiyên şoreşgerî yên PKK'ê, ji bîr nekir. Berxwedaniya wî têkoşînên gelê Kurdistanê, nîşa dide.



## ELÎ ARAK

Mînaka têkoşerê navneteweyî bû. Rêgezên navneteweya prolîter bi gotin û piratîkê di kesayeta xwe de pêk anî. Bi berxwedaniya xwe ya bilind û bêdawî, faşizma tirk li hember dadgehên leşkerî şermezar kir. Ji ber qehremaniya berxwedaniya heval Arak, faşistan ew bi rengekî hovane işkence kir û di encamê de, di Cejna Rojiyê ya sala 1981'ê de li zindana Amede şehîd ket. Li hember faşistan berxwedanî kir û tu carî serî netewand û ev berwedaniya wî li nik gelê Kurdistanê û Tirkeyê bû mînak.



**Ebdurehman Cacan**


**Li zindanê di bin işkenceyê de şehîd bû**

**AYŞE KOKIR**

**Di sala 1981'ê de, li zindana Bazar Ceq di bin işkenceya hovane de, şehîd bû.**

**HESEN DEMIR**

**Di sala 1981'ê de, li Zindana Mardînê di bin işkenceyê de, şehîd bû.**



**HUSEYN AQAR**

**Di tîrmeha sala 1981'ê de, li Zindana Adenê di bin işkenceyê de, şehîd bû.**




**ESKER DEMIR**

**Di adara sala 1982'yan de, li Zindana Amedê di encama komkujiya hovane ya ku dewleta Tirk de, di hundirê zindanê de, li dijî têkoşerên PKK'ê pêk anî, şehîd ket.**

**REMZÎ YILWAC**

**Di Îlona sala 1981'ê de, li Zindana Diyarbekirê di bin işkenceya hovane ya ku ji aliyê faşîzmê de, lê hat kirin, şehîd bû.**



**FERHAD KORTAY**

## Ferhad Kortay

Heval Ferhad Kortay bi baweriya xwe ya bi Marksîzma Lênînîzmê û baweriya xwe ya bêsînor bi Tevgera Azadiya Netewî ya Kurdistanê, hîn di qonaxa avakirina bîrdozî û ramyarî de, tev li tevgerê bû. Bi nimûne û rengên xwe yên şoreşgerî, tev li rêya têkoşînan bû. Di demeke kin de, weke rêberekî xwedî cihekî bilind, di nav gel de xuya kir.

Di operasyona dewleta Tirk ya dagirker a sala 1979'an de, bi armanca qirkirina partiyê, ew û gelek hevalên xwe dîl ketin. Bi baweriya xwe ya xwegirtî, bi komunîzm, partî û gel, li hember hemû cureyên işkenceya faşist û komployên ku dewleta faşist kirin, rawestiya. Wî ala partiyê hilda û bi vê yekê, nûnertiya şanaziya partiya me û gelê me kir. Bi nêzîkhatina rûniştina dawî ya doza PKK'ê û bergiriya giranbuha ya ku heval, di rûniştinên destpêkê de, di ber PKK'ê de nîşan da û tevî qedexekirina hemû pêdiviyên bergiriyê û işkenceya berdewam heta ku di encamê de û li gorî parêznameyên hevalan ên endamên komîteya navendî, nema dikarîbûn li ser lingê xwe rawestin. Bi nêzîkhatina wê roja ku wê dewleta tirk bê dadkirin, a ku jê ditirsin û ew tirs ji hundirê cilê xwe yên leşkerî dan xuyakirin, di baweriya xwe ya tirsonek de, ketin şaşîtiyê ku bi kuştina kadroyên rêveber wê, PKK'ê bê bergirî bihêlin û di encamê de wê doza PKK'ê bi dawî bibe. Bi rengekî şerm û riswayî piştî ku hemû şêwazên bêencam ji bo serîtewandina wan bi kar anî, di 22'yê adara sala 1982'yan de, dewleta tirk bi tewana xwe ya tirsonek rabûn. Piştî kuştina hevalê komunîst ê nemir Mezlûm Dogan, hevalê Ferhad Kortay bi şewitandinê hat kuştin. Dema ku termê wî radestî malbata wî hat kirin û tevî hemû tedbîr û girseyên leşkerî ji bo ku cemawer bi merasîmê kurê xwe yê cihê rêzgirtin û nirxdayîna wan bû ranebin, zêdeyî 150 tirimpêl û 4000 kes bi cenazeyê wî re derketin û cenaze veguherî xwepêşandaneke cemawerî ku faşizma tirk hejand û careke din tekez kir ku PKK`ê tu carî ji gelê xwe nayê qutkirin.


**Cemal Kiliç**

**Yaşar Oner (Nesîmî)**

**Eşref Anyak**

**Tahir Şahîn**

**Di 21'ê adara sala 1982'yan de, di encama komkujiya ku faşistan li Zindana Amedê pêk anî de, şehîd bûn.**



## AKIF YILMAZ

### Akif Yilmaz


Heval Akif Yilmaz, bi baweriya bi gelê xwe û tevgera şoreşî, tev li têkoşîna şoreşî bû. Di dema operasyona ku dewleta tirk ya dagirker bi armanca jinavbirina pergala partiyê, pêk anî, ew û hin hevalên xwe hatin binçavkirin. Di têkoşîna xwe ya ku nerm nabe di hundirê zindanê de, berdewam kir û alaya partiyê bi pêkanîna hemû nimûneyên PKK'ê yên têkoşînê, di zindanên faşîzmê de bilind kir.

Piştî tesfiyekirina rêheval Mezlûm Dogan û rêheval Ferhad Kortay, xeleka yekem a armanca rizgarkirina partiyê ji bergirên xet û rêgezên wê û tirsandina hevalên din û di rûniştina dawî de, doza PKK'ê bi rengekî şerm bi dawî bibe, lê rêheval Mihemed Xeyrî Dormuş, Kemal Pîr û bi wan re rêheval Akif Yilmaz ji faşistan re tekez kirin ku şêwazên wan yên xayin wê wan netirsînin û bi ragihandina greva birçîbûnê ya mirinê bi dehên heval û şoreşgeran re , di roja 14'ê tîrmeha sala 1982'yan de, berê vê çekê dan faşistan.

Tevî hemû şêwazên faşist û rawestîna li hember xiyanet û radestiyê hevalan, serî ji dagirkeran re netewandin û xwegirî berdewam kirin. Piştî 55 rojan ji grevê ji nav 5 kadroyên partiyê yên li pêş, rêheval Akif Yilmaz şehîd bû. Berxwedana hevalan, tirsa zindana faşist şikand û ji hemû cîhanê re ragihand ku PKK'ê ber bi rizgarkirina Kurdistanê ve diçe û wê tiştek li hember wê raneweste û ji gelê Kurdistanê re rêya rizgariyê nîşan da. Ji bo vê armancê, mirina li hember dadgehên faşizma tirk, hêsan dît.

**Dîlên PKK'ê di dadgehên venêrînê de.**





**Dîlên PKK'ê di dadgehên venêrînê de.**





**Karên desthilatdariya tirk ya faşist.**



**DADGEHÊN TIRKIYE YÊN FAŞIST**



Zindana Diyarbekir (Amedê) ku dagerî keleha berxwedana şoreşgerî ya Tevgera Rizgariya Niştimanî ya Kurdistanê: bi pêşengiya Partiya Karkerên Kurdistanê




**Belavokên ku di zindanê de derxistin**




Xwepêşandanên ku piştî şehadeta rêheval Xeyrî û rêheval Kemal pêk hatin.



**Bertekên cîhanî yên piştî kuştina rêberê komunîst Mezlûm Dogan**




**BERTEKÊN CÎHANÎ**

# PARTIYA KARKERÊN KURDISTANÊ



# BERXWEDAN JIYAN E

**Deqên parêznameyên rêheval: Mezlûm Dogan, Muhemed Xeyrî Dûrmûş û Kemal Pîr, endamên komîteya navendî ya Partiya Karkerên Kurdistanê ne (PKK) ji dosyayên darizandina wan hatine girtin.**